Arşîva Bîra Kurdan: Ji Michel Verrier gotara bi serenavê "Li Kurdistanê ji bo artêşa tirk rêya vekirî" (1993) ▶ *R. 12*

LE MONDE diplomatique kurdî

Çile 2012 - Hejmar 26 www.lemonde-kurdi.com • info@lemonde-kurdi.com 24 Rûpel

Wolfgang Streeck
Hevwelatî hikûmetên xwe êdî wekî dezgehên xwe nabînin, lê belê di şûna wê de wekî dezgehên welatên din, yan jî yên rêxistinên navneteweyî yên wekî IMF, an jî Yekîtîya Ewropî dibînin…
▶ R. 8

P. Daum - P. Aurel
"Di 5ê Tîrmeha 1962yê de, li bajarê Oran ê Cezayîrê bi dehan jin û mêrên ewropî bi derbên kêran, bi biviran, an jî bi guleyan hatin kuştin. Rast e barbarîyeke mezin bû, lê…"
▶ R. 14

Pierre Bourdieu
Lîstikeke ku tê de herkes derewan li hev dike û pê dizanin ku derewan jî li hev dikin. Bi rêya avakirina komîsyonan û anketan rastîya serdestan çawa vediguhere rastîya herkesî?
▶ R. 18

Antoine Champagne
Dewlet û şirket îro çawa tevna Înternetê û telefonên destan ên GSM kontrol dikin? Înternet, di roja îroyîn de çawa ji bo dewletan bûye yek ji baştirîn riyên kontrolkirina muxalifan?
▶ R. 20

John Marsh
Gelo pergala perwerdehîyê dikare xizanîya li welatekî kêm bike? Weke ku piranîya amerîkîyan jî pê bawer in, yek ji sedemên bingehîn ên newek-hevîya aborî "pergala perwerdeyîyê" ye?
▶ R. 21

Di siyaseta kurdî de BDP

Vahap Coşkun*

Kelepûra siyasî, ku niha ***Partîya Aştî û Demokrasîyê*** (BDP) nûnertîya wê dike, ji salên 1990ê û vir ve, di warê temsîlkirina lêgerînên ji bo maf û azadîyên rewa yên kurdan a di qada siyasî de, bi roleke girîng rabû. Di hawîrdoreke weha de, ku tê de partîyên navendî yên çepgir û rastgir ên li Tirkîyeyê li hember daxwazên kurdan dijber bûn -an jî qet nebe bîyanî diman-, **BDP** û partîyên selefên wê, bi awayekî biryardar û azwer daxwazên kurdan anîn qada siyasî. Di her serdema dîrokê de, ên ku berevanîya mafên kurdan kiriye, tûşî xezeba dewletê hatine; **BDP**ê jî heman aqûbet par ve kir û berdêlên giran dan. Endam û alîgirên wê bi înfazên bê darizandin re rû bi rû man, endamekî wê yê parlamentoyê li naverasta kolanekê hat kuştin, gelek wekîlên wê bi salan ji azadîya xwe bêpar hatin hiştin, her tim partîyên wan hatin girtin, avahîyên wan ên partîyê hatin bombe kirin. Lê belê digel van pêkutîyên huqûqî û fîîlî jî **BDP**ê xwe ji dika siyasetê nekişand, her berdewam kir û daxwazên kurdan anîn qada giştî û herweha bi awayekî serkeftî karî meseleya kurdî di rojeva welêt de bigire.

Herçend ew bi dijwarîyan re rû bi rû ma jî, wekî encama israra wê ya di warê bikaranîna zemîna legal de, **BDP**ê du serkeftinên siyasî bi dest xistin: Yek, BDPê bi bikaranîna rêyên siyasî toreke rêxistî ava kir, ku pê dikare daxwazên kurdan ragihîne û bi demê re ev avabûn hêzdartir kir. Di rewşa îro de BDP, bi wekîl, şaredarî, rêxistinên sîvîl, çapemenî û rûspîyên xwe ve xwedî rêxistîbûneke weha ye, ku dikare bi rêgezên cur bi cur bandorê li civakê bike. Ev rêxistîbûn, dihêle ku argumanên siyasî yên BDPê bi awayekî leztir bigihîje xelkê û bibe xwedî bandoreke mezintir.

Ya duyemîn, tevgera di qada meşrû ya siyasî de hişt ku meseleya kurdî him di asta neteweyî û him jî di asta navneteweyî de were nas kirin. Piştî ku meseleya kurdî bala cîhanê kişand, raya giştî ya navneteweyî -û nemaze jî Yekîtîya Ewropî- bi awayekî rexnegir nêzî siyaseta kurdî ya dewletê bûn û tê de bêhtir mudaxîl bûn. Li ser vê yekê jî dewletê, hewl da ku rexneyên ku dihatin bertaraf bike, naçar ma ku di warê meseleya kurdî de hin gavên huqûqî û demokratîk bi cih bîne.

Têkoşîna wê ya siyasî ya xwedî dîrokeke çaryeka sedsalekê û bidestxistinên encamên vê têkoşînê hişt ku **BDP** bibe yek ji girîngtirîn partîyên Tirkîyeyê. An ku, meseleya kurdî girîngtirîn meseleya Tirkîyeyê ye û siyaseta ku di van 30 salên dawîyê de tê sepandin, zelal kiriye ku ev meseleya hanê, ku di warê aborî, siyasî û huqûqî de Tirkîyeyê bêhêz dihêle, nikare bi siyasetên asayîşê were çareser kirin. Rêbazên leşkerî nikarin pirsgirêkeke civakî çareser bikin, berevajî wê pirsgirêkê dijwartir û kûrtir dikin. Lewma, zemîna çareserîyê ya meseleya kurdî, siyaseta ewlekarîparêz nîne, siyaseta demokratîk e. Da ku mekanîzmayên siyaseta demokratîk bi rê ve biçin, hewcedarî bi partîyekê heye, ku xwedî destûrmendîya nûnertîya rewa ya pirsê be. Di vî warî de BDP di rewşeke weha ya aktorîya siyasî de ye, ku dikare meseleya kurdî pê re were axaftin, gotûbêj kirin û muzakere kirin. Lewma dikare were gotin ku di pêvajoyeke cidî ya muzakereyê de, ku giranîyê bide ser çareserîyê, beşdarkirina BDPê ji bo danîna çekan û da ku parlamento bibe navenda çareserîyê, yek ji şert û mercên bingehîn e.

Ev rewşa BDPê- an ku wekî mifteya çareserîya demokratîk a meseleya kurdî- **BDP**ê hêja dike û rêzdarîyê dide wê, lê belê hevdem berpirsîyarîyên wê jî digel xwe zêde dike. Îcar, gelo BDP dikare vê berpirsîyarîyê bi cih bîne? Dikare hêvîyên ku jê tên payîn, bi cih bîne?

▶ R. 3

Ji şoreşê ber bi restorekirinê ve?

Hamit Bozarslan*

Mehmet Latif Saglam: **Rêza batirsokan**, li ser tuwalê boyaxa rûnî, 40 x 80 cm

Ji bilî alîyê bûyeran ên mirov li bendê nîne, em dikarin hêmanên avaker ên daîmî tesbît bikin da ku em şoreşên seranserê cîhana erebî dayî ber xwe fêm bikin. Ez li vir venagerim rastîya demografîk: Giranîya ciwanan û pirsa nifşî, nerehetîya nifşên ciwan, hostekarîya wan a di teknolojîyên nû de (em pê hisiyan ku bêyî ku ferz be teçhîzata wan li malan hebe, 23 mîlyon misirî xwedîyên derfeta girêdana Înternetê bûn, ev hejmareke mirov ne li bendê ye û herweha pir e).

Divê em serê pêşî ji rastîya otorîteyê û beridîna dewletê bidin rê, em ji wir dest pê bikin. Li piranîya welatên Rojhilatê Nêzîk û Rojhilatê Navîn çawa ku fikreke **Michel Camau** jî bi bîr dixe, dewlet xwedîya awayekî mîna yekdestdarîyekê ye, ango ew di navbera komên xwedîyê desthilatdarîyê de mijara dabeşkirinê ye. Bi xistina dewrê ya pêkhênerên nû yên elaqedarî ewlekarîyê, dewlet herweha di warê birêvebirina ewlekarîyê de jî beridîye. Di nav salên 1990ê û 2000ê de hejmara sazî û dezgehên ewlekarîyê pir zêde bû, me dît ku di navbera sazî û dezgehên ewlekarîyê, derdorên siyasî yên berjewendîparêz û burjûwayeke nû ya di heman demê de pêkhatî de jihevcihêbûnek pêk hat. Li navenda yekdestdarîyê *primus inter pares* [di nav hevtayan de yê yekemîn; nota wergêr] heye ku navê *reîs* lê tê kirin... ku di lihevnekirinên navxweyî de weke meqamê biryardêr bi kêr tê.

Xilasbûna ji westa civakî

Di rêza duyemîn de çawa ku min di pirtûka xwe ya li ser civaknasîya siyasî ya Rojhilatê Navîn de jî kirî, em dikarin behsa "westa civakî" ya li herêmê bikin. Ev "westa civakî" naşibe ya sedsalên 19ê û 20ê yên li Ewropayê, lewra mirov bibêje rojava beramber rojhilatekî ciwan westayîbû; a di dewra mezinbûnê de wê bibe perspektîfeke li gor nêrîna fîlozofê alman **Spengler**, ku ez bixwe ne alîgirê wê me.

Dema ez behsa "westa civakî" dikim, ev ji ber beramberbûna pêlên seferberbûna pir girseyî ya tevahîya sedsala 20ê bû. Ji 1920ê heta bi 1980yê. Pêla yekem a vê seferberîyê, pêla neteweperest bû. Paşê di salên 1950yê de em dikevin pêvajoyeke seferberîya bi awayekî zelal. Di salên 1980 û 1990ê de seferberîyek bi pêş dikeve ku di warê hegemonîk de bi kêrî îslamîzmê tê, ev seferberî kirina siyasî ji nû ve terîf dike û bi peyv û gotinên rizgarîya eskatolojîk derdibire. Lê dema van seferberîyên pir mezin her çû bêtir ji hev xwar, hev serf kir, bi me weha bû ku civak dikeve dewreke tevizînê ya ku bi xwe jî têra xwe bandor li mirovî dikir.

Çarenûsa Cezayîrê, sahneya şerekî navxweyî yê xedar ê salên 1990ê, û tevgera gerîla ya li Misirê bêguman di vê jitaqetketinê de xwedî rol bûn. Hêmanên wan ên avaker ên analîza civakan ji bo têgihiştina me berdest bûn; li hemberî vê me nedikarî hêmanên dînamîka tevgeran pêş bibînin. Dînamîka tevgerê timî bi awayekî bi tevahî pêş neyê dîtin dikeve dewrê; berîya ku bandoreke herêmî bikin, li gor çarçoveyên cihî yên taybet pêk tên. Belê ji niha û pê ve em dikarin tişta ku van mehên derbasbûyî qewimî fêm bikin. Em niha bi xêra dîrokçe û kronolojîya muxalefeta tûnisî pê dizanin ka çiqas tevnên nefermî hebûn, piştgirîya di navbera bêparhiştîyan de çiqas bû, dûrî çavan, çalak bû, civakê beramberî desthilatdarîya li taxan, çendîn xwe bi xwe xweser kiribû ku êdî nedikarî fêm bike, li kevîyên bajaran û bajarên dûrî navendê çi diqewime, kêsên bêmal û milk û dezgehdarên seyar di nav civakê de xwedîyên cihekî navendî bûn. Her tiştî bi wî tûnisîyê ciwan ê xwende û xwedî dîplome dest pê kir; polîsan dezgeha wî xira kir û li ber çavên herkesî piçûk hat xistin. Tevgerê li ser navê xîretê dest pê kir, piştre veguherî dildarîyên wekhevîxwaz û azadîxwaz. Ev ew dildarî ne ku **François Furet** di xwendina xwe ya pergalên şoreşgerî de derxistî pêş, divê mirov berîya her dîyardeya din behsa vê bike. Ya rastî divê mirov di demeke dîyar de behsa dildarîyan bike yên ku muxalefeteke şoreşger ji dîyarkerên wê yên civakî, yan jî nifşî rizgar dike da ku alîyekî navnifşî û ji çînan wêdetir yê ku tevahîya civakê digire nav xwe bidiyê.

▶ R. 4

Almanya: 4,50 €
Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda: 5,00 €
Brîtanya: 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK,
Swêd: 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Tirkiye:** 7 TL

4 191764 204509 26

www.lekurdi.org

EDITO

Rûsya, Fransa, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, sala hilbijartinan û şanoya siyê

Werdekên bêserî

Serge Halimi

Civînên bilind ên birêveberên li pey hev tên û têk diçin; Qesra Spî û Kongre erza hev dişikînin, lê tiştekî bi ser naxin. "Bazaran" ji wan fêm kiriye û êdî muameleya ordekên bêserî bi wan re dikin, lîstikên besît ên ku wan bi xwe afirandî û êdî nizanin ji heq derkevin. Dîsa jî di heman demê de –li Fransa, Rûsya, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, deverên din– hilbijartinên serokdewletîyê li devê derî ne. Bi hisa nebirastî ya qutbûna di navbera gotin û kirinê de, ew qada sivîl û çapemenîyê dagîr dikin. Lewra mirov ji namzedan tiştekî zêde hêvî neke jî, heta tu tiştî jî êdî hêvî neke, ew qet nebe tên nas kirin parkûrên wan, kêmasîyên wan, hevgirên wan, derdora wan, tevn û têkilîyên wan. Ji fonên spekulatîf û sazîyên kredîyan bêtir, bala xelkê diçe ser **Barack Obama** û **Newton Gingrich, Nicolas Sarkozy** û **François Hollande**. Lê belê ew hê bi kêrî çi tên?

Nicolas Sarkozy ê ku siyaseta wî ya pereyan sîya berjewendîyên BNP-Parisbas (1) li ser e, serokwezîrê brîtanî **David Cameron** gunehbar dike, bi ji welatê xwe çêkirina "*herêmeke îzolekirî û qutbûyî li nav Ewropayê*". Wezîrê maliyê yê alman **Wolfgang Schäuble** ewqasî hêrsrabûyî ye, bi gotinên mîna derbên şûr dibêje: "*çavbirçîtîyeke bê sînor, lêgerîna karê her diçe zêdetir ê li ser bazarên sermayê ên ku ne bêsedem di krîz û krîza bankeyî ya aborî de ne, ji bilî wê krîza welatên sihê jî heye ya ku em ji 2008ê ve pê re rûbirû ne*." (2) Ev yek bi ti awayê pêşîyê li Schäuble nagire ku nîv dûzîneyek neteweyên ewropî yên wêran û jipertavketî bavêje ber vê "çavbirçîtîya bê sînor". Birêveberê bankeya navendî ya Almanyayê Bundesbankê Jens Weidmann weha rave dike "*Heke bandorên dîsîplînker ên rêjeyên faîzê bi tevahî ji holê werin rakirin, encamên wê dê felaket bin. Dema ku kredî ji bo dewletan bihatir dibe, hewldana deynkirinê jî pir kêm dibe.*" (3) Û heke welatên herî zêde deyndar fêr nebin "hewldanên" xwe gem bikin, heke rawestîna mezinbûna aborîyê pêşîyê li wan bigire û ew tewazûneke malî çêkin, heke "karên her diçe zêdetir" ên deyndêrên wan bi qurpika wan bigirin û bînê li wan biçikînin, hingê Yekîtîya Ewropî wê alîkarîya wan bike, rengê alîkarîya wê birîna cezayekî pereyan e... Li hemberî vê, bankeyên taybet wê bikaribin çi kredîya dixwazin bistînin, ku ew di berdêla wê de hema hema tu tiştî nadin. Bi vî rengî ew dikarin deyn bidin dewletên deyndar û pê karên pir baş bi dest bixin. Ji wan ên ku bi tevahî gunehkar re!

Nermîyên ku ji sermayeyê re tên nîşan dan, li mirovî qedexe nakin ku wê rûreş bike. Jixwe tam jî bi vê nakokîyê êdî mirov tê derdixin ku ev sal sala hilbijartinê ye. 6ê kanûna bihurî, li Kansasê serokê DYAyê Obama welatîyên xwe hişyar kirin ku seyarîya civakî û demokrasî li welatê wan di tehlûkeyê de ne: "*newekhevî şikil û şêla demokrasîya me xira dike. Ew dengekî zêde mezin û ne li gor temsîla wan dide wan kesên ku dikarin pereyan bidin lobîstan.* [...] *Muafbûna ji bacê bi tenê bi kêrî yên herî dewlemend tê. Hin mîlyardar rêjeyeke bacê ya % 1 didin, %1!*" Obama wekî din bi bîr dixe ku "*bazar ti caran îcaze û destûrek nebû da ku mirov her tiştê bikare ji herkesî bistîne*" û ku divê "*çîna navîn a vî welatî ji nû ve were bi gewde kirin.*"

Tu kes bawer nake ku ew ê vê armanca xwe bibe serî, ne jê bawer dikin ku ew ê bandora pereyan li ser sîstema siyasî kêm bike, ne jî bawer dikin ku ew ê sîstema bacan reforme bike. Ji sê salan û vir ve der barê van mijaran de wî tu tişt nekir û tu navgîn jî ji xwe re çênekir, da ku heke careke din were hilbijartin, di armanca xwe de bi ser keve. Di vê mijarê de ew tiştê ku sîstema niha veguheriyê, baş bi gewde dike: Kakilekî gwîzan ya ji rê dedikeve, ya ku li ser wê kaptanekî payeya wî daxistî heye, dema ku bahoz radibe, dike qarewar. Heke ev sala hilbijartinan daxwaza siyasî û navgînên bi kêr werin, hêza di destê fînansê de jê bistînin, hingê dengdan û hilbijartinên bên, hemû jî wê bi kêrî tu tiştî neyên.

1 Michel Pébereau, ê ku hê nû birêveberîya BNP-Parisbasê dewr kir, di van mehên dawîyê de gelek caran derbirî ku alîkarîya hukûmeta fransî ya dayî sektora bankeyan û pêşnîyazên Parîsê yên der barê deynên dewletê de bankeya wî li pêş digire, bankeya wî ya ku bi awayekî giran ketiye bin barê Yewnanistan û Îtalyayê. Bixwîne "Michel Pébereau, le banquier dans les coulisses de l'Elysée (Michel Pébereau, bankevanê di kulîsên Elysée de)", *Le Monde*, 2yê kanûna 2011ê

2 Di *Les Echos* de ji ber wî hatiye girtin, Parîs, 16-17ê kanûna 2011ê

3 Di *The New York Times* de ji ber wî hatiye girtin, 14ê kanûna 2011ê

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Le Monde diplomatique kurdî
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

Lijneya Weşanê
Murad Satik
Riza Dînç

Le Monde diplomatique kurdî

Redaksiyona Zimanî
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

Alîkarên vê hejmarê
Yado Ciwan
Semra Polat
Ergün Yetkiner
Celîl Kaya
Nedîm Baran

Revîzyona Wergeran
Feryal Guladawîya
Luqman Guldivê

Berpirsê Hunerî
Hasan Huseyîn Devecî

Designer
Fabio Biasio

Web Developer
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

ABONETÎ
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

Abonetiya Salane:
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

Le Monde diplomatique

Damezrîner
Hubert Beuve-Méry

Birêveberê giştî
Serge Halimi

Sernivîskar
Maurice Lemoine

Cîgirên Sernivîskarî
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

Redaksiyon
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

Birêveberê hunerî
Alice Barzilay

Dokumantasyon
Olivier Pironet

Sekreter
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France



JI ÇAPEMENÎYÊ

Îslam, Demokrasî û Tirkîye

Di 22ê kanûnê de rojnameya **Financial Times** di sernivîsa xwe de cih da raperîna li welatên ereb û hatina demokrasîyê. Di gotara bi sernavê *"Ol nabe ku li Rojhilatê Navîn Demokrasîyê betal bike"* de Tirkîyeyê jî wekî mînak dide.

Rojname balê dikişîne ser wê yekê ku Îran jî welatekî musulman û demokrat bû, gelek piştgirîya wê hat kirin, lê belê di 1979ê de oldar hatin ser îqtîdarê. Rojname îdia dike ku rewşa li Tirkîyeyê cuda ye û weha divinivîse: *"Tirkîye ji wan meleyan cudatir e yên ku berjewendîyên xwe li paş perdeyeke îlahî vedişêrin, Tirkîye bi partîya xwe ya îqtîdarê ya post-îslamî nîşan dide ku îslam di hawîrdoreke pluralîst û sekuler de dikare were xerman kirin. ... Kêfa gelek ereban ji pergala li Tirkîyeyê tê. ... Tirkîye ne tenê demokrasîyeke zindî ye, herweha aborîyeke dînamîk e, ku bi adaptekirina demokrasîya mesîhî ya digel îslamê tê bi rê ve birin. Li vê derê tiştê girîng ne model e, lê bele serkeftina wê ye..."*

Her sebaret bi îmaja Tirkîyeyê ya li cem cîhana rojavayî di 11ê kanûnê de rojnameya brîtanî ***The Guardian*** gotareke bi sernavê "Tirkîye: Welatekî 'nûjen' ê zextê" weşand. Di gotarê de, ku ji alîyê **Ayça Çubukçu** ve hatiye nivîsandin: Tirkîye îdia dike ku demokrasîyeke serkeftî ye, lê belê bi hezaran xwepêşandanên li kolanan weha nafikirin. Gotar herweha balê dikişîne ser: *"Lihevnekirina di navbera wan kesan de, ku Tirkîyeya îro wekî demokrasîyekê dibînin û piştgirîyê didin wan kesan, ku li Tirkîyeyê tûşî destgîrkirinên keyfî, zexta siyasî û xerabkarîya leşkerî dibin, her ku diçe mezintir dibe."*

Gotar wekî din balê dikişîne ser wê yekê ku di du salên çûyî de li Tirkîyeyê bi hezaran kes li ser navê têkoşîna li dij terorê hatine girtin, ku di nav wan de kesên hilbijartî, siyasetmedar, rojnameger, parêzger û akademîsyen jî hene. Li hember vê rewşê nivîskara gotarê weha berdewam dike: *"Hin şirovekarên 'nûjen' israr dikin ku Tirkîye, nîsbet bi welatên din, qet nebe li gor yên li Rojhilatê Navîn, mînakeke serkevtî ya demokrasîyê ye. Ew îdia dikin ku dema mirov di nav krîza gerdûnî de li aborîya Tirkîyeyê binihêre, ku geş dibe, herweha zewaca populer a 'Îslama Nerm' û siyaseta parlamenterî ya 'sekuler', peydabûna polîtîkaya serbixwe ya derve ya Tirkîyeyê, ku li dij Îsraîlê rexnegir e û piştgirê hêzên demokratîk ên nav buhara erebî, bes e. ... Lê belê ev yek ew tişt e ku piranîya gelên li Tirkîye, Rojhilatê Navîn û cîhanê hêvî dikin? Gelo çima Tirkîyeya modern sînorên tahayyula me ya siyasî dîyar bike? Çima welatek, bi 'pêşketina xwe' ya bi kirîna firokeyên bêmirov ên ji Amerîkayê dikire pozbilindîyê dike, welatek ku profesor, rojnameger, wergêr, parêzger, karker û xwendekaran dixe zîndanê û bi endamên partîyeke siyasî, ku nûnerîya bi mîlyonan hevwelatîyan dike, reftarê terorîstan dike, çima piştgirîya welatekî weha bê kirin, yan li pey herin?"*

Nivîskar bersiva pirsên xwe bixwe dide û weha berdewam dike: *"Her ji ber vê lihevnekirina wan kesan ku Tirkîyeyê bi awayekî din dibînin zêde dibe... Di vê lehzeya dîrokî de, ku enerjîyên wêrek ên siyasî û xeyalên afirinêr li seranserî cîhanê li ser kar in -ji Meydana Tehrîrê heta Taksîmê, ji Şamê heta Dîyarbekirê- em dikarin ji mînaka fermî, ku Tirkîye nîşan dide, zêdetir daxwaz bikin. Heger em nekin, em dê ne bi tenê li dahatûya siyaseta demokratîk a Tirkîyeyê bêbextîyê bikin û jê wêdetir, li wan hemû kesan ku heta niha di dema desthilatdarîya leşkerî û hikûmetên li dû wan, ku ew jî wekî wan bûn, ji bo dahatûyekê berdêlên giran tûşî girtin, mirin, birîndarbûn û bêserûşûnkirinan bûne, heta wan gotiye ser seran ser çavan".*

Di dahatûya bê Esed de kurdên li Sûrîyeyê

Di van rojan de ku cîhanê berê xwe daye Sûrîyeyê û aqûbeta rejîma Be'asê ya malbata Esed nîqaş dike, roja 15ê kanûnê rojnameya **Rûdaw**ê gotarek li ser daxwazên kurdên Sûrîyeyê weşand. Di gotarê de, ku ji alîyê **Edîb Evdilmecîd** ve hatiye nivîsandin qala helwêsta neteweperest a muxalefeta ereb a Sûrîyeyê ya li hember kurdan tê kirin û gotinên serokê muxalefeta ereb **Burhan Ghallion** tên bi bîr anîn, ku bendewarîyek heye ku Ghallion piştî Esed li Sûrîyeyê şûna wî bigire. Ghallion beşdarî bernameyeke televîzyona almanî DW bûye û gotiye ku niha ne demeke baş e ku kurd doza mafên xwe dikin û wî kurd şibandine wekî misilmanên koçber ên li Fransayê. Û ev yek bû sedema nerazîbûna kurdan.

Gotar sedemên vê helwesta hişk û neteweperest a muxalefetê li ser du xalan kom dike: *'Dibe ku sedem hebin ka muxalefeta Sûrîyeyê kurdan li derve dihêlin. A yekem, bandora aşkere ya **Birayên Misilman** e, ku hêz û bandora xwe ji Tirkîyeyê distîne û her ji ber vê yekê bi hikûmeta tirkî re dilsoz e. Jixwe, Konseya Neteweyî ya Sûrîyeyê ji zû de ye têkilîyen xwe yên hêzdar ên digel Tirkîyeyê pesend kirine û êrişeke PKKyê, ku tê de 14 serbaz hatibûn kuştin, şermezar kirin. Sedema duyemîn jî dikare ew be ku serokên ereb bi zanebûn partîyen kurdan li derveyî konferansê dihêlin da ku ew di pêvajoya biryarstendinê de nebin xwedî tu hêz û derfetan.'*

Ji Nabuccoyê re reqîb

Di 29ê kanûnê de rojnameya ***Financial Times*** peymana nû ya enerjîyê, ku di navbera Tirkîye û Rûsyayê de hat îmzekirin, ji xwe re kir mijar. Rojname balê dikişîne ser wê yekê ku li gor vê peymanê xeta lûleyê dê gaza surîştî ya rûs bigihîne Ewropaya başûr û xet dê ji peravên Tirkîyeyê ya Deryaya Reş derbas bibe û ev yek jî wê dawî li pabendîya Moskovayê bo axa Ukranyayê bîne. FT herweha şirove dike ku ev projeya xeta gaza sirûştî dê bibe alternatîfa projeya Yekîtîya Ewropî ya bi navê Nabucco, ku Yekîtîyê 20 mîlyar euro pere lê xerc dike.

Rojname wekî din balê dikişîne ser ku ji ber şik û gumanên li ser gazê, ku mesrefa perexistineke 15 mîlyar euro dikare derxe, aqûbeta projeyê hîna jî ne dîyar e. Lê belê Bruksel dîyar dike ku ew girêdayî sozên xwe yên bo Nabuccoyê ye.

Rewşa Îraqê piştî vekişîna leşkerên amerîkî

Piştî vekişîna leşkerên amerîkî ya ji Îraqê, welat bi çend êrişan hejîya. 23ê kanûnê rojnameya ***The Guardian*** dîtinên nûçegihanê xwe **Martin Chulov** ji Bexdayê radigihîne:

"Peyv têrê nakin ku dîyar bikin ka dahatûya Îraqê çiqas tarî xuya dike. Tu kes ne li bendê bû ku Iraq bibe mînakeke jeffersonwarî ya demokrasîyê, lê belê herweha kes ne li bendê bû ku di demeke weha kurt de rewş ewqas xerab be..."

Rojnameya ***Times*** jî di heman rojê de heman mijar tîne pêşîya xwendekarên xwe: *" Dîmena li welêt negihiştiyê wê seqemgîrîyê, ku karbidestên amerîkî dixwestin ava bikin û welat ji dîmena welatekî ser lingên xwe gelek dûr e."*

Rojname herweha cih dide gotinên wekîla sunnî **Nahide el Deyni** ku dibêje: *"Bi tenê xwedê dikare îraqîyan biparêze, ji ber êş û jana xelkê ne xema rayedaran e".*

Ji 30ê tîrmeha 1943yê heta 29ê kanûna 2011ê...

Doh li navçeya Qelqelîya ya Wanê, îro li gundê Robozkê, li navçeya Qilabanê.

Doh 33 gule…Îro jî 35 zarok û ciwanên kurd bi bombeyên balafirên F-16 ên tirkan hatin qetil kirin.

Berpirsên komkujîya Robozkê aşkere ne, lê dewleta tirkî heta nuha ne qatil xuya kirine, ne jî daxwaza lêbûrînê kiriye…

Di her du komkujîyan de jî gundîyên kurd wek "qaçaxçî" hatin tawanbarkirin.

Bazirganîya ku kurd di nav welatê xwe de dikin ji bo mêtîngeran dibe 'qaçaxçîtî' !

www.lemondediplomatique.org

Di siyaseta kurdî de BDP (Dewama rûpela 1)

Ez di wê bawerîyê de me ku rewşa siyasî ya ku niha li Tirkîyeyê heye fersendeke gelek mezin danîye pêşîya BDPê. Li Tirkîyeyeke weha de, ku hikûmetek heye û xelk piştgirîyê didiyê û her ku diçe serwerîya dewletê bi dest dixe, muxalefet xwedî girîngîyeke heyatî ye. Lê belê ji ber ku **CHP** nikare xwe ji kemalîzmê pak bike û bibe partîyeke sosyal demokrat a rasteqîn nikare peywira xwe ya muxalefetê bi cih bîne û nikare bibe alternatîveke îqtîdarê. Ev valahîya muxalefetê, ku pêk hatiye, ji bo **BDP**ê tê wateya derfeteke girîng û heger bikaribe, ku giranîya xwe baş bi kar bîne, derfetê dide BDPê ku di fîîlîyatê de bibe partîya muxalefetê ya sereke. Lê belê BDP nikare ji van fersendên dîrokî sûdê werbigire û bi rola ku jê tê xwestin rabibe. Çima?

Bi ya min him sedemên **'derveyî'** û him jî yên **'navxweyî'** yên vê yekê hene. Mebesta min bi sedemên derveyî, tênegihiştina krîterên demokrasîyê yên li Tirkîyeyê û tengbûna qada siyaseta demokratîk ên li welêt e. Di bîst salên dawîyê de 6 partîyên siyasî yên xeta BDPê li derveyî qada siyasî hatin hiştin. (Di 1993ê de **HEP** û **ÖZDEP**, di 1994ê de **HADEP** û di 2009ê de **DTP**, ji alîyê Dadgeha Destûrî ve hatin girtin. Di 2003ê de li dij **DEHAP**ê doza girtinê hat vekirin, partîyê jî paşê xwe bixwe fesîh kir.) Îro piranîya endamên **BDP**ê di çarçoveya operasyonên **KCK**ê de hatin girtin û hewl tê dayîn ku pêşî li xebata serbest a partîyê were girtin û partî nikaribe xwe bigihîne gel. 5 wekîlên **BDP**ê di girtîgehê de ne, wekaletîya yekî jî ji alîyê Lijneya Bilind a Hilbijartinan ve ji dest hat stendin. Ji ber madeyên *Qanûna Li Dij Terorê û Qanûna Cezayî ya Tirk*, ku dikarin bi awayên cur bi cur werin şirove kirin, hemû axaftin û çalakî dixin naveroka 'terorê' û bi vê yekê re rê li ber gengeşîyeke azad a pirsa kurdî tê girtin. Dozên ku tê de heta sedsalan cezayên zindanê tên xwestin, wekî *Şûrê Demoklesê* li ser serê wekîlên **BDP**ê radiwestin.

Ev pêkanînên qanûnî û îdarî, ku zemîna demokratîk xerab dikin, bi awayekî neyînî bandor li ser siyaseta **BDP**yê dikin ku nikare têbigihîje û **BDP** jî nikare bibe partîyek ku ji bo pirsgirêkên welêt polîtîkayên alternatîf hilberîne. Lê belê, divê sedemên wê yekê, ku **BDP** nikare bi roleke çalaktir rabibe, nabe ku bi tenê bi sedemên derveyî ve bê girêdan. Ji ber ku, di hundir de gelek pirsgirêkên girîng hene. Ev pirsgirêk dikarin li ser sê serenavan werin dabeş kirin:

Têkilîya di navbera BDP û PKKê de

Bi ya min mijara ku divê berîya her tiştî li ser were peyivîn, têkilîya wesayetê ya di navbera **BDP** û **PKK**ê de ye. Wesayeta PKKê -lewma ya çekan- li ser BDPê heye. Du sedemên daîmî hene, ku dibin sedema vê wesayetê û dihêlin ku wesayet berdewam bike: Yek, wekî hemûn hêzên din, ku bi çekan desthilatdarî bi dest xistine, PKK jî dixwaze desthilatdarîya xwe biparêze. **PKK** da ku hêza xwe pirtir bike, hewlê dide ku qada sîvîl û siyasî di bin çavdêrî û kontrola xwe de bihêle; bi vî awayî biryara dawîyê ew bixwe dide. Ji ber ku **PKK** nahêle ku kesek ji derveyî wê gotinekê bike, siyasetmedarên ku jixwe bêhêz in, yekcar bêhêz dibin.

Ya din jî ev e; ên ku di qada siyasî de cih digirin, bawerîyê bi dewletê naynin. Serpêhatîyên tahl ên rabihurîya nêz û dûr bûne sedem, ku hin siyasetmedarên nav vê kelepûrê, bawer bikin ku heger dewlet derfetê bi dest bixe, dê wan tasfîye bike û divê li hember dewletê hêzeke çekdar hebe.

Wesayetek ku bi vî rengî pêş dikeve, pêşî li hêzdarbûna BDPê ya di qada siyasî de digire. Ji ber ku wesayet têkilîyekê ser û bin ferz dike û biryarên wan kesan ku bi awayekî hîyerarşîk li jorê ne, bêyî ku cihê guman û pirsê be, divê li ser herkesî ferz be. Têkilîyekê weha nahêle ku ên di qada siyasetê de bikaribin însîyatîfa xwe bi pêş bixin; ev yek wan dike 'karmend'. Ji ber ku lijne û dezgehên demokratîk nayên bi kar anîn, partî dibe mehkûma yek-dengîyê û zerengîya karkirinê ya endamên partîyê tê ko kirin.

Wesayet rê li ber kultbûna kesekî (**Öcalan**) û fetîşîzma têgehan (an ku xweserîya demokratîk, şerê gelerî yê şoreşger û hwd.) vedike. Lê nayê dîtin ka têgeha ku serok/serwer bi kar tîne, bi rastîyê re li hev dike, yan dikare di cîhana me ya îro de were bi kar anîn. Heger têgehek ji devê serok derkeve, ev yek têrê dike ku ew têgeh wekî têgeheke pîroz were qebûl kirin. Wekî mînak, xweserî, ku talîya talî modeleke siyasî û îdarî ya birêvebirinê ye, wekî dermanê her derdî tê pêşkêş kirin. Lê belê herçend ew ewqas hêja tê dîtin jî, naveroka xweserîyê nayê dagirtin, ji gel re nayê gotin ka xweserî çi ye û dê çawa were bi rê ve birin. Weha dîyar dibe ew kesên ku di her axaftina xwe de pesnê xwesrîyê didin, bixwe jî der barê wê de xwedî agahîyeke hûr û kûr nînin. Jê wêdetir, herçend di serê wê de peyva 'demokratîk' tê bi kar anîn jî, hemû qaîde û teamulên demokratîk tên bin pê kirin û bi awayekî yekalî xweserî tê ragihandin û wekî ku xweserî li ser gel were ferz kirin. Têgiha ku tê bi kar anîn û çalakîyên ku tên li dar xistin li hev nayên.

Têkilîya di navbera BDP û AKPê de

Wekî xala duyem divê têkilîya bi pirsgirêk a di navbera **BDP** û **AKP**ê de were nîqaş kirin. Hikûmetên berî AKPê di warê çareserîya demokratîk û siyasî ya meseleya kurdî de xwedî tu ramanan nebûn. Ew bi tenê diketin ser riya ku eskeran şanî wan dida. Kelepûra ku niha BDP nûnertîya wê dike jî li dij wan siyasetên asayîşparêz ên hikûmetan derdiket û bi saya vê helwesta dijber a mafdar meşrûîyeta xwe ya di nav kurdan de zêde kir û bû nûnera yekta ya daxwazên demokratîk ên kurdan.

Lê belê piştî ku di 2002yê de faktora **AKP**ê derket holê, di vê tabloya siyasî de hin şkeştin pêk hatin. Ji ber ku AKP wekî îqtîdareke weha xuya nedikir, ku pişta xwe dispart reçeteyên leşkeran, berevajî wê, AKPê ji alîyekî ve xizmetguzarî dikir û ji alîyê din de jî -herçend qismî be jî- ji bo demokratîkbûnê gav diavêtin. Amûrên siyasî yên AKPê û hewldanên wê yên ji bo bikaranîna derfetan li cem kurdan jî ji xwe re bersivek dît. Di domahîya wê demê de, ku heta niha hat, AKPê hegemonyaya siyasî ya **BDP**ê, ku li herêmê hebû, şkenand û bû navendeke cazîb a siyasî.
'Avabûna siyasî ya du-partîyî' ku piştî hilbijartinên 2007ê li herêmê pêk hat, di navbera BDP û AKPê de rê li pêşwazîyeke dijwar vekir. Lê belê, di vê têkoşîna siyasî de alî hevdu ne wekî **'raqîbên siyasî'** lê belê wekî **'neyarên siyasî'** dibînin. Têgihiştineke bi vî rengî herweha rêbazên têkoşînê jî dîyar dike, ku ev her du partî li dij hev bi kar tînin. Ji ber ku, dema ku hûn yekî wekî 'raqîb' bibînin hûn dê pê re bikevin pêşbirkê û hewlê bidin ku wî li du xwe bihêlin. Lê heger wî wekî 'neyar' bibînin, wê demê mebesta we dibe ew ku hûn wî ji holê rakin.

Îro her du partî jî hewlê didin ku hevdu di warê siyasî de tune bikin. Dema ku **AKP**, bi operasyonên **KCK**ê hewlê dide ku **BDP** di warê siyasî nikaribe tev bigere, BDP jî AKPê wekî dijmina sereke radigihîne û hewlê dide ku li herêmê dawîya wê bîne.

Ev siyaseta dijminatîyê, zirarê dide her du alîyan jî. Li alîyekî vebûna demokratîk a **AKP**ê û îdiaya çareserkirina pirsgirêkê ya li deştê qels dike, li alîyê din jî qada BDPê ya wekî bizaveke siyasî teng dike. **BDP** ya ku helwêsta xwe li gor AKPê dîyar dike, di pêşveçûnên siyasî de pirtir reaksîyoner e, di şûna dîyarkirina rojevê de, li ser nerazîbûna xwe ya li hember **AKP** û serokwezîr Erdoğan dipeyive û enerjîya xwe ji bo bersivdana AKPê serf dike. Ev siyaseta dualî ya dîtina wekî dijmin, nahêle ku ev her du partî, ku dengên kurdan distînin, bikevin nav dîyalogê û hevkarîyê.

Têkilîya di navbera BDP û Çepê Tirkîyeyê de

Wekî xala sêyem, divê li têkilîya di navbera **BDP** û çepê Tirkîyeyê de were nihêrtin. **BDP** û partîyên selefên wê, ji berê de girîngîyeke mezin didin hevkarîya û piştgirîya digel derdorên çepgir ên li Tirkîyeyê. Weha difikirin ku hevkarîyeke bi vî rengî dê hêzê bide daxwaz û îdiaya BDPê ya bûyîna partîyeke tirkîyeyî. Lê belê, ez bawer nakim ku hevgirtina ku digel derdorên çep tên kirin, di warê siyasî de sûdê bigihîne BDPê. Weha dîyar bikim:

a. Derdorên çep, ku BDP bi wan re hevgirtinê pêk tîne, hemû komên marjînal in. Ev kom xîtabî derdoreke gelek sînordar dikin û di nav civakê de ne xwedî bandor in, ne jî bersivekê dibînin. Lewma, hevgirtina digel van partîyan bi tenê têrê nake ku BDP bibe partîyeke tirkîyeyî.

b. Da ku ev hevgirtin bikaribin di warê siyasî de bibin xwedî wateyekê divê di asta prensîpî de werin li dar xistin û divê domdar bin. Lê belê têkilîya di navbera BDP û çepê tirk de bi tenê bi demên hilbijartinê re sînordar dimînin. Piştî hilbijartinan hevkarîyeke di asta dezgehî de pêk nayê, tevkarî û hilberîneke hevpar bi cih nayê. Hevkarî bi tenê ji piştgirîya namzedekî pêk tê û di navbera koma xwedî namzed û BDPê de hevgirîyek ku di warê siyasî de hêzê bide, pêk nayê. **Ufuk Uras** mînakeke baş a vê yekê ye.

c. Mebesta herî girîng a hevgirtineke hilbijartinan zêdekirina dengan e. Ji ber ku ew partîyên çep, ku pê re hevgirtin pêk tê, bi gelek sînordar xwedî hejmareke pir hindik a hilbijêran in, hevgirtineke weha dengên **BDP**ê zêdetir nake. Jixwe, partîyên çep dikarin biryarê bidin ku digel BDPê hevgirtinê bikin, lê belê ev yek nayê wê wateyê ku alîgirên wan îllehîn dê deng bidin namzetên BDPê û ev yek ji sûdê bêhtir zirarê digîhîne BDPê. Wekî mînak, di hilbijartinên 2007ê de BDP - DTPa wê demê- digel **ÖDP**ê hevgirtinek li dar xistibû û derfet dabû ku Serokê Giştî yê ÖDPê ji Stenbolê were hilbijartin. Lê belê li Mêrsînê, ÖDPyîyan deng nedabûn namzedê BDPyî -**Orhan Miroğlu**- û bûbûn sedem ku ew bi rêjeyeke gelek kêm nikaribe were hilbijartin.

d. Komên çep, ku BDP digel wan hevkarîyê dike, di mijarên –wekî azadîyên olî, Yekîtîya Ewropî, struktura aborî- de xwedî zimanekî radîkal in. Zimanekî weha tundrew e, ku ez bawer nakin di nav civaka kurdî de bersivekê bibîne û ev yek bandoreke neyînî li ser siyaseta kurdî dike. Ji ber ku herçend ev ziman li cem gel bersivekê nebîne jî dikare rêvebirîya BDP û wan kesan, ku xwedî hêza biryardayînê ne, bixe bin bandora xwe û bibe sedem ku di dema hilberîna siyasetê de ji rastîyê dûr bikevin. Ji ber van sedeman hevgirtinên digel derdorên çep hêz û lezekê nade BDPê.



Mehmet Latif Saglam: **Yek+Yek=Hevrebûn**, Seramîk, 30 x 18 x 9 cm

Divê çi bê kirin?

Ji bo xilasbûna ji vê stewrbûna siyasî û ji bona ku di qada siyasî de bibe hêzeke dîyarker, divê BDP li ser wan kêmasî û xetayên xwe, ku min hewl da ku li jorê bi kurtasî zelal bikim, bifikire. Pêşî divê siyasetmedarên BDPyî bi xwe ewle bin. Siyasetmedar divê sînorên xwe yên siyasî berfirehtir bikin û bi qasî ku ji destê wan tê di nav meydana lîstîka siyasî de bimînin. Bi tenê, bi vî awayî dikarin bêbawerîyê ji holê rakin, aştîyê ava bikin û dikarin bibînin ku dîyarkirina bernameyê berî her tiştî peywireke wan e. Helwesteke weha dikare rê li ji nû ve teşedayîna têkilîya di navbera **BDP** û **PKK**ê de veke.

Heta niha di warê têkilîya di navbera **PKK-BDP** de, **PKK** her tim alîyê dîyarker û bandorker û BDP jî dîyarkirî û bandorkirî bû. Ji ber ku PKK hêzek e, xwedî çek e, ev yek dikare wekî rewşeke normal bê îdia kirin. Lê belê ez di wê bawerîyê de me ku heger ev tevger wê hêza siyasî ku xwe gihandîyê bikaribe bi awayekî rast û bandorkar bi kar bîne, dikare li ser **PKK**ê jî bandorê bike. Wekî mînak, dema ku **PKK** bi çalakîyên şidetê rabe, -yên wekî li Farqînê û Çelê, ku di warê dem de mirov matmayî hiştin û ji raya giştî piştgirî wernegirt-, BDP dikare li hember helwestê nîşan bide. Jixwe, Demirtaş bi awayekî aşkere dîyar kir ku çalakîyên PKKê ne rast bûn û dinya xera nebû. Helwesteke prensîpî ya li hember mirin û şidetê, him rê vedike ku PKK rêbazên xwe careke din binirxîne û him jî rexneyên BDPê yên li dij şideta dewletê watedartir bike. Yan na, wê ne PKK, ne jî dewlet girîngîyekê bide BDPê; BDP dê hertim li derveyî hesaban bimîne û hêza xwe ya siyasî wenda bike.

A duyem jî divê BDP xwe nêzî komên din ên kurdan bike û nemaze ji bo derdorên oldar ên kurd siyasetên nû bi pêş bixe. Hevgirtina digel komên siyasî yên kurd, ji ber ku girîngîyê bide daxwazên kurdan girîng e. Hilberîna polîtîkayên li gor hesasîyetên derdorên oldar, him rê lê vedike ku BDP nêzî girseya xwe ya muhafazakar û oldar be, him jî bikaribe pêşî li rexneyên **AKP**ê yên di wî warî de bigire.

BDP divê siyaseta xwe derxe pêş, xwe ji kulta serokatîyê û fetîşîzma têgehan pak bike, dûrî hişkîya siyasî bisekine, bibe xwedî tewanbarîya siyasî û di polîtîkaya partîya xwe de pirtir cih bide nirxên siyasî yên lîberal. Rêya famkirina guherînên civakî û hilberîna polîtîkayên alternatîf di wir de ye.

* Perwerdekar, li Fakulteya Hiqûqê ya Zanîngeha Dîcleyê.

Wergera ji tirkî: Celîl Kaya

www.kurdishdiplomatique.com

◄ Ji şoreşê ber bi restorekirinê ve? (Dewama rûpela 1)

Taybetmendîyên Tûnis û Misirê

Em dikarin herweha ji xwe bipirsin ka ji bo çi bûyer ji Tûnis û Misirê dest pê kirin. Şik tê de nîne, êdî ti rejîma ereb li hemberî muxalefetê parastî nîne, bandora domînoyê ya di nav welatên ereb de bi awayekî pêk hat ku xetên hêzê li herêmeke fireh a ji Fasê heta bi Kendavê ji cihên xwe leqiyan. Di vê navê de raperînên pêşî li wan welatan bi ser ketin, yên ku ji destpêka sedsala 20ê ve tevgerên navendîkirina îdarî û siyasî xurt bûn.

Heke em rewşa Misirê û Împeretorîya Osmanîyan di sedsala 19ê de li ber hev bigirin û şîrove bikin, em dibînin ku Misirê ew tişta ku Împeretorîya Osmanî tê de bi bin ket, bi ser xistiye. Misirê ne ku bi tenê fikra neteweyekî û civakeke siyasî afirand, lê belê cihekî navendî da paytextê. Maneya vê ne ew e ku nasnameyên cihê nebûn, lê belê ya ji ber wan mayî bi qasî ku siyaseta "neteweyî" di dawîyê de li paytextê biryar dayî bû. Rewş li Tûnisa ji serdema Beylikatan ve pir zêde navendîbûyî ye jî ji heman rengî bû: Pêvajoya şoreşger ya rastî ji 11 heta 14ê çileyê ango bi tenê sê roja û li paytextê qewimî.

Li van herdu welatan xisletên din ên hevpar jî hene: Weke mînak berevajîya li Lîbyayê, eşîretparêzî li wan ne xwedî roleke dîyarker bû (belkî li kevîyan, li herêmên sînor xwedî roleke dîyarker bin). Bi heman rengî, tevî pirsgirêka ***qiptîyan*** a li Misirê jî ku pirsgirêkeke pir girîng e, belê ne di asta civakîbûnê de ye, ya ku em li Iraq û Yemenê nas dikin, mezhebparêzî jî li van welatan xwedîyê cihekî sînordar e. Van faktoran qadeke siyasî afirand ku li gor deverên din ên cihana erebî pir zêde întegrekirî, kêmtir di bin bandor û hîpoteka herêmparêzî, eşîretparêzî û mezhebparêzîyê de ye. Li van herdu welatan dewra artêşê di xirabbûna krîzê de pir dîyarker bû, herçend nabe ku mirov herdu artêşan li ber hev bigire.

Li Tûnisê artêş ti caran nebûbû stûneke rejîmê, ev sînordarî û marjînalîteya wê kiribû ku ew weke sazîyeke întegrebûyî were nasîn; li Misirê bixwe artêşa ku beşeke dîyarker a sîstemê bû û di zilm û tepisandinê de bi rola xwe radibû, jê hat ku êdî îmaja xwe ya hêza welatperwer biparêze. Li herdu welatan artêşê red kir ku yekser di tepisandina gel de cih bigire, piştre ji bo ku reîs ji ser dika siyasetê dûr bike, kete dewrê, bi vê jî artêş li herdu welatan bû aktoreke bivênevê yê pergala şoreşger. Li alîyê din divê mirov herweha bi hêza bandora faktorên konjukturî û demî jî zanibe: Her du civak jî pir vekirîbûn û xwedîyên avahîyên siyasî yên pir kevin bûn. Vekirîbûn serê pêşî xwe bi gelek mîlyon tûrîstên hersal bêvîze dihatin serdana van welatan îfade dikir, misirî û tûnisî bixwe bi rîsk û tehlûkeyên digirtin ser xwe ji welatên xwe derdiketin. Hebûna hejmareke pir zêde a mezûnên zanîngehan û întellektuelan, dîyaspora, rastîya televizyonên dewletê û jixwe kanalên satelîtî yên hew dihatin kontrol kirin, îfadeyeke din a vê vekirîbûnê bûn: Rêzefilmeke televizyonê yê weke *Avahîya Yaqûbyan* (ji ber romana *Alaa el-Eswanî* ya bi navê *Îmarat Yaqubyan* hatiye girtin) ku çarçoveya wê ya dijdewletî dîyar e, li Misirê xwedîya bandoreke girîng a civakî bû. Desthilatdarî pêre rûbirû mabûn ku qadeke îdeolojîk a herî piçûk misoger bike, ev qad der barê çendek beşên kurt ên dîroka wan de bûn, yên weke şerê ***Kîpûrê*** li Misirê yan jî li Tûnisê desthilatdarbûna **Bin Elî**; ji bo ya mayî, civakê xweserîyeke mezin bi dest xistibû.

Di heman demê de desthilatdarîyê helwêstên xwe yên pir zêde kevin û ne li gor demê parastin. Ji bo piştrastkirina vê di rastîyê de hebûna yek partîya bi tenê û hilbijartinên weke referandûmê yên ku destûr didan serokdewlet ku her carê % 94 - % 97ê dengan bistîne, têrker in. Pêvajoya hilbijartinan tevahîya burokrasîyê seferber dikir, avahîyên desthilatdarîyê û îtaetkirinê ji nû ve çêdikirin û di vê navê de tu hêza bawerî pê were di nav civakê de çênedikir. Taybetmendîyeke din a li herdu welatan ew bû ku kolan aktorên sereke yên muxalefetê bûn. *"Kolan"* ne fikreke sosyolojîk e, ev kategorîyek e ku divê hê ji nêz ve û kite bi kite were terîf kirin, lê belê em bandora wê ya siyasî û hêza wê dibînin dema ku civakeke muxalif dibêje: *"em gel in û em dîyar dikin ka kî dijmin e û dijmin desthilatdarî ye"*. Wê kêlîyê gel bi gewde dibe. Lê belê seferberîyeke evqasî mezin ne mumkin e pêk were, heke çîna navîn bixwe tevlî nav refên tevgerê nebe.

Rola çînên navîn û artêşê

Mirov çînên navîn li van herdu welatan çawa terîf bike? Bêguman wê pêdivîya me bi lêkolînên hurgilî yên der barê mijarê de hebe, yên ku wê destûrê bidin em têgehên xwe hesastir bikin jî di navê de. Ji bo hêsankirina mijarê ez ê li vir du rengên çînên navîn cihê bikim. Li alîyekî çîna navîn a "kurtêlxwur", ya karmendên dewletê (dersdar, bijîşk, mamosteyên zanîngehê, burokrat, muhendîsên filan şirketa dewletê, xebatkarên bankeya navendî ...).

Ev çîna ku desthilatdarîyan ew kedî kirî û bi qedrê wê nedizanî, doza reformên radîkal dikir. Li alîyê din divê mirov behsa wan çînên navîn yên girêdayî cîhana aborî, tûrîzm, bazarê jî bike; desthilatdarîyê ev çîn bi tevahî bi tenê hiştibûn, bûrjûwazîya nû ew fetisandibûn. Ev bûrjûwazî bi xêra veguherînên mezin ên aborî yên li cîhana erebî derket holê (destpêka telefonên destan, di aborîya cîhanê de bicihkirina xizmetên bankeyî, bazara erebeyan...), di bin parastina desthilatdarîyê de pir bi lez dewlemend bû û ev dewlemendîya darî çav bi mirêsdarî nîşan dida. Ev çînên navîn ên girêdayî cîhana aborî jî di nav veguherînên tundrew de bûn. Çalakîya bi hev re ya van herdu şêwazên çînên navîn pêvajoya muxalefeta şoreşger pir bi lez kir. Artêş beşek ji dewleta-yekdestdar bû, lê belê beramberî reîsê ew temsîl dikir, xwedîya xweserîyeke bi rastî bû; ji bilî alîyê kolanan nîşan dida, wê nedikarî berekî din bide siyasetê. Ew ne weke aktoreke şoreşger kete nav tevgerê, lê belê weke ewlekara dewamîya dewletê, weke hêmanê navendî yê pêvajoyeke restorekirinê. Jênehatîbûna reîs a fêmkirin û birêvebirina krîzê, jixwe esker neçar hiştin ku berîya qada xwe ya manevrayê têra xwe fireh bikin, bi awayekî xweser helwêsta xwe dîyar bikin.

Dema ku **Bin Elî** ragihand ku ew ê di hilbijartinên bê de nebe namzed, di nav artêşê de tovê pirsgirêk û nakokîyê reşand. Lewma maneya vê yekê bi awayekî eşkere mikurhatina li nerewabûna serokdewletîya reîs bi xwe bû: Reîs xwest ku peymana nerewabûna wî ya ku ew li ser textê desthilatdarîyê digirt sê salên din were dirêj kirin û bi vê wî ne bi tenê xwe di nav civakê de nazik û ji derban re lawaz kir, lê belê di nav yekdestdarîyê de jî lewra wê hew dikarî weke ewlekar û hemîya pergalê pişta xwe bi wî qewîn û rast bikira. Reîs êdî nedikarî ji bo vî pêkhênerê yekdestdarîyê yê çekdar asoyekî paşerojê dîyar bike. Di encamê de redkirin û kirina der a *primus inter pares* veguherî şertê saxfilitîna tevahîya pergalê.

Li Misirê heman şaşîya birêvebirinê hat dubare kirin. **Mubarek** xwest ku heta îlona 2011ê xwe lê ragirin û paşê êdî ew ê di hilbijartinan de hew bibe namzed. Ji ber destwerdana vê pircuretîya aktoran, pêvajoya şoreşgerî di heman demê de pêvajoyeke restorekirinê bû. Beşdarîya artêşê destûr da dewletê bêyî ku ji şoreşê qut bibe, di cîh de dest bi restorekirinekê bike. Îro di van her du civakan de di van şert û mercan de gelek tişt diqewimin: Di dema navîn de kî wê bi ser keve? Dînamîka şoreşger yan ya restorekirinê? Li vir em cihêtîyên di navbera çînên navîn de dibînin. Çiqasî çînên navîn ên karmendê dewletê zorê didin ber bi alîyê şoreşê ve, çînên navîn ên girêdayî aborîyê jî ewqasî doza bilezkirina pêvajoya restorekirinê dikin. Bi awayekî mirov dikare li vê serwext bibe, lewma bêtirî du mîlyon mirovan li Misirê yekser û deh mîlyonên din jî bi awayekî neyekser debara xwe bi tûrîzmê dikin. Erê dema betlaneya cejna hêkesorkê bi tevahî ji dest çû, zirareke mezin li dema havînê bû. Ji gelek hefteyan û vir ve li Tûnis û Misirê xwepêşandan hene ku doza restorekirinekê dikin: Ev ne ew in yên tevgerên ku desthilatdarîya kevin wan bi rê ve dibin. Di destpêka tevgera muxalefetê de rewş wisa bû. Ev xwepêşandanên dijber ên bûrjûwazîya bazirgan a Qahîrê yan jî Tûnisê ne û her diçe bêtir doza îstîqrar û nîzamê dikin.

Bandora domînoyê pêk hat

Mirov di bandora domînoyê çawa bigihe? Sala 1989ê li Ewropaya Rojhilat bandora domînoyê rû da, lê belê şert û merc bi tevahî guhertî bûn, lewra împaratorîya parêzvan, Yekîtîya Sovyetan dabû zanîn ku ew ê êdî li derveyî sînorên xwe dest wernede bûyeran. Dema ku dîktatorîyên dawî jî rûxîyan (*Portugal, Yewnanîstan, Spanya*), ev bandor di navbera salên 1974 û 1976ê de li Ewropayê jî qewimî.

Îro ji dewama bûyeran qut û serbixwe, em tesbît dikin ku bandora domîno li Rojhilatê Navîn qewimî jî. Maneya vê ne ew e ku tevahîya desthilatdarîyan wê ji hev bikevin, lê belê îfadeya cîhguhertina xetên hêzê ye di nav her desthilatdarî û civakê de. Êdî em nikarin dîroka Rojhilatê Navîn binivîsin, li dewlet û civakê bifikirin bêyî ku tişta qewimî li ber çavan bigirin. Ev bandora domînoyê dikare bibe sedema gelek encamên nakok.

Li *Urdun* û *Fas*ê em întegrebûneke mezin a siyasî ya aktorên muxalefetê dibînin. Em dizanin ku her du civak xwedî çapemenîyên nisbî azad in û nexasim li Fasê çîneke siyasî heye. Hileyan bi awayekî sîstematîk naxin hilbijartinan û carinan ew qet pêk nayên lewra mirov naçin dengê xwe nadin (rêjeya dengnedanê di hilbijartinên dawîyê yên li Fasê de % 65 bû). Bi ser de jî desthilatdarî du caran parastî ye, lewra ew monarşîk e û dixwaze wisa bimîne, û ew şerîfî ye ango paşîyên pêxember in. Maneya vê ne ew e ku ya em ê bibînin wê îstîqrareke siyasî be, ne jî derbasbûneke siyasî weke ya Spanyayê be, belê mumkin e ku awayekî lihevkirinê were peyda kirin; bi destûrdana firehbûna kursîyê desthilatdarîyê bi rêya tevlî sîstemê kirina aktorên siyasî û civakî.

Rewşa li ***Başûrê Kurdistanê*** jî bi heman rengî ye; li wir tevî dijberîyê jî desthilat xwedîya rewabûneke xurt a neteweperest e, lê belê bi xêra çapemenîyeke azad û muxalefeteke xurt mirov dikare di warê veguherînên destûrê didin dewrgirtinê de bi wan re bike der. Li alîyê din em dikarin bibînin ku rejîm hê bêtir dibin ewlekarîperest. Me ev yek li *Bahreyn*ê dît, em li *Sûriyê, Libnan* û *Yemen*ê dibînin. Ev veguherîna ewlekarîperest nîşan dide ku di demeke dîyar de dewlet dikare bi tenê tişta ku di rewşên asayî de dixwaze berteref bike bimîne, ango dijberîya-dewletê. Artêş dikare ji holê were rakirin û hêzeke milîs li şûnê were bi cîh kirin, xetên aborîyê dikarin bi aborîyeke hov a paralel werin xira kirin. Hebûna dijdewleteke ku debara xwe bi çavkanîyên dewletê dike, di çarçoveya zanista nirxê de ya ku dewlet bixwe didiyê, tev digere, lê belê di heman demê de ji dewletê bi tevahî serbixwe ye; ev hîpotezeke gelekî mentiqî ye ku divê mirov li ber çavan bigire. Pêşnîşan û rengên wê me di dîroka nêzîk a Rojhilatê Navîn de di dema wêrankirina ***Hema***yê ya sala 1982yê li Sûriyê dîtibû. Îro senaryoyeke bi heman rengî li Lîbyayê mumkin e, heta dibe ku niha li wir li ser kar jî be.

Qedafî stratejîyeke kaosê û êrişkarîyê dipejirîne, a ku hêza rijî nîşan dide, bêyî ku di demên krîzan de li rewabûnê, yan jî endambûnê bigere. Dibe ku ev stratejî li Bahreynê jî were pejirandin, tişta li wir diqewime jî pir fikaran bi mirovan re çêdike. Li Bahreynê ne ku bi tenê muxalefet hate tepisandin û perçiqandin, lê belê me şahidî lê kir ku hêzên suûdî weke eskerên bimûçe desttêwerdan ser rewşê, hêza parêzvan a desthilatdarîyê ya ji derve hatî û desttêwerdayî nav karûbarên navxweyî yên vî welatî. Di vê teşegirtinê de ji mirov weha ye ku tişta diqewime bandorê li sê welatan dike, lê belê halê hazir jê nayê ku bikeve demîtîya rojhilatê-navînî ya heyî: *Cezayîr, Iraq* û *Libnan*. Weha xuya ye ku Cezayîr bi şerê navxweyî yê salên 1990ê pêk hatî (160 000 kes mirin) bi tevahî tevizî ye û vî şerî civak bi awayekî bandorên giran bike, ji hev dirand. Berevajî herdu civakên din ên pirparçe û tebeqebûyî yên Iraq û Libnanê, pêkhênerên dewlet-yekdestdarîya Cezayîrê yên di bin serwerîya artêşê de di nav xwe de pir girêdayî hev in. Li Iraq û Libnanê em girîngîya hevgirîya mezhebperestîyê dibînin û desthilatdarî li ser hîmê dabeşkirina hêzê ya li gor cemaetan hatiye damezrandin ku çawa ku li Iraqê diqewime, dibe sedema pirsgirêkên nayên çareser kirin.

"Modeleke erebî"

Ya ku li welatên erebî diqewime gelo modeleke mînak diafirîne? Ji sala 1979ê heta 2000ê cihana erebî êdî hew model afirandin, û mirovan berê awirên xwe ziviriandibû alîyê Afganistan û Îranê. Îslamîzm dihate wê maneyê ku li van welatan li modelekê tê gerîn. Îro, heke tevahîya şoreşan bihatana tepisandin jî, meydana ***Tehrîr***ê û rêya mezin a ***Bûrguwîba***yê modelekê cewherê yê bi rastî demokratîk pêşnîyaz dikin. Ev model hatiye arşîv kirin, me her kêlîya wê qeyd kiriye, ku bêminak e. Heta niha ji ber nebûna rabihurîyeke serfiraz di sedsala 20ê de û ji ber nebûna paşerojeke siyasî civakên erebî bi kerb bûn, ev jî sedema westeke civakî ya mezin û cazîbeya êrişên xwekujî ye ku bixwe nîşana serkutkirina niha, herweha rabihurî û paşerojê ye. Heke şoreş bihatana tepisandin jî em dikarin bibêjin ku van herdu meydanan anor û rûmeta cîhana erebî ji nû ve ava kirin, bi wî rengî ku cîhana erebî ji bo cara pêşî ji gera li yekdengîyê derket: Hêvîya demokratîk ku li gelek welatên erebî îro cihê xweîfadekirinê ye, nîşan dide ku civak ji ber pirengîyê xwe weke civakeke pirparçe qebûl dike, ku bi gotinên **Claude Lefort** em weke nemisogerîya demokratîk qebûl dikin. Di nav van tevgeran de gerîna li yekdengîyê nîne. Weke mînak îslamîst hewl nadin ku hegemonîya xwe li ser civakê ferz bikin, berevajî mirov dest pê dikin ku pirengîya navxweyî ya tevgerên îslamî ya ku demeke dirêj ji ber sedemên stratejîk hatî veşartin, tesbît bikin. Tercîha pirengîyê taktîk nîne, ev li ber çavan girtina rastîya tevgeran e.

Pirsa dîn hê pirsa navendî ye, lê belê ew diguhere: Rejîmên otorîter di bîst salên dawîyê de tawîzên muhafazekar dan gelek giregirên herêmî, pê bi awayekî rê li ber îslamîbûna civakê vekirin, û pê xwe rewa kirin. Welatên rojava dildar bûn destekê bidin rejîmên otorîter lewra ew difikirîn ku ev rejîm firehbûn û belavbûna îslamîzmê sînordar dikin, bêyî ku li ber çavan bigirin ku peymana nefermî ya li van welatan redkirina îslama siyasî bû, di berdêla erêkirina timî bêtir tawîz û îmtiyazên ji bo îslamîkirina muhafazekar a civakê. Îslamîstan tevgerên dijberên rejîman dîtin û bi îmtîna nêzî wan bûn, ew ditirsiyan ku destê zorê bi ser wan de dikeve û ew di nav civakê de xwedîyê xweserîya xwe ne. Heke pêvajoya şoreşger neçar be raweste, dibe ku hevgirtina muhafazekar a di navbera dewletan û tevgerên îslamî yên ji siyasetê şûştî de xwe nû bike. Lê belê gelo ev model dikare ji cîhana erebî û wê de biçe? Ji bo çi Afrîkaya misilman a ku pir nîqaşa tişta li welatên ereb diqewime dike, nakeve nav liv û tevgerê? Li Senegal û Maliyê çend bûyeran rû da, lê belê bi pêş neketin. Û ji bo çi li qada afgano-pakistanî van raperînan rê li ber awayekî din ê dîtina cihanê venekir? Gelo dibe ku bi peyameke ji bajarekî piçûk ê Tûnisê tê, pirsgirêka eşîrî û îslamîzm karibin ji nû ve werin terîf kirin? Halê hazir ev pirs hemû bêbersiv in, lê belê ew pirs di heman demê de îşaret bi berpirsîyarîyeke Ewropayê jî dikin, ku di divê bi tevgerê re be û bi awayekî bike ku encama wê ber başîyê ve be. Di kêlîyeke dîrokî de ku bang li înîsîyatîfeke Ewropayê ya siyasî, civakî û aborî dike, dema mirov Ewropaya ketiye hundirê xwe dibîne, ev yek fikaran bi mirovan re çêdike.

• Ev gotar di Gulana 2011ê de di malpera cairn.info de bi fransî hatiye weşandin

* Birêveberê Lêkolînan li EHESSê, nivîskarê ***Sociologie politique du Moyen Orient*** (Civaknasîya Siyasî ya Rojhilatê Nêzîk), Parîs, La Découverte, 2011 û di ***Esprit***ê de nivîskarê gotara "***L'avenir de la violence au Moyen Orient*** (Paşeroja Şidetê li Rojhilatê Navîn), Tebax-Îlon 2008.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.kurdishstudies.net

1ê çileyê 2002yê, pereyê yekbûyî (yê sala 1999ê çêkirî) kete bazarê. Ji dilşahîya nepixandî ya çapemenîyê gumanên li ser pereyekî li Parîsê sêwirandî, li Brukselê qebûlkirî û li Frankfurtê derbkirî, difûre. Heta wê radeyê ku muteşebis vê pirsê ji xwe bikin: Gelo euro wê pif bike finda yanzdehsalîya xwe?

Deh find û têkçûnek

Dema ku euroyê kela canê redaksîyonên çapemenîyê radikir

Antoine Schwartz*

Di kanala France 2 de, 4ê çileya 1999ê nûçeyên saet 20ê. Ji sê rojan û vir ve, euro bi awayekî fermî bûye pereyê yekbûyî û bitenê yê yanzdeh welatên Yekîtîya Ewropî. Reportajeke "*vegotina rojeke weke cejnê li bazarên malî*"rave dike. Analîza berpirsîyarekî borsaya Parîsê weha ye "*Euro şoreşek e, şoreşek e kar tîne.*" Piştre walîyê Bankeya Fransayê **Jean-Claude Trichet** got "*dema mirov tiştê diqewime dibîne, ev şahîyeke xwerû ye*". Piştî wî pêşkêşvan **Claude Sérillon** ji kevne-serokê Komîsyona Ewropayê **Jacques Delors** dipirse: "*Zilamên sektora fînansê razî ne, siyasetvanên ewropî jî. Lê belê hûn, çepgir, gelo ev yek we zivêr nake ku em îro Ewropaya Pereyan bi şahîyan pîroz dikin?*" Mêvanê wê qet acizbûyî xuya nake: "*Pereyê yekbûyî ji bo Fransayê azadîyeke mezintir e, di mijara pereyan de qadeke firehtir a manovrayê ye. Bi şertê ku yekîtîya aborî û pereyî bi ser bikeve.*"

"Utopya êdî ne zarok e..."

Gelo bi ser ket? Duwanzdeh salan paşê, **Delors** hişyar dîyar e: "*Ewropa li kevîya kendalê ye*", ev tesbîtên kesekî ne ku bi ser de jî yek ji mîmarên euroyê bû (*Le Soir*, Bruksel, 18ê tebaxa 2011ê). Yek ji edîtorên *Financial Times*ê **Martin Wolf** jî ji serketina euroyê gumanan dike: "*heke birêveberên siyasî berî du deh salan tiştê ku îro pê dizanin xeyal bikira, hingê wan dê tu caran projeya pereyê yekbûyî nedida dest pê kirin*" (9ê çirîya paşî ya 2011ê).

Dawîya salên 1980yê, berpirsîyarên fransî herî zêde alîgirên projeyê bûn. **François Mitterrandê** ku hem ji ber întegrasyona ewropî tatêl û mitale dikirin û hem jî ji ber hegemonyaya markên almanî bi fikar bû, ji bo ku vê rewşê biguhere, çêkirina pereyekî nû yê hevpar da ber xwe. Ev yek li alîyê din ê Renê, ne bi dilê birêveberan e. Ji bo ku bawerîya wan bi xwe bîne, serokkomarê Fransayê bi tevahî lîberalkirina tevgerên sermayeyê qebûl kir, bêyî ku berî wê bazar werin ahengdar kirin. Komîteyeke bankeyên navendî û bisporan ku **Delors** serokatîya wê dikir, çareserîyeke têra xwe hêsan peyde kir da ku dijberîya "zaneyên" Bundesbankê ("Buba", Bankeya Navendî ya Almanyayê) bêtesîr bike: Yekîtîya aborî û pereyî wê bi tenê bi şertên ji alîyê paytexta hingê Bonnê ve dîyarkirî pêk werin. Bankeya Navendî ya Ewropayê ya paşerojê ya ku wê ji erka siyasî serbixwe be, bi tenê yek wezîfeya wê dê hebûya, ew jî kontrolkirina îstîqrara buhayan e. Ev têgihîn di mermerê ***Peymana Maastrichtê*** (sala 1992yê hat mohr kirin) de hate verotin, li ser mohra pir zelal û dîyar a doktrîneke taybet hebû, doktrîna "ordolîberalîzmê" –navê ku li neolîberalîzma alman tê kirin.

Ji dema ku pereyê yekbûyî yê bi tenê kete meriyetê, nîqaşa sereke êdî her hewl da dengê hîmên îdeolojîk bibire. Ji bo çapemenîyê euro bi tevahî tiştekî din bû û ji vê jî wê de. Bi awayekî pêşketineke dîrokê bû –dibe ku ji vedîtina nivîsê û vir ve ya herî mezin be. Ji bo **Jean-Marie Colombani** yê ku hingê birêveberê *Le Monde*ê bû euro "*biserketineke vînê ya li dijî bazaran, ya biryardarîya çend mirovan li dijî hêzên aborî*" bû (*Le Monde,* 31ê kanûna 1998ê). Li alîyê xwe, bi ya **Bernard Guetta** Yekîtîya Ewropî bêtir nîşana "*serketina mentiqî*" bû. "*Bi euroyê re tevgera yekbûnê bi leztir dibe*", û divê gelan ber bi Ewropaya xeyal û hêvîyan ve bibe; rojnamevanî weha pêş didît: "*utopya êdî ne zarok e. Emrê zilambûnê li pêşîyê ye*" (*Le Nouvel Observateur*, 31ê kanûna 1998ê).

Ji bo kesên gumanbir, birêveberê rojnameya *Libération*ê **Laurent Joffrin** bi bîr dixe ku "*avakirina ewropî, berîya ku kelecaneke dilî be, siyaseteke mentiqî bi gewde dike.* (...) *Wekî din jixwe ji ber vê yekê ew îfadekirina bipêşketineke pir mezin e û –heke gel jîyanê bidin – gaveke ber bi asteke li jortir a demokrasîyê ye*". Avakirina otorîteyeke ku ji kontrola hukûmetan derdikeve, dikarî dîsa jî weke bipêşketineke nisbî xuya bike..., yek ji edîtoran li ber vê radibe "*navê vê macerayek, serpêhatîyek e*". (*Libération*, 1ê çileyê 1999ê).

Çapemenî li ber xwe dide da ku kêfxweşî û şahîya xwe par ve bike: *"Roja biserketinê hat",* sernûçeya *France Soir*ê (5ê çileyê 1999ê); bi peyvên "Jidayikbûna parzemînekê" bergê *Nouvel Observateur* radigihîne (31ê kanûna 1998ê). Mixabin salekê piştre, *Le Monde* lê mikur hat ku pereyê nû berîya hertiştî dîyarîyeke dayî muteşebisan bû. "*Ji bo ku Ewropayeke bêtir întegrebûyî, bêtir piştgir û xurttir were afirandin, euro hatibû sêwirandin. Çawa ku* ***Dominique Strauss-Kahn*** *adara 1999ê got, ew diviya bibe 'amûra herî baş a mumkin da ku Ewropa ji heq globalbûnê derkeve'. Ya rastî pereyê yekbûyî yê tekane bêtir hevrikîya di navbera welatên ewropî de xurt kir da ku muteşebisên ji derve bikişîne"* (5ê çileya 2000ê).

Ev tesbît dîsa jî pêşîyê li çapemenîyê nagire ku pîpîk û dûdûkên xwe derxe û ketina bazarê ya pereyên hûr û banknotên euroyê pîroz bike. Helhela *Express*ê bû ***"bijî euro!"*** (27ê kanûna 2001ê). Rojnamevanên hevgirên otorîteyên sîyasî û pereyî hîç dudil nînin û difikirin ku gel vê heyraniya wan a ji bo "*vê piştgirîya nû ya li bazarê*" parve dike (*Journal du Dimanche*, 2yê îlona 2001ê). Çawa amerîkî berê çûbûn ser heyvê û li ser meşiyabûn, ewropî jî êdî wê bikaribin li ser parzemîna xwe bigerin, bêyî ku serê xwe bi hesabê pir tevlîhev ya pevguhertina pereyên dewletekê bi yên din re biêşînin. Agir bi rojnamevan **Jean Boissonnat** dikeve: "*Tevahîya dinyayê metelmayî ye: Ev kîjan mûcîze ye ku kir ev gelên Ewropayê yên bayî û ketî ber dest û lingan, karibin tiştekî evqasî harîqulade yê weke pereyê yekbûyî vebînin?*" (1)

Di çapemenîyê de tu kesê gumanan jê dike nîne: Pereyê nû wê destûrê bide "*me*" ku di warê hevrikîya bi dolaran re li ser qada navneteweyî "*giranîya me hebe*". Heta bi pereyên hûr yên nû û banknotên ku estetîka wan pir jî misoger nebû, kela canê edîtoran radikir: Li gor *Libération*ê wan "*hindek ev hebûna dûr û hindekî bêtir parvekirina di nav ewropîyan de bi gewde dikir*" (3yê çileya 2002yê). Sersalê kanalên televizyonê dîmenê destên serfkarên pêşî hatin, vî pereyê binirx ji mekîneyên otomatîk ên pereyan bikişînin, girt. Edîtor **Eric Le Boucher** jî ji kêfa ji hişê xwe diçe: "*Şoreşeke bi rastî darîçav, rojane û bi kêf û şahî hatiye qebûl kirin, çawa ku bi mîlyonan ewropî dilezînin da ku taximê pereyên hûr bikirin û weke dema noelê bi van pereyên hûr yên dibiriqînin, dilîzin*" (*Le Monde*, 30-31ê kanûna 2001ê).

Di nav xelkê bi xwe de ev halehalên kêfxweşî û şahîyê nermtir û kêmtir in. Jixwe bi serê xwe fikra xirab ditirse ku ji pereyên neteweyî derbasbûna euroyê, wê bibe sedema buhabûnê. Nivîskarekî quncikan bi hêrs dibêje: "*Weke vê dolabê! Çawa me dest bi lîrandin û tilîlîyên ji kêfa euroyê kir, agir ber bû buhayan. Tehlûke, weke li her deverî, amalgam e.* (...) *Dema poujadîzm* [tevgereke sendîkayî ya bi pêşengîya Poujade bû ku di salên 50yê de li Fransayê peyde bû û hewl dida bi sînordarkirina bazarê, maf û qadên sinetkaran û dezgehdaran biparêze, îro ev peyv weke hevmaneya peyva populîzmê tê bi kar anîn; nota wergêr] *dîyar bû divê mirov tiştên hêsan bi bîr bixe. Euro êdî dîyardeyek e, şansek e ji bo Fransa û ji bo Ewropayê*" (*Journal du Dimanche*, 2yê îlona 2001ê). Xeta parastinê hatiye dîyar kirin: Her fikra dijber, her ramana rexnegir wê weke "demagojî" yan jî "populîzmê" werin dîskualîfîye kirin. Hewqas hermonîkirinên ji bo paşerojeke birîqende, nexasim dema kampanyaya referandûma 2005ê ya li ser Peymana Destûra Bingehîn a Ewropî. (2) Li alîyê xwe, Trichet belgeya xweşhalîya xwe dide fransîyan: "*di nav hestiyarîyên mezin ên welêt de yên ku ev pereyê yekbûyî dixwestin, lihevkirinek heye. Em pê gelekî hestyar in û têra xwe serfiraz in ku me ev encam bi dest xistin*" (kanala televizyonê France 2, 30yê tebaxa 2001ê).

Qufle û zirzeyên îdeolojîk êdî ne asteng in

Dema ku krîza çînên jêr bi carekê da der, şirovekaran dîsa peyva îlahî ya **Delors** bi kar anî: "*Euroyê em parastin.*" 9ê nîsana 2007ê birêveberê gîştî yê Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) yê spanî **Rodrigo de Rato** û kevne-wezîrê maliyê **José María Aznar** bi heyranî îdîa dikirin ku "*îro Ewropa parzemînek e ku dewlemendîya wê û pirrengîya wê dibe tevahîya dinyayê heyranî xwe dike.* (...) *Di bin handana birêveberên vîzyoner, sazî hatin damezrandin ku întegrasyona aborî ya zêde dibe ya parzemînê bi gewde dikin*". Weke çavdêrekî bisporê karê xwe, ew li gotinên xwe zêde dike: "*Ewropa hê jî di îtîqrara dinyayê de bi rolekî girîng radibe û para wê ya di bipêşvebirinê de jî pir zêde ye. Aborîyên ewropî zexim û xwegirtî ne*" (*Le Figaro*, 9ê nîsana 2007ê). Mirovî wê nikarîbûya ji vê çêtir û bêtir bi besîret bûya û baş pêşîya xwe bidîta...

Ji hingê ve meqamê dengî guherî. Qufle û zirzeyên îdeolojîk êdî ne asteng in. Heta bi îhtîmala devberdana ji euroyê jî tê nîqaşkirin. Û ji ber ku: krîz nakokîyên heyatî yên ku êrîşê dibin ser yekîtîya pereyan, diavêje bin agirên fikrî. Berîya hertiştî qedexeya li ser ECByê ku yekser pereyan bi deyn bide dewletan, ev yek destûrê dide ku bazarên malî li ber çavan werin girtin. Hukûmeta Fransayê niha xwedî helwêstekê ye ku wê berê weke ... "populîst" bi nav dikir, niha dixwaze ku ECB bi awayekî xurttir dest werde ji nû ve kirîna deynên dewletan. Berevajî vê, li gor otorîteya li Frankfurtê bixwe, bi kirîna beşek ji deynên dewletên rewşa wan zehmet, wê sînorên wezîfeya xwe û destûra xwe derbas kirine, û tevî krîz û qeyranê jî ew hê red dike ku xwe ji vê rewşa zehmet û nazik a ordolîberal xilas bike.

Îcar, euro bû çi?

* Hevnivîskarê pirtûka li jêr e, ligel François Denord: *L'Europe sociale n'aura pas lieu (Ewropaya civakî wê pêk neyê),* Raisons d'agir, Parîs, 2009.

1 Jean Boissonnat, Europ€, année zéro (*Ewrop€, Sal Sifir*), Bayard, Parîs, 2001

2 Serge Halimi, "Médias en tenue de campagne (*Çapemenî di Hewayê Kampanyayê de*)", Le Monde diplomatique, gulana 2005ê

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Diravê kultê

"*Li Frankfurtê 4ê çile sibehî, bi merasîmê, di bin ronîyên stroboskopîk û li ber dengê muzîka* beyta ji bo şahîyê *ya Beethoven, birêveberên borsayê kirarîyên pêşî yên bi euroyan dan dest pê kirin* (...). *Ewropayê zora gumanbirî, rexneyan bir û xwe bi pereyê xwe tekane gurçûpêç kir. Ji bo mezintirîn hevalbendên wê euro nûwelidîyeke xurt e, û ne ew gewî û pozbilindê ku gazincker li bendê bûn.*"

(Thane Peterson, "We have liftoff (Em firîyan)" *Business Week*, New York,18ê çileyê 1999ê)

"*Li Fransayê, li welatê ku bêkar herî kêm alîkarîyê distînin jî, rewşa wan ji piranîya karkerên dinyayê baştir e, stûna navmalê ya hêvîyeke kolektîf ya berê weke di dîrokê de nedîtî, sala nû bi euroyê pêşwazîya me dike. Ev nûçeya herî baş ji mêj ve ye!* (...) *Ahengdarkirina ku euro wê pêre pêre ferz bike divê bi kêrî me were û ji xêra me re be: Ji ber ku em mîqdara pereyan a herî mezin didin. Û ji ber ku sosyalîzma me ya herî zêde xwegirtî ye, tedbîrên wê werin standin divê berîya hertiştî barê me (yê aborî) sivik bike.*"

(Claude Imbert, *Le Point,* Parîs, 31ê kanûna 1998ê)

"*Jurîyên Nobelê ne şaş bûn, wan sala 1998ê xelata xwe ya aborîyê da teorîsyenê yekbûna pereyan ê kanadayî* ***Robert Mundell****: Mirov çawa mîmarê euroyê bi bîr nêyîne û rêzê jê re negire? Fransa bixwe bi awayekî xurt weke ku wê kêm qedir bidiyê xwe nîşan dide, nexasim li hember yekî ji wan ên ku bi serê xwe gelekî li ber da ku operasyona destpêkirina euroyê dest pê bike, em wî bi nav bikin: Walîyê Bankeya Fransî* ***Jean-Claude Trichet****.*"

(Jean-Marie Colombani, hingê birêvebera *Le Monde*yê bû, 23ê çirîya paşîn a 2001ê)

"Bi tevahî awarte û şahane ye mirov vê tevgera kelecana gel a ku berê tu kesan pêş nedîtî, bibîne. (...)[Euro] pêrgî kelecanê tê – ne destûr û riza, lê belê kelecan – kelecana gelî."

(Jean-Claude Trichet, hingê walîyê Bankeya Fransî, LCI, 1ê çileyê 2002yê)

"*Euro wê hem malî û hem jî siyasî li kar be û bi kêr were. Ew ê bibe beşek ji dîmenê aborîya globalbûyî. Di nav bazarên malî de mirov li hev dikin ji bo îdîa bikin ku euro wê bi ser bikeve. Heke bazar difikire ku euro wê bi ser bikeve, hingê euro wê bi ser bikeve.*"

("The euro is here to stay (Euro ji bo manê li vir e)", *The Independent on Sunday,* London, 3yê çileyê 1999ê)

"[Dijberên pereyê yekbûyî mirovên nostaljîk ên kêştîyên babirk in, xewn û xeyala wan dinyayek e ku mirov lê, ji bilî bi balonan nikare berê xwe bide deverekê."

(Alain Duhamel, Europe 1, 5ê çileyê 1999ê)

"*Euro hat: Ew wêneyê Ewropayekê ye ku ji nû ve ji dayik dibe, ku ji xwe hêvî dike xurttir û azadtir be. Em bixwe divê euroyê bi kar bînin ji bo ku şert û mercên eurodînamîzmê biafirînin, da ku ew hêza me pêk bîne.*"

(Dominique Strauss-Kahn, hingê wezîrê aborî û maliyê yê Fransayê bû, *Les Echos,* Parîs, 5ê çileyê 1999ê)

-Philippe Reinhard, rojnamevan e li *L'Evénement*: *"Ev tiştekî şahane ye, ev serpêhatîyeke bêqisûr e, lê belê berîya her tiştî borsa jê razî ne. Li borsayê agirekî bi carekê gurbûyî heye...*

-Paul Guilbert, rojnamevan e li *Le Figaro* (gotina wî dibire): *Va ye argumaneke komunîst! Ev kelevajî ye! Serpêhatî tiştekî gelî ye! Heke euro ji salek, du salan û vir ve, ji Maastrichtê û vir ve bi daxwaza borsayan nehata afirandin, şik û guman tê de nîne ku euro wê têk biçûya!*

-Reinhard: *Wê baş bûya ku xêra wê bibûya para mirovên din jî ... Rehet be: ez ne komunîst im."*

(kanala televîzyonê France 2, bernameya "Polémiques", 10ê çileyê 1999ê)

"*Heft mîlyon ewropîyên piçûk yên ku temenê wan di navbera 8 û 12 salan de ye [wê] posterekî pereyên hûr û banknotên euro nîşan didin [were şandin]. Pêşbirkeke –"bibin şampîyoneke/î euroyê" – pênc pirsî wê ji bo zarokan were li dar xistin. Şirketa Reklamê* ***Publicis*** *hêvî dike ku zarok tevî dêûbavên xwe li bersivan bigerin. 24 zarokên ku wê xelatê bigirin, wê bo Frankfurtê werin vexwendin da ku sibeha 1ê çileyê beşdarî merasîma ji dayik bûna euroyê bibin. Bi vî awayî zarok wê bibin kesên pêşî destê xwe dayî banknotên euro. Şansekî ku nedan nehsed rojnamevanên hatî Frankfurtê da ku beşdarî danasîna heft banknotan ji alîyê serokê BCEyê (Bankeya Navendî ya Ewropayê) Wim Duisenberg ve bibin.*"

(*Le Journal du dimanche,* Parîs, 2yê îlona 2001ê)

"*Parastina euroyê îro* (...)*, xwe bi xwe rave dike bi xêra –û ne ji ber– euroyê, welat wê beşekê ji serwerîya xwe ya pereyî û malî ji dest bidin, ku bi her halî xapandinek, fîksîyonek bû ku bi xeyalên çend lîderên nostaljîk, yan jî niyet xirab hatibû pêk anîn.*"

(Alain Genestar, hingê birêveberê redaksîyona *Le Journal du dimanche* bû, 3yê gulana 1998ê)

"*Di pereyê nû yê ewropî de mirov bi tenê bûyereke aborî bibîne ya ku divê jîyana serfkaran hêsan bike, çawa ku ya bankevanan û muzakerevanan hêsan kir, şaşîyek e. Euro dibe ku xwe weke bûyera siyasî ya herî grîng a sedsalê darî çav bike.*"

(Patrick Sabatier, *Libération,* Parîs, 1ê çileyê 2002yê)

"*Pereyê yekbûyî yê ewropî berîya mehekê di nav aborîyeke dinyayî ya bêîstîqrar de ji dayik bû. Dîsa jî nîşanên jêhatîbûna wê ya demdirêjîyê, hêvîyê dide mirovî. Berîya ku euro ji dayik bibe, pir mirov ditirsiyan ku ev pereyê nû derdora aborî ji berê bêtir bêîstîqrar bike* (...)*. Ya qewimî berevajîyê vê bû. Ya rastî çawa întegrasyona ewropî hêzeke pêşvebir bû ji bo bazirganîya navneteweyî, euro jî divê ji bo başkirina birêvebirina sîstema pereyî ya dinyayê amûrek be.*"

(Renato Ruggiero, "The euro makes for a safer world (Euro ji bo dinyayeke biewletir dixebite)", *The Wall Street Journal,* New York, 29-30ê çileyê 1999ê)

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.kurdishmondediplo.org

Dema ku hukûmet misoger dikin banke ya herî xirab dikin

Ji bo rizgarkirina pereyê yekbûyî xwe virde û wêde kirin

Bernard Cassen *

Mehmet Latif Saglam: **Rêza batirsokan**, li ser tuwalê boyaxa akrîl, 140 x 175 cm

Di filmê **Stanley Kubrick** *2001: A Space Odyssey* (*2001: Destaneke Fezayê*) (sala 1968ê li sînemayan hat nîşan dan), robotê bi navê ***HAL 9000***, ku bixwe mûcîzeyeke aqilçêkirî ye, li kêştîya fezayî *Discovery*ê suwarkirî ye, diçe Jupîterê û di rê de xwe ji kontrola astronotan xilas dike. Ji robot tê ku ji bilî yekî astronotên din tine bike, ji wî yekê mayî jî tê ku girêdana robotî ya enerjîyê qut bike. Heke em vegerin ser rûyê erdê û bi taybetî em vegerin Ewropaya sala 2012ê, em dikarin xwe bispêrin rabihurîyê û euroyê ango elektrona serbest a otorîteyeke siyasî ya wê bi rê ve dibe, nîne, rê li ber robotê fezayê bigirin. Dema çileya sala 1999ê ev pereyê yekbûyî li welatên şertên yekbûna armancê yên *Peymana Maastrichtê* (1992) pêk dianîn, di hewayeke kêf û şahîyeke giştî de afirandin, kesên ew sêwirandin pir jê pêşbînîyê dûr bûn ku tiştê wan afirandî dikarîbû bi tenê ya li gor dilê xwe bike. Tehlûke hebû ku mîmarîya Yekîtîya Ewropayê bihejîne ku ew bixwe gula wê ya geş bû.

Ji bo dîrokzanan "bavên euroyê" ango **Helmut Kohl, François Mitterrand** û heta **Jacques Delors** dikarîbûn ewqasî kêm sûdê ji sedemên gunehê wan kêm û nerm bike, bigirin, lewra der barê kelevajîtîya ferzkirina siyaseteke pereyê yekbûyî li ser welatên di warê dewrên aborî, avahîyên hilberandinê, demografî, asta hilberînerîyê û hwd. de di rewşên cihê heta bi xwe ji hev cihê de, ew hatibûn hişyar kirin. (1)

Ev yekane çewtîya sêwirandina destpêkê nîne. Derket holê ku biryara di bin zext û fermana Almanyayê de hatî dayîn ya spartina birêveberîya euroyê ya Bankeyeke Navendî ya Ewropî (ECB) ya bi tevahî ji hukûmetan serbixwe, yan jî ji tevahîya otorîteyên encama mafê hilbijartinê yê giştî ne serbixwe jî biryareke pir xirab e. Şaşîyeke din a ku mirovî matmayî dihêle: Qedexeya ECByê ya li ser erêkirina deyndayîna dewletan, yên ku ji bo xwe fînanse bikin wê neçar bimînin berê xwe bidin bazaran û bankeyên taybet, tevî ku berê derîyê Frankfurtê li van dewletan vekirîbû da ku ji deynên rêjeya faîza wan kêm sûdê bigirin.

Çawa em dibînin, berevajî HALê euro tu caran bi kesekî ya jî tiştekî ve girêdayî nebû. Euroyê dikarî dest bi karîyera xwe ya pereyan ku xwedî dînamîkeke serbixwe ye bike, tekane muxateb jî bazarên fînansî û ECB ne, ECBya guhdarîya bazarên fînansê dike, heta xwe fedayî wan dike. (2) Krîza deynê dewletê –ku sedema wê ya kûr û bingehî ew e ku deynê taybet, nexasim jî yê bankeyan vediguherînin deynê dewletê û ev jî bar e li ser pişta kesên bacê didin– derfetên bêsînor dan spekulasyonê û karên olîgarşîya fînansê. Û hebûna qada euroyê, ku siyaseta pereyî divê cihêtîyekê rêjeyên faîzê bi rê ve bibe ku ne mumkin e muamele pê re were kirin; ev cihêtî di navbera rêjeyên dewletên bakur (yên herî girîng Almanya, Hollanda, Awusturya û Fînlandîya ne) û yên başûr (Yewnanistan, Spanya, Portugal, Îtalya) de ye. Vê yekê karê olîgarşîya fînansê pir hêsan kir.

Erê fînans û ECB tu hesaban nadin tu kesan, lê belê birêveberê dewletên qada euroyê hesab didin: Ew girêdayî dogmayên neolîberal yên li ser kaxetên peymanên ewropî nivîsî yên wan kirî dengdanê jî bin, hilbijartinên ku divê ew di wan de bi ser kevin hene û divê asteke herî kem a hevgirtina civakî biparêzin da ku pêşîyê li serhildanên gel yên li ser sindoqan, yan jî li ser kuçe û kolanan bigirin. Civîna Bilind a Ewropî ya "şansê dawîyê" ya nizanim çendîn 8 û 9ê kanûna bihurî li Brukselê pêk hat. Di vê civînê de mijarên rojevê ew asêmayin û xitimîn bûn ku encama biryarên peymana ***Maastricht***ê bûn yên ku di peymana ***Lîzbon***ê de hatin parastin. Xitimînên ku di projeya peymana nû de ya ku encama vê civînê bû, dewam dikin. (3)

Xeta wê ya birêveber ji çarçoveya hişk a vê lihevkirinê dibihure û ji destpêka krîzê û vir ve dînamîka giştî ya Yekîtîya Ewropî nîşan dide: Telafîkirina kêmasîyên di hesabên giştî yên dewletên endam ên qada euroyê karê herî li pêş e, hem ji ber sedemên prensîpê -heta ji bo hukûmeta alman weke ferzeke exlaqî ye– hem jî ji bo rizgarkirina pereyê yekbûyî. Divê mirov vî pereyî ji tesîra spekulasyoneke dîyar biparêze, spekulasyona ku xwe dispêre îhtîmala çend dewlet nikaribin deynên xwe bidin. Mijarên din hemû kêmtir girîng in; hem mijara talanên civakî yên ji ber siyaseta hişkbûnê ya ji bo demeke dirêj pêşdîtî, hem jî mijara ketina nav krîzê ya tevahîya qada euroyê. Bi gotineke din: Divê mirov çavkanîya jîyana astronotan qut bike, daku HALê xilas bike.

Destê Berlînê bi taybetî giran bû: Her dewlet wê hewl bide di destûra xwe ya bingehîn de "rêzika zêrîn" ya tewazûna budçeyî binivîse, bi musamaha û çavlêgirtineke di navbera % 0.3 û 0.5ê ya Hilberandina Nesafî ya Neteweyî (HNN) de. Dîwana Adaletê ya Yekîtîya Ewropî bi nazikî û hesasî vê biryarê diparêze û herweha dadwerîyên neteweyî yên ku erka wan e ka gelo ev rêzik baş tê pêk anîn, kontrol dike. Komîsyon siyasetên budçeyî kontrol dike û heke lihevderneketina budçeyî %3yê derbas bibe, bi awayekî hema hema xweber cezayan dibire (cezayekî pereyan ku mîqdara wê biqasî % 0.2yê HNNyê ye). Parlemanter û hilbijartî li derveyî lîstikê hatine hiştin.

Erka parlemanan sistkirina kirasê teng ê budçeyî yê franko-alman e

Serokwezîra alman **Angela Merkel** ya rastî yekane kes bû ku doza peymaneke nû dikir. Ji wê re amûreke huqûqî ya ferzker diviya da ku ji bo başîya rewşa îxracatên alman qadeke pereyî ya biîstîqrar biparêze; her çiqasî ev yek bi riya li nîvê rê hiştina welatên hindik bawerî bi wan tê pêk were jî, çawa ku wê bi dilxwazî ji Yewnanistanê re pêşniyar kir. Di berdêla wê de, wê xwest Mekanîzmaya Ewropî ya Îstîqrarê (ESM) pir be –ya ku divê tîrmeha sala 2012ê şûna Fonên Ewropî yên Îstîqrarê (EFSF) yên ji bo rizgarkirina welatên di rewşên zehmet de, bigre–, lê belê bi awayekî pir zêde destgirtî. Divê mirov lê mikur were ku ew divê hesaban ji zor û ferzeke siyasî ya mezin a li hundir welêt jî bike: Hişyarîya Dadgeha Destûrî ya Federal a Karlsruheyê ya ku sala 2009ê biryareke dîrokî dabû, pê "*lêkêmkirina bunyewî ya demokrasîyê*" ya Yekîtîya Ewropî lê eşkere dikir û "*navendîbûna parlemanên neteweyî*" bi bîr dixist. Ji ber vê yekê serokwezîra alman neçar e di her qonaxê de kontrol bike ku piranîya wê ya parlemanter, yan jî dadgeh biryarên wê betal neke. (4) Dema mirov bi vî awirî li mijarê binêre, li gor lihevhatineke besît a di navbera hukûmetên tên û diçin de, peymanek bêtir destûrê didiyê ku xwe bi awayekî bikêrtir "bi zirx bike".

Lihevhatina 9ê kanûnê hê nû hatibû qebûl kirin, bû mijara gelek hesaban, tê pêş dîtin ku deqa dawîyê adara bê were mohr kirin û berî sal bi dawî bibe were erê kirin. Ev senaryo weke pir xweşbîn tê nirxandin. Hin tevger û partîyên ewropî van tiştan derxin pêş, ji ber ku peymaneke ji bo qada euroyê derbasdar –niha û potansîyel– tê amade kirin, wê bivê gelek tişt li (yan jî li şûna) kirasê ferzkirî ku **Angela Merkel** pêşnîyaz dike û serokkomarê Fransayê **Nicolas Sarkozy** jî bi ber bayê wê dikeve, werin zêde kirin. Weke mînak baca navdar a li ser veguhastinên malî, ya ku dikare bi awayekî bikêrhatî budçeyên ewropî yên "rizgarkirinê" têr û boş bike, û bi awayekî fermî herdu birêveberên welatan ev fikir qebûl kiriye. Ji ber ku Meliktîya Yekbûyî biryar da ku ne di nav lihevkirina bîstûşeşan de be, blokaja brîtanî hew heye, ewropî xwedî derfeteke yekane ne da ku kirin û nîqaşên xwe li hev bînin...

Wekî din, tevî xasûkî û qurnazîyên -li welatên pêvajoya referandûmê heye û nexasim li Îrlandaya referandûm ferz e-, dikarin ji bo rêlibergirtina referandûmê werin peyda kirin, erêkirina lihevkirineke bi vî rengî hê pir dûr e. Bi ser de jî, hin parleman (yên Slovakya, Hollanda, Fînlandîya, Macaristan, Komara Çekê) dikarin madê xwe bikin û nerazîbûna xwe nîşan bidin. Li Fransayê gelek namzedên serokkomarîyê di nav de yê Partîya Sosyalîst **François Hollande** jî dan zanîn ku ew ê doza ji nû ve muzakerekirina peymanê bikin. Ji bo ku mirov bawer bike ku peyman wê sala 2013ê bikeve meriyetê, divê hindekî çalak û bêperwa be...

Di vê navê de heke rewş ev be, mîmarîyeke paralelî ya Yekîtîya Ewropî û dibe ku hevrika wê be jî, wê bikeve dewrê: Ya qada bi tenê ya euroyê, ya ku endamên wê yên niha (hejmara wan hivdeh e) bihewîne û dewletên din ên Yekîtîya Ewropî hez bikin wê bibin endamên wê, ango ji dehan neh û Meliktîya Yekbûyî wê bibe suwara bi tena serê xwe. **Sarkozy** ev parçebûn şirove kir: "*êdî bi awayekî zelal du Ewropa hene. Yek jê bêtir piştgirîya di navbera endamên xwe de û birêkûpêkkirinê dixwaze. Ya din bi dûvê yekane mantiqê bazara bi tenê digire.*" (5) Vê yekê pir alîkarî da bûyer û dîyardeyan... Bêguman David Cameron wê xwe di beşa duyem de bibîne: Wî da zanîn ku armancên wî yên bi tenê, li hemberî vîna qels a birêkûpêkkirna ewropî parastina bazara tekane û parastina berjewendîyên sektoreke malî ya brîtanî a kurtêlxwur (% 10ê HNN, 1.6 mîlyon kar) in. Li hemberî vê dema ku peyva piştgirîyê hat bi lêv kirin, zehmet e ku mirov li **Merkel**ê bifikire...

Cihêtîya bingehîn a di navbera Meliktîya Yekbûyî û yên din ên weke Fransa û Almanyayê de endametîya qada euroyê ye. Saxmayîna qada euroyê û ne tiştekî din, tedbîrên sazûmanî yên di civîna dawî ya Konseya Ewropayê de derketî pêş, ferz dike. Nirxê sterlînê li gor rîtma konjuktura aborîya brîtanî, desttêwerdanên Bankeya Ingilîstanê kêm û zêde dibe... û nota kredîyê ya Meliktîya Yekbûyî hê jî AAA ye. Nirxê pereyê yekbûyî yê ewropî bixwe ne weke pereyên din li gor performansa bikarhênerên xwe yên di mijara budçeyê de herî ortodoks kêm û zêde dibe, lê belê li gor newekhevîya *(spread)* rêjeya faîzan a di navbera temînatên borsayê yên alman û yên welatên herî zêde deyndar de. Operatorên bazarên malî ya rastî li gor "navînî"ya di navbera yên li alîyekî û yên din de nafikirin, lê belê li gor kirina tehlûkê ya tevahîya qada euroyê bi rêya bandoreke domînoyê ya ku pêkhênerên wê yên herî lawaz dayî dest pê kirin. Ango mantiqî ye ku tevahîya qadê bi kêmkirina nota kredîyê re rûbirû bimîne.

"Jihevketineke muhtemel a tevahîya yekîtîya pereyî"

Almanyayê bi rengekî xwe bi xwe dest nîşan kir ku li qada euroyê bimîne. Ji bo wê, pereyê yekbûyî kozekî tîcarî yê stratejîk e, lê belê ew naxwaze buhayê wê bide –weke mînak destekê bide da ku bi xêra veguhastinên budceyî yên yekser yan jî neyekser ber bi welatên başûrê Ewropayê ve, *spreads* kêm bibin. Sedema serhişkîya wê ya li Brukselê da ku bi riya sazîyên ji yên Yekîtîya Ewropî hişktir li alîyê tesîrdarîya budçeyî hepis bike, ev e. Rola **Sarkozy** di vî karê cermeno-alman de bi xwe vê replîka lîstika şanoyê ya **Jean Cocteau** ya bi navê *Zewicîyên Birca Eiffelê* tîne bîra mirovî: "*Ji ber ku ev sir ne heddê me ne û ji me dibihurin, em ê xwe li organîzatorîya wan deynin.*"

Ya ku heta niha ne mumkin bû, parçebûna qada euroyê bû, êdî ew beşek ji wan senaryoyan e ku ne bi tenê şirketên mezin, lê belê herweha otorîteyên herî bilind ên malî jî li ser wan dixebitin, *Wall Street Journal* radigihîne: "*Hin bankeyên navendî yên ewropî dest bi çêkirina planên rewşên lezgîn kirin da ku îhtîmala derketina yek yan jî gelek welatan ji qada euroyê, heta jihevdeketineke muhtemel a tevahîya yekîtîya pereyî jî amade bikin.*" (6) Xiyaneta herî mezin hevalên mirovî bi mirov re dikin...

* Profesorê bijarte li Zanîngeha Parîs-VIIIê û sekreterê giştî yê Komeleya Bîranînên Têkoşînan (Mémoire des luttes).

1 Laurent Jacque, "Anniversaire en demi-teinte pour l'euro (*Rojbûna Euroyê ya Xembar*)", *Le Monde diplomatique*, sibata 2009ê

2 Antoine Dumini û François Ruffin, "Enquête dans le temple de l'euro (*Lêkolîna di Perestgeha Euroyê de*)", *Le Monde diplomatique*, çirîya paşîn a 2011ê

3 Ev deq di prensîpê de bi tenê hivdeh dewletên endamên qada euroyê yên niha girêdide, ku wê ji deh endamên mayî yên Yekîtîya Ewropî yên dixwazin, zêde bibin. Ji ber vê yekê cihêtîya têgeha "peymana navhukûmetî" ya li Fransayê tê bi kar anîn, tê dest nîşan kirin, tevî ku hin sazîyên Yekîtîya Ewropî (Dîwana Edaletê, Komîsyon) û ECB ji bo pêkanîna biryarên wê tên bi kar anîn jî

4 "Un 'consensus de Berlin' imposé à l'Europe *('Konsensûseke Berlînê' ya li ser Ewropayê Ferzkirî)*", *Le Monde diplomatique*, kanûna 2010ê

5 Hevpeyvîna di *Le Monde*ê de weşandî, 13ê kanûna 2011ê

6 *The Wall Street Journal*, New York, 8ê kanûna 2011ê

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Kunên reş ên mafên mirovî yên navneteweyî

Anne-Cécile Robert

Tiştekî heta niha nehatiye dîtin, midaxeleya leşkerî ya li Lîbyayê her biberdewamî têkilîyên navneteweyî têk dibe. Midaxeleya ku bi biryara Konseya Ewlekarîyê ya rêkxistina Neteweyên Yekbûyî (NY) li ser navê *"berpirsiyarîya parastina gelan"* ku mirov jê bişik e, devê gelek welatan şewitand: Çîn, Rûsya her wiha Swêd û Almanya hizir dikin ku Fransa û Brîtanyayê xwest bi zorê hin tiştan biguherin. Di rewşeke wiha nelibar de, pirtûka bi perspektîfên nûjen a fîlozof û hiqûqnasê kanadî Jean-Baptiste Jeangène Vimer derket. (1)

Nivîskarê ku bi pirsa edalet û aştîyê mijûl dibe, di pirtûka xwe de pirsa *"dudilîya navberkarîyê"* minaqeşe dike: Di 1992yê de balyozekî rojavayî ji xwe re wiha dibêje; *"Ez ê çawa bikaribim bi Slobodan Milosevic re him çayekê vexwim, him pê re hisabê xwe bi awayekî aştîyane bibînim û di heman demê de jî, wî weke tawanbarê şerî mehkûm bikim?"* Vimer vê yekê wiha rave dike: Li gor wî, daxwaza ji hev cudakirina hiqûq û siyasetê di van odeyên girtî de û li çareserîyên rêkûpêk gerîyan tiştekî xeyalî ye. Ew dibêje, ji ber ku hikûmet û birêveber armanca wê ne, hiqûqa navneteweyî nikare ku ne siyasî be. Bi gotineke din, ew nikare bêyî hêza siyasî, ango dewletî tev bigere. Wê gavê mijar bêtir sînorên dîyarkirî yên tevlîhevîyan in ku bivênevê li pêşîya mirov in. Li gor Vimer *"Bi hemî misogerîyên mimkun (...), mehkemeyeke neserbixwe û likar çêtir e ji mehkemeyeke xwedêgiravî serbixwe lê nikare biryarên xwe cîbicî bike"*.

Ji alîyê din ve, Konseya Ewlekarîyê – ku dikare serî li Mehkemeya Cezayî ya Navneteweyî (MCN) bide û herwiha dozên ku ew li wan dinêre jî bide rawestandin– pirrengîyekê îfade dike ku ew jî ileh nabe sedemê krîzekê. Di 2010ê de, tehdîda wezîfedarkirina MCNê ji alîyê vî miqamî ve, her bi vî awayî banga kîna nijadî ya ku ji alîyê radyoya gişti ya Peravên Îvorîyê ve dihate belav kirin, çibigre wê gavê rawestand.

Vimer pişgirîya prensîpa "serwerîya bisînor" dike; ya ku hîn di dema sekreterê gişti yê NYê (UN) de, ji alî Kofi Annan ve jî dihate parastin. Ev jî tê wateya ku, dewlet ji alîyekî ve îmtiyazên xwe diparêzin û ji alîyê din ve jî acîlîyeta zerûrî ya mafên mirovî, heta exlaqî qebûl dikin. Ma hikûmetan (di hezîrana 2010ê de) derfeta mahkemekirina "tawanên êrişkarîyê" ango bikaranîna legal a zorê ji alî yekê ji wan ve, ne sipart MCNê, û êdî ne bi tenê Konseya Ewlekarîyê? Helbet, ji ber ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Çîn, Rûsya û Îsraîl MCNê nas nakin, riya wan hîn dirêj e. *"Mehkeme, divê bi têkilîyên xwe yên bi sazîyên din ve, cîyê xwe di qada navneteweyî de çêke. Ji bo vê jî pratîkeke bi salan pêwîst e"*.

Lê ev helwêsta pragmatîk ravekirina pêşnîyaza ji bo bilezxistina pêvajoyê li derve nahêle. Ya ku ji bo baclêkirina miameleyên dravî û kiryara hevwelatîyî (Attac) hiqûqnasên Rêkxistinê ji bo wê têdikoşin ev e. (2) Di nav pêşnîyazên wan ên bêjimar de vegerîyana welêt a sazîyên dravî yên navneteweyî (IFI) yên di himêza RNY de jî hene. Banka Cîhanî û Fona Dravî ya Navneteweyî (IMF) yên ku di 1944ê de hatine damezirandin birastî jî otonom bûne. Heke em bên ser Rêkxistina Cîhanî ya Bazirganîyê (OMC), bi lez û bez li derveyî şertê San Fransîskoyê yê 1993yê hate hiştin. Lê, heke mirov wan bike sazîyên NY, IFI divê rêza Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovî ya 1948ê û Peymana Navneteweyî ya der barê Mafên Aborî, Civakî û Çandî ya 1976ê bigirin.

Bêgûman, ji bo ev kar hemî pêk bên divê NY jî karibe bi hemî berpirsiyarîyên xwe ve rabe. Ji bo vê jî divê ew ne bi tenê derfetên madî û diravî bi dest bixe, lê herwiha jî xwe nû bike. Burokrasî û jargona pir wê ji berpirsiyarîyên wê yên li hember gelan bi dûr dixe. Tiştê ku "Rojnivîsên li ser NYê" yên hunermend Nicolas-Emilien Rozeau, bi helwêsteke pêkenî vedibêjin jî ev in. Ew kurtenivîsên wî berhev dikin, carinan hinekî bi awayekî bet, lê pir zindî, ku ew wan di çapemenîya navxwe ya NY de çap dike. (3) Bi zimanekî din, Roberto Garcia Saez bîranînên xwe yên milîtantîya rêkxistinî yên dema ku bi ajansên navneteweyî re dixebitî bi awayekî romantîk dinivîse. (4) Mirov di van çîrokan de jîyana carinan zor a karmendên navneteweyî ku hewl didin roj bi rojê îdealên NY pêk bînin, dibîne.

1 Jean-Baptiste Jeangène Vimer, *Pas de paix sans justice? Le dilemme de la paix et de la justice en sortie de conflit armé / Aştî bê edaletê bicih tê? Pişti şerê çekdarî dudilîya aştî û edaletê*, Presses universitaires de Sciences Po, Parîs, 2011

2 Collectif, *Une autre ONU pour un autre monde* / Kolektîf, *NYyek din ji bo dinyayeke din*, Attac, Tribord, Bruksel, 2010

3 Nicolas-Emilien Rozeau, *Chroniques onusiennes et autres aventures / Rojnivîsên li ser NYê û serpêhatîyên din*, Les Deux encres, Le Puy-Saint-Bonnet, 2011

4 Roberto Garcia Saez, *ONU soit qui mal y pense / NY be kî lê xirab difikire*, 2011, Editions Les Etoiles, Enghien-les-bains, 2011

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr



Mehmet Latif Saglam: **Rêza batirsokan**, Li ser tuwalê boyaxa rûnî, 80 x 120 cm

Li Bakurê Îrlandayê şidet, xiyanet û sosyalîzm

Michel Savaric *

Di nav endamên kevin ên *Artêşa Komarxwaz a Îrlandayê* (IRA) de, hin endam li gor yên din "serkevtîtir" in. Mînak, **M. Martin McGuinness** ku di navbera 1979 û 1982yê de şefê birêveberîya rêxistinê bû, terfî kir ji bo payeya alîkarê serokwezîrê wan sazîyên ku berê wî dixwest hilweşîne. Yên din ku kêmtir serkevtî bûn, ji kamerayan dûr, carinan diaxivîn. Bi vê kirina xwe, wan stratejî û alozîyên di hundirê IRAyê de ku di 2005ê de çek danîn, ronî kirin.

Gerald (Gerry) Bradley di 27-11-2010ê de xwe kuşt. Wî hê nû îfadeyek weşandibû –ji hêla rêveberîya **Sinn Féin** (şaxê polîtîk ya IRAyê) ve hat rexne kirin- ku tê de behsa sih salên xwe yên di nav rêxistinê de dike. Ew dijberîya xwe ya li dijî wê stratejîyê eşkere dike ku dê bi ***Peymana Înîya Pîroz*** a sala 1998ê bi encam bibûya. Ev teksta ku di navbera partîyên polîtîk ên Bakûrê Îrlandayê, London û Dublînê de hatiye îmze kirin, di navbera yekîtîgiran (partîzanên dewamkirina yekîtîya bi Brîtanyaya Mezin re) û nasyonalîstan (yên ku daxwaza Îrlandayeke yekbûyî û serbixwe dikin) de riya sîstemeke parvekirina hêzan vekir. Li gor **Bradley**î, ev teslîmîyetek bû. (1) Alternatîva ku diparast? Heta ku mimkun e zêde kuştina leşker û polîsan, ji bo hilweşîna aborîya cihî bicihkirina bombeyan û îngîlîzan bike der.

Brendan Hughes li Belfastê di nav IRAyê de fermandar bû. Çîroka wî di berhemeke **Edmund Moloney**î yê rojnamevan de hat weşandin, beşa yekemîn a rêza hevpeyvînan e ku bi komarxwazên kevin (ku bi bikaranîna zorê xwe ji nasyonalîstan cihê dikin) û dilxwazên qralî (loyalîst -dijberên wan, ên ku bi qasî wan şidetparêz in) re hatine kirin. Di 1980yê de, **Hughes** ê ku yekemîn greva birçîbûnê ya gişti li girtîgeha Mazeyê bi rê ve bir, grev bi dawî anî: Wî soz dabû ku dê nehêle girtîyê yekemîn ê bikeve komayê, bimire. Piştî salekê, di heman girtîgehê de, **Robert** (Bobby) **Sands** di greva birçîbûnê de piştî şêst û pênc rojan jîyana xwe ji dest da. Di Sibata 2008ê de, di dawîya jîyana xwe de, **Hughes** li nerazîbûna xwe ya li hember birêveçûna rewş û bûyeran mikur tê. Di heman demê de xiyaneta bi fikrên xwe re eşkere dike. Çîroka ew dibêje pişta **Gerald** (Gerry) **Adams**, serokê Sinn Féinê dişikîne, ku pê wî elaqedarî kuştinên faîlnedîyar yên cur be cur, nîşan dide. Adams her tim ev înkar kir, Sinn Féin jî îdîa dike ku Huges "êdî serê xwe xwarîye".

M. Tommy McKearneyî ku ji nifşekî dirêj a komarxwazan tê, di sala 1970yê de di kontiya Tyrone'ê de şefê IRAyê bû, li Mazeyê ew jî beşdarî greva birçîbûnê ya yekemîn bû. Berhema wî piştgirîya teza klasîk a komarxwazên îrlandayî dike: Serhildana çekdarî xwe bi xwezaya zordest a dewletê û zordarîya kolonyal rewa dike. (3) Lê belê, bêyî destekê bide stratejîya Sinn Féinê ya bi rêveberîya Adams û McGuinness (terkkirina şerê çekdarî da ku li nav taxên katolîkan xurttir bi cih bibin) ew rewabûna guherînên destûrî û înstîtusyonel qebûl dike ku ji mohrkirina Peymana Înîya Pîroz û vir ve li Komara Îrlandayê hatine pêk anîn. Ew "Romantîzm"a hê jî "komarxwazên muxalif" (partîzanên "xeteke hişk") vedijîne, red dike û ji sazîyîbûna sekterîzma pêvajoya aştîyê ew derxistî holê jî poşman e. Nêrîna wî: Dîyarkirina rêyeke sosyalîst a ku wê pirsa parçekirina Îrlandayê deyne alîyekî û destûrê bide sinifên karker ên katolîk û protestan bibin yek. Piştî ku tevlî nav refên wê bû bi çil salan, McKearney kokên polîtîk ên ÎRAyê ji bîr nekirin: Li gor wî, şer berdewam e, êdî bi awayekî cudatir were meşandin jî.

* Nivîskar, Rojnamevan

1 Gerry Bradley û Brian Feeney, *Insider: Gerry Bradley's Life in the IRA (Yên ji hundir: Jîyana Gerry Bradleyî ya di nav refên ÎRAyê de)*, Weşanxaneya O'Brien, Dublin, 2009

2 Edmund Moloney, *Voices From the Grave: Two Men's War in Ireland (Dengên ji Gorê: Li Îrlandayê Şerê Du Zilaman)*, Faber and Faber, London, 2010. Nivîskarî soz da kesên bi wan re hevpeyvîn kirî, ku berîya mirina wan hevpeyvînên bi wan re neweşîne

3 Tommy McKearney, *The Provisional IRA: From Insurrection to Parliament* (IRAya Demî: Ji Serîhildanê heya Parlamentoyê), Weşanxaneya Pluto, London, 2011

Wergera ji fransî: Sevda Orak

www.kurdishstudies.net

Ji bo ku xirabûna rewşa aborî û malî derbibire ji sala 2008ê ve bê navber fikra krîzê bi awayekî sergirtî ji bo terîfkirina bêserûberîyeke demî ya sîstemeke xwegirtî, tê bi kar anîn. Li gor vê fikrê sererastkirina zêdegavîyan wê têrê bike da ku krîz bê çareser kirin. Baş e, heke kapîtalîzma demokratîk a li welatên rojava piştî şerê duyemîn ê cîhanê hat bi cih kirin, bêahengîyeke nayê çareserkirin dihewîne, hingê wê çi bibe?

Kokên siyasî yên têkçûna malî

Krîza sala 2008ê berîya çil salan dest pê kiribû

Wolfgang Streeck *

Wekî ku em niha her roj di rojnameyan de dixwînin, 'bazaran' dest bi ferzkirina rêyên nedîtî kir, ku dikare weha were guman kirin ku dewletên desthilatdar û demokratîk dibe ku hîna jî ji bo hevwelatîyên xwe bi cih tînin û divê ku wan red bikin û pêk neynin. Wekî encama vê yekê jî, hevwelatî hikûmetên xwe êdî wekî dezgehên *xwe* nabînin, lê belê di şûna wê de wekî dezgehên welatên din, yan jî yên rêxistinên navneteweyî yên wekî IMF, yan jî Yekîtîya Ewropî dibînin, ku ji netewe-dewletên kelepûrî bêhtir, ji ber fişara hilbijartinan tên piçûk xistin. Da ku, wekî ku ji alîyê bazar û dezgehên navneteweyî ve hatiye dîyar kirin, bi awayekî 'berpirsîyar' tev bigerin, hikûmetên neteweyî bi buhayê paşguhkirina daxwazên hevwelatîyên xwe, dê mecbûr bimînin ku tedbîrên dijwartir yên teserufê bisepînin.

Gelo ev serêşîya me ya îro, teşqeleyeke yekcarî ye ji bo şert û mercên seqemgîrîyê yên bingehîn? Dibe ku na: 'Krîza Mezin' (1) û wekî encama wê darayîya giştî, ku dikir hilweşîyaya, dikarin wekî derbirîna tengezarîya sereke ya teşedana aborî-siyasî ya civakên pêşketî yên kapîtalîst were fam kirin. Ev tengezarî nebûna mêzînê û seqemnegîrîyê di şûna awarteyê de dike qaîde, ku di dîrokê de li dû tengezarîyên nav pergala sosyo-ekonomîk rû dabûn. Bi kurtasî, krîzek dikare bi tenê di warê transformasyona mîratî, lêkdanî û berdewam a veguherîna civakî de were fam kirin, ku em jê re 'kapîtalîzma demokratîk' dibêjin.

Ji dawîya salên 1960ê ve ji bo çareserkirina nakokîya di navbera demokrasîya siyasî û kapîtalîzma bazarê de li ser hev sê çareserî hatin ceribandin. Ya pêşî enflasyon bû, ya diduyê deynê dewletê bû, ya sisiyê jî deynê taybet bû. Birêkûpêkkirineke taybet a têkilîyên di navbera hêzên aborî, cihana siyasî û hêzên civakî de li her yekê ji van hewldanan tê. Lê belê yekê li pey ya din, van eyarkirinan hemûyan rê li ber krîz û qeyranê vekir û pêre jî derbasbûna dewra piştî xwe bileztir kirin. Tofana malî ya sala 2008ê nîşana dawîya dewra sêyem û desthilatdarbûna muhtemel a pergaleke nû ye ku hê cewher û naveroka wê dîyar û misoger nîne.

Nakokîya ji nû ve dabeşkirinê

Kapîtalîzma demokratîk a piştî şer krîza xwe ya pêşîn di deh salên piştî dawîya salên 1960ê de jîya, dema ku li seranserî cihana rojava enflasyon pir bi lez bilind bû. Sedema vê yekê berjêrçûna mezinbûna aborî bû, ku êdî nikarîbû bihevkirina nav sermîyan û kedê berdewam bike, ku wekî encama xerapker a Şerê Cihanê yê Duyemîn di nav xwe de ketibûn îxtîlafekê. Ji bo vê bihevkirinê divîyabû, ku çîna karker a rêxistî bazarên kapîtalîst û mafên mulkîyetê wekî berdêla demokrasîya siyasî bipejirînin, ku bi vî awayî wan dikaribû ewlekarîya sosyal û standarteke jîyanê bi dest bikin, ku bi awayekî bi rêk û pêk bilind dibû. Mezinbûna bênavber a zêdeyî bîst salan bû sedem ku têgihiştina pêşketineke domdar a aborî wekî mafekî demokratîk a hevwelatîyan peyda bibe. Ev têgihiştin herweha derbasî bendewarîyên siyasî jî bûn û hikûmetan xwe mecbûr hîs kir ku wan bendewarîyan bi cih bînin: Berfirehtirkirina dewleta refahê, mafê muzakereyên hevbeş ên karkeran û garantîyeke siyasî ji bo îstîxdameke tije-demî. Dewletan garantî da ku rêgezên aborîyê yên Keynesîyan bi berfirehî bi kar bînin.

Piştî ku di dawîya salên 1960ê de mezinbûn çend qat zêde bû, ev bihevkirin êdî zehmet bû ku were berdewam kirin. Mîlîtanîya kedkaran li seranserî cihanê derket holê, ku wan doza mafê bilindkirina standarta jîyanê dikir û nedixwest li jêr tirsa bêkarîyê bijîn.

Di salên li dû de, li seranserî cihana rojava, hikûmet bi wê pirsê re rû bi rû man, ka wan çawa dikarî bi sendîkayan bidin kirin ku daxwazên endamên xwe yên ji bo heqdestan nermtir bikin, bêyî ku soza keynesîyan a îstîxdama tije-demî bişkînin.

Li wan welatan, ku avabûna dezgehî ya pergala muzakereyên hevbeş nedihişt 'peymanên civakî' yên muzakereyên sêalî, piranîya hikûmetan di dumahîya salên 1970ê de pê îqna bûn, ku heger bihêlin ku bêkarî bilind bibe, da ku bilindbûna reel a heqdestan pêk were, ji bo ku ew bikaribin zindî bimînin pir bi rîsk bû, herweha ji bo seqemgîrîya demokrasîya kapîtalîst.

Tenha rêya çareserîyê, polîtîkayeke diravî bû, ku dikare hesaban li hev derxe. Divîya bû ku ev polîtîka bi berdêla zêdebûna rêjeya enflasyonê, ku bi demê re leztir bûbû, bihêle ku muzakereyên hevbeş û îstîxdama tije-demî bi hev re berdewam bikin.

Di merheleyên destpêkê de, enflasyon ji bo karkeran pirsgirêkeke mezin nebû, ku ji alîyê sendîkayên bihêz ve bihata dîyar kirin, ku di fîlîyatê de jî di warê siyasî de jî hêzdar bû ku bikaribe heqdestan bi endeks bike. Enflasyon di serî de mesrefa kredîtor û xwedîyên hebûnên darayî û ya koman bû, ku di prensîpê de ne ya karkeran bû, yan jî em bibêjin di salên 1960ê û 1970yê de ne barê wan bû. Bi vî awayî enflasyon dikare wekî şewqdana diravî ya pevçûna parvekirina navbera karkeran, ku doza ewlekarîya îstîxdamê û pareke zêdetir ji derameda welêt dikin, û ya çîna kapîtalîst e, ku mebesta wan ji vegera sermîyana xwe wergirtina sûda herî zêde ye. Ji ber ku her du alî li gor fikrên xwe tev digerîyan, ku li gor her yek ji wan rast bûn, lê belê bi hev nedikirin. Yekî mafên hewvelatîyan bin xêz dikir û yê din jî mafên mulkîyetê û hêzên bazarî. Enflasyon herweha dikare wekî anomîya (bêhêvîbûnê) nav civakekê were bi nav kirin, ku ji ber sedemên strukturî nikare li ser krîtera edaleta civakî hevbîr be.

Di salên hema piştî şer de, mezinbûna aborî rê lê vekiribû ku hikûmetan bi têgehên edaleta civakî, ku bi xizmet û malên lêzêde lihev nedikirin, têbikoşin, ku bi vî awayî xusûmeta nav çînan berteref bikin. Wê demê hikûmetan divîyabû ku hikûmet vê yekê bi pereyê taqwîye pêk bînin, lê belê ev pere di aborîya reel de hîna nehatibû peyde kirin. Bi vê yekê re mebest ew bû ku çavkanîyên dahatû bikşînin nav sarfîyat û parvekirina heyî. Ev modêla pasîfîzekirina pevçûnê, ku di destpêkê de bi bandor bû, nedikarî heta dawîyê berdewam bike. Talîyê, bi bangeke gavavêtinê ya ji sermîyandaran, ku her ku diçû gumanbar dibûn, enflasyon bû sedema bêkarî û cezakirina wan karkeran, ku di destpêkê de berjewendîyên wan dihatin parastin. Qet nebe, di vê qonaxê de hikûmetên li jêr kapîtalîzma demokratîk bi fişarekê re rû bi rû man ku dawî li lihevhatinên parvekirina hevkêş a heqdestan bînin û dîsîplîna diravî dîsa pêk bînin.

Fînansekirina aştîya civakî

Enflasyon di sala 1979ê de ket bin kontrolê, piştî ku **Paul Volcker**, ku ji alîyê serok **Carter** ve wekî serokê Bankaya Federal a Rezervan nû hatibû tayîn kirin, rêjeyên faîzê rakirin bilindîyeke nedîtî. Ev yek bû sedem ku bêkarî hilkişe wan radeyên bilind, ku ji Krîza Mezin û pê ve nehatibû dîtin. Ev 'darbeya' **Volcker,** ku di 1984ê de hat pesend kirin, piştî serok **Reagan**, ku gotibû ku ji encamên polîtîkayên agresîf ên kêmkirina enflasyonê yên Volcker fikar dikirin, careke din hat hilbijartin. **Thatcher,** ku di şopa amerîkîyan de diçû, di 1983ê de ji bo cara duyemîn hat hilbijartin, herçend bêkarîyeke bilind hebû û bêsanayîkirina bi lez, digel gelek tiştên din, bûbû sedema polîtîkayên sînordarkirinê ya diravî. Him Amerîkayê û him jî Brîtanyayê, kêmkirina enflasyonê digel xwe êrişên biryardar ên li dij sendîkayan ên ji alîyê hikûmet û karsazan bi xwe re anîn. Di salên li dû de jî, li seranserî cîhana kapîtalîst rêjeyên enflasyonê bi domdarî kêm man, lê belê bêkarî kêm zêde bi rêkûpêk bilind bû. Bi awayekî paralel sendîkayîbûn jî hema li her der kêm bû û grev ewqas kêm bûn, ku hin welat xwe nebetilandin ku îstatîstîkên grevan bigirin.

Serdema neoliberal dema ku hikûmetên Anglo-Amerîkî, ku bi hev re tev digerîyan, şarezabûna demokrasîya kapîtalîst a piştî şer bi dest xist. Li gor wê bêkarî ne bi tenê ji bo hikûmetên heyî, herweha ji bo demokrasîya kapîtalîst bixwe jî dê li pêşîya piştgirîya siyasî bibe asteng. Ceribandinên li ser dengdaran, ku ji alîyê **Reagan** û **Thatcher** hatin pêk anîn, li seranserî cihanê ji alîyên siyasetsazan ve ji nêz ve hatin şopandin. Lê belê, yên ku hêvî dikir ku dawîlêhatina enflasyonê dê dawî li alozîya aborî jî bîne, pir neçû bi hêvîşikestinê re rû bi rû man. Çawa ku enflasyon paş de çû, vê carê jî deynên giştî (kamu) zêde bûn. Zêdebûna deynên giştî yên salên 1980yê xwedî gelek sedeman bû. Mezinbûna çilmisî bû sedem ku mukellefên bacê ji her demê bêhtir ji pergala bacê nerazî bin û bi dawîlêhatina enflasyonê re zêdebûna otomatîk a bacan, ku jê re *'bracket creep'* (şiqitîna qedemeyan) tê gotin jî bi dawî bû. Heman tişt ji bo devaluasyona domdar a deynên giştî jî derbas bû, qîmetên pereyên neteweyî hatin daxistin, pêvajoyek ku di serî de mezinbûna aborî temam dikir, lê belê paşê jê re alternatîv hat dîtin, deynên serhev ên welatekî ji kişandin asta derameda asayî ya welêt. Di warê lêçûnan de, ji ber seqemgîrîya diravî bêkarî zêde bû û ev yek jî rê li zêdebûna lêçûnên di warê alîkarîya sosyal de vekir. Wekî din, di salên 1970yê de wekî navbeynkarîya sendîkayan a ji bo heqdestan gelek dezgehên civakî hatin damezirandin -wekî ku weha bû, heqdestên derenghiştî yên ji serdema neo-şirketparêz- paşê deyn mezin bûn û dema wan hat û talîyê ji bo darayîya giştî bû barekî mezin.

Ji ber ku enflasyon êdî tunebû ku valahîya navbera daxwazên welatîyan û yên 'bazaran' dagire, barê ewlekirina aştîya civakî ket xeterê. Deynên giştî kom bûn, ji bo demekê, bûn wekî mudaûleke guncan a fonksîyonel a enflasyonê. Di warê enflasyonê de jî, deynên giştî ev yek guncan kir ku çavkanîyên ku hîna nehatibûn hilberîn, ji bo pevçûna parvekirina deramedê de werin bi kar anîn. Bi vî awayî hikûmetan ne bitenê dest avêt çavkanîyên di dest de, herweha çavkanîyên dahatûyê jî.

Piştî ku têkoşîna navbera bazar û parvekirina civakî ji qada bazara kedê derbasî qada siyasî bû, fişara hilbijartinan ketin şûna daxwazên sendîkayan. Di şûna nepixandina pereyên xwe, hikûmetan da ku berjewendî û xizmetên hevwelatîyan bi cih bînin, her ku çû zêdetir deyn stendin. Ji alîyê din jî divîya serî bi wan daxwazan derxin ku digot deramed hukmên bazaran nîşan bide û bi vî awayî alîkarî bike ku çavkanîyên hilberîner bi sûda herî zêde werin bi kar anîn. Enflasyona nizim, di vî warî de alîkar bû, ku kredîtor hatin temîn kirin ku bonoyên hikûmetê di demeke dirêj de dê qîmeta wan biparêze. Bi vî awayî piştî ku serê enflasyonê hat eciqandin, faîzên nizim dest pê kir.

Ji deynê dewletê ber bi deynê şexsî ve

Lê belê wekî enflasyonê, kombûna deynê giştî nikare heta dawîyê here. Aborîzanan demeke dirêj di warê lihevderneketina lêçûnên giştî, ku perexistinên taybet li derve dihişt, hişyarî dan. Vê yekê rê li faîzên bilind û mezinbûna piçûk vedikir, lê belê wan tu caran nikaribû bigotana ka benda krîtîk li kû ye. Di pratîkê de, derket holê ku, qet nebe ji bo demekê, bi rakirina çavdêrîya li ser bazaran, mumkin e ku rêjeyên faîzan nizim bigirin. Lê belê bi dûrxistina sendîkayan a ji kargehan enflasyon her li jêr çavdêrîyê ma. Dîsa jî, nemaze li Dewletên Yekgirtî, bi rêjeya wê ya gelek kêm a rezervan, pir neçû wan dest bi firotina bonoyên hikûmetê kir, lê belê ne bi tenê bi hevwelatîyên xwe herweha muteşebisên bîyanî, ku di nav wan de fonên dewlemendîyê yên desthilatdarên cur bi cur jî hebûn. Bi ser de jî, wekî ku barê deynan jî zêde bû, pareke mezin a lêçûnên giştî divîyabû ji bo deynan bihataya terxan kirin, herçend rêjeyên faîzê li jêrê diman jî. Ji hemûyan pêştir, divîya xalek hebûya, ku ne mumkin bû ku ji berê de were zanîn, ku kredîtorên nav welêt û derveyî welêt ji bo paş de stendina pereyên xwe dê biketana fikarê. Wê demê, ji bazarên fînansê fişar bihataya ku budçeyên giştî werin konsolîde kirin û dîsîplîna malî were dagerîn.

Hilbijartinên serokatîyê yên 1992yê yên li Dewletên Yekgirtî di sîya du lihevderneketinên darayî re derbas bûn: Ya hikûmeta federal û ya hemû welêt, di warê bazirganîya derveyî welêt de. Serkeftina **Bill Clinton**, ku bi ser 'cot-lihevderneketinan' kampanya dikir, ji bo konsolîdekirina darayî li seranserî cihanê dest bi hewldanan kirin. Rêxistinên navneteweyî yên wekî OECD û IMF, ku li jêr serokatîya Amerîkayê bûn, bi awayekî agresîf piştgirî da van hewldanan. (2) Piştî ku demokratan di sala 1994ê de di hilbijartinên navdemî de piranîya xwe ya li Kongreyê ji dest da, **Clinton** berê xwe da polîtîkayeke hişk a teserufên lêçûnên giştî û polîtîkayên sosyal guhertin. Bi qewla wî ve dawî li 'refaha ku em dizanin' hat. Ji 1998ê heta 2000ê, budçeya hikûmeta Dewletên Yekgirtî piştî dehan salan cara pêşîn li hev derket û pereyê zêde jî mabû.

Lê belê, îdareya **Clinton** bi awayekî rêyek dît ku aborîya siyasî ya demokratîk-kapîtalîst aşt bike, bêyî ku serî li çavkanîyên aborî yên lê zêde bide, lê dîsa jî divê ku yên nû pêk bîne. Stratejîya Clinton a serîpêderxistina

www.lorsivolturon.org

pevçûnên civakî piranî li ser esasê serbest berdana sektora darayî bû, ku ji zû de di dema **Reagan** de dest pê kiribû û di dema Clinton de ji berê jî bêhtir pêş ketibû. Newekhevîya deramedê, ku pir bilez zêde dibû, ku ji ber bê sendîkayî bûn û teserufên tûj ên lêçûnên sosyal û herweha kêmkirina daxwazên serhev ên konsolîdekirina malî derketibû holê bi derfetên nedîtî yên ji bo hevwelatî û fîrmayên deyndar hat hevkêşî kirin. (3) Têgeha munasib a 'Keynesîyanîzma arizîkirî' ji bo nîşandana bandora di şûna deynên gîştî de bikaranîna deynên xusûsî hatibû gotin. Di şûna wê yekê de ku dewlet deyn bistîne da ku derfeta wekhev a xanîyan fînanse bike, yan jî ferasetên karkirinê ku dikarin di bazarê de cih bibînin, pêk bîne, îcar hevwelatîyên şexsî, di rejîmeke gelek bolvir a deyndanê de, dikarîn û carna jî naçar diman ku li ser rîska xwe bixwe deyn bikin û pê debara perwerdehîya xwe, yan jî taxên xwe yên şerpeze avadan bikin. (4)

Gelekan ji polîtîkaya Clinton a konsolîdekirina malî û zindîkirina aborî ya bi rêya serbestberdana malî sûd wergirtin. Dewlemend ji bacên bilind xelas bûn. Di nav wan de ên ku şareza bûn, berjewendîyên xwe kişandin sektora fînansê û ji 'xizmetên fînans' yên komplîke gelek xêr kirin, ku êdî ew xwedî lîsanseke bêsînor bûn ku wan xizmetan bifiroşin. Xizanan jî jê sûd wergirt, qet nebe hin ji wan û ji bo demekê. ***Mortgage*** bi faîza bilind gelek belav bû, lê belê talîyê pûç derket, ji bo polîtîkayeke sosyal ku hevdem dihat berdan û herweha ji bo zêdekirina heqdestan, ku êdî di bazareke kedê ya 'tewanbarkirî' de ji rêjeya jêrîntir nikaribû berjêrtir here. Nemaze ji bo amerîkîyên bi eslê xwe afrîkî xwedîbûna malekê ne bitenê pêkanîna 'xewna amerîkî' bû, lê belê herweha ji bo teqawidên pîr hewcedarîyek bû, ku piranîya wan di bazara kedê de nikaribûn têra xwe qezenc bikin û tu sedem tunebû ku ew ji dewletê bipên, ku hertim qala tasarûfên mayînde dikir.

Bi vî awayî, ji serdema deynên gîştî cudatir, ku tê de çavkanîyên dahatû ji bo hewcedarîya dema niha ji alîyê hikûmetan ve dihatin bi deyn stendin, îcar çavkanîyên weha êdî ji bo firotinê di destê gelek şexsan de bûn. Xelk jî di bazara fînansî ya serbest de, bi soza dana pareke gelek mezin a deramedê xwe yên gumankirî bi kredîtoran deyn distendin, ku kredîtor jî dikarîn hema hêza kirinê bidin wan, ku bikaribin her tiştê ku dilê wan dixwest, bikirin.

Bi vî awayî berdêla serbestîya darayî konsolîdekirina malî û teserufên gîştî bûn. Deynên şexsî ketin şûna deynên gîştî û daxwazên takekesî, ku di sanayîyekê de, ku bi lez mezin dibe û gelek pere dianî, ji bo mûçeyên bilind hatibûn pêk anîn, ketin şûna daxwazên hevpar ên dewletî yên ji bo piştgirîdana îstîxdam û sûdwergirtinê yên avadanî û sektorên din. Ev dînamîk piştî 2001ê dema ku Rezervên Federal rêjeyên kêm ên faîzan guherandin da ku pêşî li krîzeke aborî bigire û bêkarîyê bikişîne asta xwestî, leztir bûn.

Bi ser sûdên negumankirî yên sektora fînansê de, keynesîyanîzma arizîkirî rê li aborîyekê vekir, ku mezintir dibû, ku xelk bûbûn heyranên vê aborîyê, nemaze jî tevgerên kedê yên ewropî. Bi rastî, polîtîkaya **Alan Greenspan**, ku digot pereyê hêsan piştgirîya deyndarbûna bi lez a civaka amerîkî dike ji alîyê serokên sendîkayên ewropî ve hat destek kirin, ku wan serokan bi heyecan bin xêz dikir, ku ji Bankaya Navendî ya Ewropî cudatir, Rezervên Federal [ên Amerîkî] li gor qanûnan di bin wî barî de ye, ku ne bi tenê seqemgîrîya dravî pêk bîne lê belê herweha bi rêjeyeke bilind îstîxdamê pêk bîne. Helbet, ev hemû bi dawî hatin, dema di sala 2008ê de ku pîramîda navneteweyî ya kredîyan rûxa, ku refaha dawîya salên 1990ê û destpêka salên 2000ê lê hatibû spartin.

Bi hilweşîna keynesîyanîzma arizîkirî ya di 2008ê de, krîza piştî şer a kapîtalîzma demokratîk ket merheleya xwe ya çaremîn an ku merheleya xwe ya dawî ya tije serdema enflasyonê, lihevderneketina budçeyên gîştî û deyndarîya xusûsî. Piştî ku pergala navneteweyî ya darayî dest bi jihevketinê kir, netewe-dewletan hewl da ku bi rêya dewletîkirina deynên pîrbûyî yên ji wekî tezmînata konsolîdekirina malî pêewlebûna aborî dubare saz bikin. Mezinbûna malî, ku ji bo pêşîlêgirtina hilweşîna 'aborîya reel' hewce bû, bû sedema zêdebûneke bilind a lihevderneketina darayîya gîştî û deynên gîştî -hêjayî gotinê ye ku ev pêşveçûn bi gîştî ne ji ber xerckirina zêde ya serhênik a siyasetmedarên oportunîst yan jî hesabên şaş ên dezgehên dewletî bûn, ku bi teorîyên 'tercîha gîştî' dihat dîyar kirin û lîteratura fireh a aborîya dezgehî ve di salên 1990ê de li gor kehanetên dezgehên navneteweyî hatibû peyda kirin, ku di wan de Bankaya Cihanê û IMF jî hebûn.

Piştî 2008ê, zêdebûna meblaxa deynên gîştî hemû tiştên ku konsolîdekirina malî di çend deh salên buhurî de pêk anîbûn xerab kir. Ya piştre qewimî tê zanîn: Ji 2008ê û di 3 salên li dû wê de, pevçûna parvekirina deramedê li jêr kapîtalîzma demokratîk veguherî zorbirina muteşebisên darayîya gerdûnî û netewe dewletên desthilatdar. (5) Di dema bihurî de karkeran bi karsazan re, hevwelatîyan bi wezîrên darayî re û deyndarên şexsî bi bankayên xusûsî re têdikoşîyan, lê belê niha dezgehên darayî bi dewletan re gulaş digirin, ku wan vê dema dawîyê şantaj li dewletan dikin ku dewletan ji krîzê rizgar bikin. Lê belê teşegirtina girîng a hêz û berjewendîyan gelek jê tevlihevtir e û hîna jî li benda lêgerîneke sîstematîke.

Wekî mînak, ji krîzê û pê ve bazarên darayî bi rêjeyên cur bi cur ên faîzê re ji dewletan re hesabên cuda derxistin. Bi vî awayî wan fişara xwe ya li ser dewletan jî cudatir kir, da ku perebirînên/teserufên nedîtî bi hevwelatîyên wan welatan bidin qebûl kirin -dîsa di prensîpê de di esasê de bi mantiqa neguhertî ya parvekirina bazaran. Heger îro li meblaxa deynên dewletan were nihertin, zêdebûnên piçûk ên di rêjeya faîzên li ser bonoyên dewletê de dikare rê li karesatekê veke. Hevdem, divê banka xwe jê ragirin ku zorê bidin dewletan ku îflasa desthilatdarîyê ragihînin, ku ev yek heger fişara ji bazaran zêde zorê bide, her tim ji bo hikûmetan alternatîfek e. Ji ber vê yekê, divê dewletên din werin dîtin, ku dixwazin vê rîzîkoyê berteref bikin, da ku xwe ji bilindbûneke bi gîştî ya rêjeyên faîzê yên li ser bonoyên hikûmetan biparêzin. Temeruda pêşî dikare rê li vê yekê veke. Di heman demê de, bazarên darayî dikarin li benda sozdana têkoşîna li dij mudaxeleya siyasî bin, ku bi carekê ve û bi gîştî dîsîplîna bazaran dubare saz bikin û dawî li hewldanên siyasî bînin, ku wê dîsîplînê serûbino bikin. (6)

Têkçûna birêkûpêkkirinê

Di vê merheleyê de, aşkere ye ku îdarekirina siyasî ya kapîtalîzma demokratîk di van salên dawîyê de bi tûjî kêm bû, li hin welatan li gor wan ên din bêhtir, lê belê her weha bi gîştî di pergala aborîya siyasî ya gerdûnî ku dest pê dike. Wekî encam, xuya ye ku rîzîko mezintir dibe, him ji bo demokrasîyê û him jî ji bo aborîyê. Ji Krîza Mezin û pê ve siyasetsazan yan qet, yan jî gelek kêm bi nepenîyeke îroyîn re rû bi rû mabûn. Mînakek di nav gelekên din de ew e ku bazar ne bi tenê li benda konsolîdekirina darayî ne, lê belê hevdem li benda gumanên mezinbûna aborî ya dahatûyê ne. Ev her du çawa dikarin li hev bikin ne dîyar e. Herçend dema ku Îrlandayê soza kêmkirina tûj a lihevderneketinan da, prîma rîzîko ya li ser hikûmeta îrlandî ket jî, piştî çend hefteyan ew jî bilind bû ji ber ku, wekî ku tê îdia kirin, bernameya konsolîdekirina welêt ewqas hişk bû ku pê başbûna aborî ne mumkin bû.

Bi ser de jî, hevbîrîyeke berfireh heye ku dibêje nepoxa nû li derekî cîhanê mezin dibe, ku ji her demê bêhtir bi pereyê hêsan dinepixe. Mortgageyên bi faîza bilind êdî nikarin xwe wekî perexistinekê pêşkêş bikin, qet nebe, ne ji bo dema niha. Lê belê niha bazarên ji bo materyalên xav hene, yan jî aborîya nû ya înternetê. Tu tişt nikare pêşî li şirketên darayî bigire ku pereyê zêde, ku ji alîyê bankayên navendî ve tê terxan kirin, bi kar bînin. Ev yek niha wekî sektorekê xuya dike, ku him ji mişterîyên wan ên herî baş û her weha ji wan bixwe her ku diçe mezintir dibe. Jixwe, piştî reformên qanûnî yên di sektora darayî hatin kirin, hema bêjin di her alîyê de bi ser neketin, pêwîstîyên sermîyanê hinekî jê bilindtir bûn, ku dihat guman kirin û banka jî, da ku di 2008ê de têk biçin pir mezin bûn, hesab dikin ku di 2012 û 2013ê de jî weha bin. Ev yek wan bi heman fêrisa şantajkirina gîştî dihêle ku ew sê sal berê bi awayekî serkeftî encam dabûn. Lê belê niha xelaskirina kapîtalîzma şexsî ya li ser esasê modela 2008ê dibe ku ne mumkin be were dubare kirin, ji ber ku darayîya gîştî ji xwe gihîştin sînorên xwe yên dawîyê.

Dîsa jî di vê krîza niha de demokrasî jî bi qasî aborîyê li jêr rîskê ye, belkî jê bêhtir. Ne tenê 'entegrasyona sîstemê' ya civakên nûjen -ku ev yek ji bo birêveçûna bandorkar a aborîyên kapîtalîst e- bû seqemnegîr, lê belê 'entegrasyona wan a civakî' jî heye. (7) Bi hatina serdema teserufê re hêza netewe dewletan a navberkarîya navbera mafên hevwelatîyan û hewcedarîya koma sermîyanê bi xedar cî ket. Jixwe, bi berbendbûna gerdûnî, ku ji her demê bêhtir hişktir e, êdî nikare weha nîşan bide, ku tengezarîya navbera aborî û civakê; navbera kapîtalîzm û demokrasîyê, dikare nav komên siyasî yên neteweyî de werin çareser kirin. Îro tu hikûmet bêyî ku bala xwe ji nêz ve bide fişar û mukelefîyetên navneteweyî, welêt bi rê ve bibe, ku zordanên bazarên darayî ku ji dewletan dixwazin ku xelk fedakarîyê bike, jî tê de. Krîz û nakokîyên kapîtalîzma demokratîk di talîyê de bûn navneteweyî, ne bi tenê di nav dewletan de herweha di navbera dewletan de dilîzin. Lê belê bihevkirin û becayîş divê hîna jî werin lêkolîn.

Bi rastî, dema mirov birêveçûna krîza kapîtalîzma demokratîk a ji sala 1970yê û pê ve binihêre, tê dîtin ku di civakên pêşketî yên kapîtalîst de îmkaneke rasteqîn, dibe ku dembihurî be, ya çareserîya pevçûnên civakî hene. Vê carê, bi gîştî li gor berjewendîyên çîna dewlemend, ku ji xwe re kelehek peyda kiriye, ku di warê siyasî de nikare were têk birin, an ku sanayîya navneteweyî ya fînansê.

* Hevgerînendeyê Enstîtuya Lêkolînên Civakî, li Kölnê

1 Ji bo têgeha 'Great Recession' (Qeyrana Mezin), binihêrin Carmen Reinhart û Kenneth Rogoff, *This Time Is Different: Eight Centuries of Financial Folly*, (*Vê Neqlê Cuda ye: Heşt Sedsalên Ehmaqîya Darayî*) Princeton 2009

2 tevahîya tedbîrên rehetkirina budçeyê yên armanca wan başkirina tewazûna li derveyî faîzê (faîza deynan ne tê de, hatina salê wê kêmtir were xerc kirin)

3 Tevahîya taleba mal û xizmetan a di nav aborîyekê de

4 Bixwîne Gérard Duménil û Dominique Lévy, "Une trajectoire financière insoutenable (Rêyeke Malî ya Nabe ku Weha Dewam Bike)", *Le Monde diplomatique*, tebax 2008

5 Ji bo dewleteke ku deynên wê digihêje % 100ê Hilberîna Nesafî ya Neteweyî (HNN), zêdekirina rêjeya faîza divê bide deyndêrên xwe bi % 2ê wê lihevderneketina wê budçeya salane jî bi heman mîqdarê zêde bike. Di encamê de lihevderneketineke budçeyê ya bi qasî % 4ê HNNyê wê nîvî bi nîvî zêde bibe

6 Bixwîne Frédéric Lordon, "Sur le toboggan de la crise européenne (Li ser Qola Krîza Ewropî)", *Le Monde diplomatique*, kanûn 2011

7 Têgeh ji alîyê David Lockwood ve di pirtûka 'Social Integration and System Integration' (Entegrasyona Civakî û Entegrekirina Pergalê), de hat bi kar anîn, George Zollschan û Walter Hirsch, eds, *Explorations in Social Change (Lêgerîna di nav Guhertina Civakî de)*, Londra 1964

Wergera ji îngilizî: Celîl Kaya

Mehmet Latif Saglam: **Rêza batirsokan**, li ser tuwalê boyaxa rûnî, 35 x 50 cm

www.arsivakurdi.org

Barack Obamayê li hemberî bêkarîyê û ji ber deynê dewletê ji taqet ketî, dewra xwe ya pêşî bi awayekî lawazbûyî bi dawî tîne. Şansê muhafazekaran heye ku di hilbijartinên serokatîyê yên 2012ê de bi ser kevin, hewl didin namzedekî bawerî pê were peyda bikin. Lê belê ji mêj ve ji wan hat ku piştî hamleyeke xirab têkçûna îdeolojîk bidin ji bîr kirin ku ji bo wan krîza malî pêk tîne.

Patronên piçûk di xizmeta yên mezin de

Siyaseta rastgir a amerîkî çawa berê hêrsa gel guherand

Thomas Frank *

Namzetekî bi navê James Richard ("Rick") Perry, ewqasî bêkêr e ku navê wezaretên ew hez dike jê bibe, ji bîr dike. Yekî din Herman Cain e, yê ku weha xuya ye haya wî hîç ji stratejiya amerîkî ya li Lîbyayê nîne. (1) Namzetekî sêyemîn heye navê wî Newton Gingrich e, hîç dudilî nebû ku gelê Filistînê weke "*vedîtinekê*" bi nav bike. Partiya komarxwaz ji bo razî û qayîlkirina hilbijêrên xwe di lêgerîna xwe ya li namzetekî têra xwe otantîk de şanoyeke wisa dilîze, carinan dişibe xwekuştineke hêdîka.

Dîmena ku di dema lêgerîna namzedekî têra xwe 'otantîk' de, ji alîyê Partîya Komarxwaz ve hat nîşan dan, da ku girseya xwe memnûn bike, ji derve ve dişibe ehmaqîyê, yan jî wekî xwekujîya fîlmkêşîya hêdî xuya dike. Lê belê, berî ku em tarîfa wê bikin, divê em bînin bîra xwe ka muhafazakarîya amerîkî ji dijwarîya xwe ya herî dawî ya berî sê salan rizgar bû. Wê demê jî, tevger wekî ku li ber sikratê be xuya dikir, mirîyeke ji ber îdeolojîya xwe ya têk çûyî. Lê belê ew rizgar bû. Rizgar bû, lê belê ne bi lihevhatina digel cîhana derve; di şûna wê de bi qewîkirina dilsozîya xwe ya bi îdeolojîya xwe ve, ku kir ku dinya bikeve krîzeke aborî.

Vegera muhafazakaran a berî çend salan di dîroka tevgerên civakî ya amerîkî de tiştekî yekta ye: Li hember demên dijwar bi giştî berê xwe dana ber bi teorîya bazara serbest. Dema ku atmosfera hilbijarokî ya serdest a 2008ê were bi bîr anîn, serkeftina vî tiştî yekser mezin e. Piştî ku karesatên serokatîya **George W. Bush** rê li felaketa *Wall Street*ê vekir, ronîyên birqokî yên lihevkirina *Beltway* bawer kir ku netewe ber bi cîheteke nû ve diçe. Û herweha di pirtûka xwe ya bi navê *The Strange Death of Republican America (Mirina Ecêb a Amerîkaya Komarxwaz)* (2) de rojnamegerê xwedî tecrube **Sidney Blumenthal** weha bawer dikir -heta berî têkçûna Wall Streetê jî- û wî di nîsana 2008ê de dîyar kiribû ku George W. Bushê *'muhafazakarê tundrew'* GOP [kurteya Grand Old Party an ku partîya Komarxwaz] kiribû *'partîyeke hindikahîyê'*. Di nîsana 2009ê de gumankarê siyasî **Stu Rothenberg**, ku lê pir rêz tê girtin, gihiştibû wê encamê ku *'Di hilbijartinên navdemî ya 2010ê de şansê komarxwazan a bi destxistina yek ji salonan sifir e. Nêzîkî sifirê nîne. Ne şansekî qels yan piçûk e. Sifir e.'* (3)

Divîyabû modelên civakî yên demên dijwar tiştekî hêsan bûya, sedemeke rasterast û meseleya bandorê: Bazar, jihevketin, jikaravêtin, destpêkirina hecza malên îpotekkirî û berî ku haya te jê hebe, xelk derket kolanan, doza xwînê kir. Li cem naçarî, fikarbarî û serhildan mezin dibe. Em dixwazin ku hikûmet di vî warî de tiştekî bike -ceza bide faîlan û mexdûran rizgar bike; em li hember karesatên dahatûyê garantîyê dixwazin. Yan jî ev yek di salên 1930ê de pêk hat...

Panîka muhafezekaran di wan rojan de rê li ber alozîyan vekir. Di destpêka salên sîhê de dezgeh ji pêkhatina şoreşekê tirsîyan; wan li paş her qêrîna protestoyê bandora komunîzmê didît. Serokê Komeleya Azadîyê ya Amerîkî (4) Jouett Shouse, li Kansasê di axaftina xwe ya tîpîk a sala 1936ê de mêranî dikir û digot: *'Pergala Nû nûnertîya hewldanên avakirina hikûmeteke totalîter a li Amerîkayê dike.'* (5) Lê belê rastgiran nikaribû neqebekê bidin. Molaya totalîter jî nikaribû meyla kambax a salên sîhê biguherîne û **Franklin Roosevelt** koalîsyona xwe ya karkerên bi berstûyên şîn û bîyanîyên kelepûrî ava kir û bi piranîya dengên populer, ku heta wê demê gelek kêm dihat dîtin, di hilbijartinan de bi ser ket. Di Meclîsa Nûneran de Demokratên wî, di sala 1937ê de, zêdeyî sê parên kursîyan bi dest xistin.

Heft salan piştî Krîza Mezin, em bûn xwedî felaketa aborîya xwe. Li gor mantiqa demên dijwar -bi kurtasî li gor mantiqê- têkçûna '08 destpêka senaryoya demên dijwar dabû, wekî ku bûyerên 1929-32ê dabûn. Di siyasetê de Têkçûna '08ê dawî li hêvîyên namzedê komarxwazan ên wê salê anî, an ku senatorê Arîzonayê **John McCain**.

Bi serokatîya di destê wan de, demokratan gavên aşkere ya stîla salên sîhê avêtin, wekî hin tedbîr sepandin ku modîfîkasyona mortgageyê teşwîq bikin û komîsyonan ava bikin, da ku li krîza darayî bikolin. Serokê teze di destpêka sala 2009ê de Kongre îqna kir ku pakêta geşkirinê ya 787 mîlyar dolaran erê bike û qismî çavdêrîya *Wall Streetê* bike. Wî herweha karî berqanûna sîgortayeke giştî ya tendurustîyê jî derbas bike. Û ji ber wekhevîyên bi Krîza Mezin ji nişka ve cînnetek peyda bû. (6)

Muhafezekarek ku alarmeke zû lê dabû **Charles Koch**ê baronê neftê û damezrênêrê bandorkar ê rêxistinê azadîyan bû; wî di bultena şirketa xwe de hawar dikir û digot ku em karesata Krîza Mezin dîsa dijîn û em dikin *'heman xetayan'* bikin, ku bapîrên me kiribûn: Em *'ji salên sîhê û vir ve, bi mezintirîn wendakirina azadî û refahê re rû bi rû ne'* (7) Kovara *Forbes* bi fikara 'rejîma kevin' hejîya. Di hejmara xwe ya 11ê gulana 2009ê de kovarê karîkatureke malbateke dewlemend weşand, ku tê de malbat di nav serkapûzekê re derbas dibe û pêrgî cebanîya Apê Sam tê, ku amadehîya bilindkirina bacê dike. Karîkatureke din, ku henekên xwe bi vê yekê dikir, hişyarî dida: *'Apê Sam perê te dixwaze û xelkê li derve jî serê te dixwaze'.* (8)

Fikarên çîna karsaz ne bêsedem bûn. Hêrsa giştî di adara 2009ê de gihişt asta herî bilind, dema ku rêveberên supermarketa darayî AIG, ku hatibû rizgar kirin, 165 mîlyon dolar bonus dan wê beşê, ku berhemên kêlekê dahênandibûn, ku ew jî bûbûn sedema hilweşîna şirketê. Nefreta xelkê di vê demê de wekî volkanekê bû. Nûçeyeke li ser malpera *Bloomberg* ku 18ê adara 2009ê de hatibû belav kirin, digot *'Amerîkî dixwazin ku serên şerjêkirî bibînin.'* Paşê Obama bixwe jî hişyarî da Wall Streetê. Dema ku ew di nîsana 2009ê de digel şandeyeke ji bankerên Wall Streetê rûnişt, serokê teze ji wan re gotibû: *'Hikûmeta min di navbera we û dirganan de tenha tişt e.'* (9)

Çend meh bi ser de çûn û reftara xelet a kurikên bonus hatin ji bîr kirin. Di sermaweza 2010ê de, GOPeke tundrewbûyî di hilbijartinên Kongreyê de piştî dehan salan cara pêşîn serkeftina xwe ya herî mezin bi dest xist. Hêrsa xelkê ji Wall Streetê bar kiribû Washingtonê û veguherî raperîneke li dij hikûmet, bac û tamîmên federal yên dest pê kirî.

Fikirîna bi awayê kevin a li ser muhafezekarîyê di rewşa nû de derket holê ku têrê nake. Bi salan, mumkin bû ku vejîna demokrasîya lîberal a bi rêya balkişandinên xelet were fam kirin, ku pê mijar hertim dihat paşperde kirin, an ku bi li ser navê şerên çandî. Ji salên heftêyê heta salên **George W. Bush**, meseleyên mezin ên aborîyê bi gengeşîyên vekirî nehatin çareser kirin; ew mesele bi lihevkirina navxweyî ya siyasetmedarên li Washingtonê hatin çareser kirin, dema ku xelkê li ser kurtaj û teorîya peresanîyê (evoluation) nîqaş dikir.

Doktrîna cîranê xirab

Lê belê, pişkivîna muhafezekar, ku ji sala 2009ê û pê ve pêk hat, cuda ye. Piştî dehan salan, cara pêşîn rastgir dixwazin ku nîqaşên li ser aborîyê bi awayekî vekirî werin kirin. Mija şerê çandî vekişîya. Heger tu xwe ji bo gengeşîya li ser Înternetê li cem malperekê qeyd bikî, ku ji alîyê yek ji rêxistinên serkêş ên rasgirîya vejîyayî Welatparêzên Partîya Çayê ve tê bi rê ve birin, wê demê îqazek derdikeve pêşîya te: *'Nîqaşa li ser meseleyên civakî qedexe ye.'*: Beşdar divê xwe bi mijarên wekî *'hikûmeta sînordarkirî, berpirsîyarîya malî û bazarên serbest'* tixûbdar bikin. Manîfestoya sala 2010ê ya muhafezekaran *'Peymana ji Amerîkayê'* qet behsa şerê çandî yê çend dehsalên çûyî nake.

Ev yek nayê wê wateyê ku rastgiran bi feraxatkirina ji tevlihevkirina serê xelkê û balkişandinên xelet karê xwe berdewam kir. Berevajî vê yekê: Li ser navê berevanîya 'kapîtalîzmê' serokên raperîna dawî ya muhafezekaran bi rastî jî guh nadin kapîtalîzma heyî ya çend salên çûyî. Ew bi giştî guherîna nedana deynên kredîyê, yan jî serkeftina rakirina çavdêrîya bazaran nîqaş nakin, ku ew xerapker kirin. Di şûna wê de şerê wan li ser esasê razberîyeke xas bû. Mijara ku rastgirîya dubare biserxwevehatî dibêje, azadî bixwe ye.

Banga ku serhildan da dest pê kirin ji 'gotinên beredayî' yên nûçegihanê karsazîyê **Rick Santelli** hat, ku di 19ê sibata 2009ê de li pêşîya Wezareta Bazirganîyê li Chicagoyê gotin û li ser televîzyonekê hatin weşandin. **Rick Santelli** gelek alîyên rizgarkirina bankayan, ku çend mehên çûyî de pêk hatibûn, rexne kiribûn, lê belê wê roja sibatê guhên xelkê lê bûn, armanca TARPê (Qanûna Rizgarkirina Hebûnên Malî yên nav Dijwarîyê), ku ew ji ber wê bi hêrs ketibû, alîkarîya xwedîyên xanîyan bikin, ku şertên noqbûyî yên "mortgage"yê biguherînin, teqsîdan nizimtir bikin û bi vî awayî pêşî li heczkirina malan bigirin. Ev yek yekta parçeyê TARPê bû, ku xwedî mebesta alîkarî kirina deyndarên şexsî bû, ne ya lîstîkvanên dezgehî û bi vî awayî divîya bû ku xelk ji vê bernameyê razî bûna. Di şûna wê de, (ji qewlê wî) qanûnê kir ku qapaxa serê wî zilamî an ku ya Santelli biavêje, bernameyeke weha *'piştgirî dida muameleyên nebaş', 'şûna mortgageyên kesên bêkêr'* bi pereyê giştî dadigirt. Li gor wî ev kesên bêkêr *'avê vedixwin'*, dema ku xelkê din *'avê dikişînin'*. Santelli milên xwe rakirin û berê xwe da hevalên xwe, bazirganên Chicagoyê û ji wan pirsî: *'Gelo çend kes dixwaze mortgageya cîranê te bide, ku li malê xwedî banyoyeke zêde ye û nikare heqê fatoreyan bide?'*.

Rastgiran derfet bi kar anî, da ku nîqaşê dîyar bikin. Wan rizgarkirina karsazan wekî derbasbûna bêbextîya *Wall Street*ê ya bi ser hikûmetê bi nav kir. Ji bo wan, TARP tenha parçeyê çîroka krîzê bû, ku wan xema wê dixwar- ne berhemên kêlekê, ne jî serbestberdana bazarê- û mervantîya wê ya bi komarxwazên muhafezekaran jî pir cudahîyek pêk neanî. Alîgirên nifşa pêşîn a Partîya Çayê xwedî pêşnîyareke hêsan bû: *'Bihêlin têkçûyî bila têk biçin.'* Ev sloganek bû ku min li ser pankartên protestoyekê li Washingtonê dîtibû. Li vê derê, di hevokekê de, mifteya serkeftina rastgiran hebû, ku ew dê di demeke nêzîk de bi dest bixistaya. Ev rêzek bû rastgiran wekî neyarên karsazên mezin û alîgirên hilweşîna bankayên mezin nîşan dida,

Heger em ji nêz ve lê binihêrin, em dikarin bibînin ku kartên lîstikê tên guhertin. Dema ku hevalên me yên *Partîya Çayê* ku digotin *'berdin bila têkçûyî têk herin'*, piştî demekê wê berê xwe ji bankayên rizgarkirî bidana wan 'cîranên' bin deynê mortgageyê ku Santelli nîşan didan. Şervanên muhafazakar ên **Dick Armey** û **Matt Kibbe** di beşa bi serenavê *'Rizgarkirinê'* ya *'Manîfestoya Partîya Çayê'* de dinivîsînin:*' Li me gelekan eyan bûbû ku rizgarkirin tiştekî xelet bû. Me fam kir, da ku kapîtalîzm bi rê ve here, divê em ne bi tenê destkeftîyên potansîyel ji ber rîskên ku em dikevinê biparêzin. Lê belê herweha jidestdanan, ku dikarin pêk werin, qebûl bikin. Cîranên me yên gelek hene yan jî me derbarê hinekan de bihîstîye ku demeke gelek dirêj e ku bi çavbirçîtî pir bilind dijîn û em meraq dikin çima em divê ji bo wan pere bidin.'* Ev xetayên weha ne ku divê ji bo têkçûnê werin kirin. Hertim şexsî ye.

Ji bo îmtiyazan maskeyek

Endamên Partîya Çayê, ev serhildêrên sexte kî ne? Rengê bersivê xwe dîyar dike dema mirov lê hay dibe ka axaftinên rêveberîyê tevgera xwe xurt dike. Alîgirên Partîya Çayê carna dema ku 'muteşebisên siyasî' *protesto* dikin, ku bi rastî mebesta wan *serokên siyasî* ne û bi 'sepangerên zû' jî mebesta wan 'rutbe û dosye' ne, behsa 'selahîyeta serek' dikin. (10) Li cihê ku çayvexwir vedihewin, tu caran şexsîyetên muteşebiş kêm nabin. Wekî mînak, nivîskarê pirtûkçeya *'Piştî Partîya Çayê ez dikarim çi bikim?'* **Don Crist**, ku xwe wekî *'şêwirmendê karsazîyên piçûk'* (11) dide nasîn û senatorê Carolinaya Başûr **Jim DeMint**, ku di dîyarkirina serokên tevgerê de dîyarker e, ku ji hevdilên xwe re dibêje, di karîyera xwe ya wekî *'şêwirmendê karsazîyên piçûk'* de îmzeya xwe ya siyaseta dij-hikûmetî hîn bûye. Koma nû ya muhafezekaran, ku di serkeftina 2010ê de ji bo Kongreyê hat hilbijartin, dibêje axaftina di leha karsazîyên piçûk de sedema taybet bû ku bang li wan hatiye kirin ku ew ji paş hewcarê werin pêşîyê. **Mark Kirk** ku niha senatorê ji Illionisê ye, di kampanyaya hilbijartinê ya 2010ê de *'Qanûna Mafên Karsazîyên Piçûk'* pêşnîyar kiribû. Anketeke *New York Timesê* nîşan dabû ku xwedîyên karsazîyên piçûk nêzîkî 40 derseda komarxwazan pêk tînin, ku di 2010ê de li Meclîsa Nûneran piranîyeke ber bi çav bi dest xist. (12)

Heger em bi nûzilamên GOPê ewle bin, ku ji alîyê Federasyona Neteweyî ya Karsazên Serbixwe (NFIB- rêxistina sereke ya karsazîyên piçûk) ve tên piştgirî kirin, hejmara hevgirên karsazên piçûk ên komarxwazên nû yên di Kongreyê de dibe 74 dersed.

Nûzilamê komarxwazan **Nan Hayworth**ê ji New Yorkê di axaftina xwe ya ji bo serokên karsazên li herêma xwe gotibû: *'Hikûmet kar naafirîne; lê tu diafirînî.'* (13) Ew hevokeke populer bû sedema ku rastgir bi azwerî li ser sekinîn; ew bû ku wan pê dikarîn senaryoya demên dijwar derbas bikirana. Bi awayekî kelepûrî karsazîyên piçûk di sîya qehremanîya populîst de hatine paşguh kirin. Wekî malbatên cotkar ên berî wan muteşebiş wekî pîroz dihatin dîtin: Ew bi şexs ji goşt û xwîn in, lê karkerên fedakar in ku dikin ku aborîya amerîkî bi rê ve here. Wekî mînak, di 1983yê de di çarçoveya pîrozkirina hefteya Karsazîyên Piçûk de **Ronald Reagan** weha dest bi axaftina xwe kiribû: *'Divê her hefte bibe hefta Karsazîyên Piçûk, ji ber ku Amerîka karsazîyeke piçûk e. Muteşebis qehremanên me yên jibîrkirî ne.'*; ew *'bi dilsozî piştgirîya dêr, dibistan û xelkê dikin.'* (14) Sedema ku vejîna muhafezekaran giranî da dijberî rizgarkirinê, neyartîya dîrokî ya karsazên piçûk ên li dij bankayên cinawir bû, ku ew niha ketine teşeya dezgehên 'ji bo ku têkbiçe pir mezin e' û niha mecbûr e ku digel hikûmeta cinawir yekîtîyeke kambax ava bike.

Rojnameger Matt Taibbi bû xwedî dîtina ronesansa baskê rast, dema ku wî di 2010ê de di hevpeyvînekê de dîyar kir, ka *'piranîya alîgirên Partîya Çayê ku ez bi wan re peyivîm -gelek ji wan xwedî karsazîyên piçûk bûn.*

www.kurdishmonde.org

Komarxwaz û demokrat li ser xwedîtîya 'country music' pev diçin

Sylvie Laurent *

Demeke dirêj –çi neheq û çi biheq– weke paşverû hat dîtin û elîtên pêşverû ew piçûk dixistin, belê êdî muzîka country xwe bi tevahîya welat daye hez kirin.

Ew pir caran wek sîleh an mertaleke li dij jihevbûna nasnameya amerîkî hat nîşan dan, ku ev jixwe têgiheke xapînok e, lewre ku di nav vî cûrê muzîkê de, cihêrengîyeke bêdawî heye. Cihê istihzayê ye ku Texasa stranbêjên bi şibha serserîyan jê derketin, hevdemî xist kevneşopîyê. Lê belê, fraksîyona herî muhafezekar mohra xwe di bîra mirovan de hişt. 1969ê, strana efsanewî *Okie from Muskogee* ya stranbêjê **Merle Haggard**, îlaneke nefretê bû ya li hember *hîpîyên* pordirêj ên ku bi dîtina wî, li ser kampûsan û di bajarên Bakûr de welat ber bi tekçûnê ve dibirin. Haggardê berê girtî û berdevkê karkerên bindest bû, karî bibûya **Woody Guthrie**yekî nû, stranbêjê gelî û dengbêjê sosyalîst ê haydarîya proleterî. Lê ew li gor serdema xwe diçe, ku nirxên exlaqî yên wê demê temen, netewe û navxweyî ne: **Richard Nixon** 1974ê derdibire ku ev muzîka gel *"Amerîkayê baştir dike"* û weha cûrê di alaya bi stêrk de poşand. Ji wê û pê ve, *country* dilê tevahîya welêt ber bi xwe ve dikişîne û herî pir li derveyî dewletên Başûr tê firotin. **Ronald Reagan** 1983ê weha îfade dikir ku ev hûnerekî ne ji rêzê ya xwerû amerîkî ye û rihê wî welatparêz e.

Li dijî serokê şerxwaz "ferûckên başûrî"

Tevî vê yekê, çend ji navdartirîn stranbêjên bi şapkayên ***stetson*** dûrî vê îddiayê bûn: Hin ji wan li dijî şerê Vîyetnamê, an jî piştevanên qanûnîkirina narkotîkê bûn, hinên din jinparêzên çalak, an şermezarkerên monopola Nashvilleyê (Tennessee) ya li ser produksîyona *country*. Bes marketînga jêhatî ya weşangeran, bi rojanekirina cûrê di gel têxistina *rock*ê di repertuara wê de, rê vekir ku radyo di serî de parêzvanên welatparêzîya amerîkîyên "rasteqîn" ên gundên piçûk û jibîrkirî biweşînin.

Texas weha bûye erdê bijarte ya vî cûrê muzîkê. (4) **Bush** veguhastina wê ya ji bo alîyê rastê temam kir, dema ku ew wek muzîka xwe ya herî hezkirî îlan kir: Retorîka resenbûyîn û "destbiratîya çandî" hîn bêhtir deng veda. Piştî 11ê îlonê, produktoran di rabûna pêvegirêdana sembol û nîşanên amerîkayîyê de -jê re dibêjin *Americana*- fersendek ji bo firotina stranên bi vî rengî dît. Bi yekdengê serokkomarekî şerxwaz, **Toby Keithê** navdar *Courtesy of the Red, White and Blue* strand û soz da ku ew ê *"derbeyan"* li ser yên ku êriş birine ser Amerîkayê *"biweşîne"*. 2003ê, stêrka bîst û pênc mîlyon albumên firotî li gel **Willie Nelson** *Beer for my horses* strand û tê de digot ku divê Amerîkaya gelêrî edaleta xwe bixwe bi cih bike, wek di demên berê de ku bi awayê teksasî, temsîlkarên hêzên xirabîyê bi darên çinaran ve dihatin daliqandin. Tevî hin endîşeyan li hember vê nostaljîya nezelal, stranên şeş hefteyan di rêza pêşî ya klamên firotî de ma û yek ji stranên herî serkeftî yên **Toby Keith** bû, heta ku li 2008ê li gel fîlmekî ku stranbêj rola wî ya sereke dileyize, wek fîlm daket ser perdeya spî.

Neteweparêzî, welatparêzî û rola muzîkê

Jihevdernexistina welatparêzî ji neteweparêzîyê, pesnê nirxên windayî yên xelkê ji heyranîya îdeolojîk, dîyardeyeke meraqdêr bû. Adara 2003ê, **Nathalie Maine**ya stranbêja koma ***The Dixie Chicks*** ("keçikên Başûr") di ber konsereke li Îngilîstanê re digot ku ew ji ber eslên xwe yên teksasî yên li gel serokkomar Bush hevpar, *"şerm dikin"*. (5) Di çend rojan de, ***Dixie Chicks*** bû hedefa êrişên aloz ên medyayî; hemû stasyonên radyoyî jî muzîka wan boykot kir. Jixwe, guhdarên adetî ji ber îfadeyeke li derveyî erdê neteweyî derbirî nerihet bûn û paşxaneya wê demê ya bi tansîyon, kir ku ev îfade hîn bêhtir weke neheqî bê hesibandin. Lê belê ev qedexekirina xedar qet ne tiştekî jixweber bû. Îro baş tê zanîn ku ew bo piranî ji hêla ***Clear Channel Radio***yê ve hat meşandin, şirketeke li Texasê bicihbûyî ya xwedîya 1250 stasyonan û bi endîşe ji ber encamên siyasî yên van gotinan bû. Jixwe, hunermendên din ên *country music* rexne li şerê Iraqê kir, hunermendên sereke yên wek **Roseanne Cash, Sheryl Crow, Merle Haggard** bixwe û **Steve Earle** jî di nav de. Wî dengê stranên protestoker ên salên 1970yê veda û 2004ê, weha di *Rich Man's war* de strand:

Bobby teyrêbaz û alayekê li ser milê xwe deq dabûn
Sor, spî û şîn ji serî heta binî dema ku hat Kandaharê
Wî jineke xweşik û keçek li pey xwe hişt
Her weke komeke fatûrayan da ku here dinyayê rizgar bike
Bûye salek hîn li wir e
Di hewa hişk de bi pey cinan ketî
Tevî ku li malê erebeya wî heciz kirin
Hîn kurikekî bê pere ku ji bo şerê mêrê zengîn hat bi rê kirin
Em ê kengî fêr bibin?

Star li ser rêya vegerê li ber alayeke westîyayî

Di dema kampanyaya serokkomarîyê ya 2008ê de, stranbêjên *country* yên ku piştgirîya xwe ji bo namzedekî bi raya giştî re par ve kir, bi yekdengî li alîyê komparêzan neçûn; heta **Toby Keithê** parêzvanê awayê tund li hember dijminên Amerîkayê, ku li dij Dixie Chicks, Bush parastibû, ecibandina xwe ji bo **Obama** îfade kir. Cowboy jî ji vê tealîya bêencam westiyan û ji vê welatparêzîya ku ew ji xeyalşkestina mijarê nefreta pirî stranên gelêrî neparastin. *Crazy Heart* û *Country Strong* herdu jî fîlmên dijqehremanî ne, yên stêrkên di vegerê de ku li ber alayeke betilî li xilaskirinê digerin. Helbet ***Fox News*** kesên herî muhafezekar û cengawer ji nav wan dawet kirin. Tea Party herweha stranbêjên *country* yên pirhejmar vexwendin kombûnên xwe. Ew di çend nuxteyan de mîna hev in. Wek hîtçêkerên ***Nashville***yê muzîka kevneşopî bi stratejîya xwe ya bazirganî dihûrînin, ev kombûnên cihêreng jî bi zanebûn ji hêla komên bihêz ên berjewendîyan ve tên li dar xistin. Herdu jî axaftinek li ser haydarîya sinifê di xwe de vedihewînin, ya ku nikare xwe baş îfade bike û lewre jî maskeya nasnameya çandî datîne ber rûye xwe. *Teabaggers* û *countrymen* efsaneya amerîkî ya civakeke bê çîn pîroz dikin, lê bi paradoksî bi tenê di çîroka maxdûrên piçûkxistina sinifî de cih digirin.

Di nivîsareke havîna 2010ê de, akademîsyen **Angelo Codevilla** rabûna pir mezin a neheqîyên civakî li Dewletên Yekbûyî analîz dike. Ew *overclasseke* ku alîgirîyên partîzanî hişt li pey xwe û sinifeke gelêrî ya elît wê piçûk dibîne û partîyên siyasî yên mezin ew bi tenê hişt -ku ew *country classê* jê re dibêje- dike beramberî hev. Hin hunermend jixwe dev ji nêzîkatîyên derewîn berdidin û xwezaya civakî-aborî ya jipayketinê dîyar dikin, wek stranbêj **John Rich** -piştgirê xurt ê namzedê komarxwaz ê hilbijartinên serokkomarî yên 2008ê, **John McCain**- ku îro berpirsên *Wall Street*ê mehkûm dike. Stranên herî serkeftî aîdên hunermendên ji nîşanên derve yên "kevneşopîyê" bûyî: Tevî navê xwe yê şerparêz, **Lady Antebellum** ji guhdarên adetî bê tu îfadeya siyasî, yan parêzvanîya herêmî guhdarîyeke berfirehtir bi xwe ve dikişîne.

Çîrokên malbenda xweşik û çîrokên evînê yên romantîk

Taylor Swift, stranbêja Nashvilleyê, ku li *American Music Awards* ên 2011ê wek hunermenda salê hat dîyar kirin, bi tenê stranên evînê yên romantîk û stranên bax û gundan dibêje. Lê belê 2009ê, dema ku di merasîmeke xelatdayînê de, rapbêj **Kanye West** tê ser sahneyê û rewatîya xelata wê protesto dike, Obama bixwe tevgera wî şermezar dike. Ev stranbêja *country music* a şkêbar û nequre, weha dibe rûyê safî û lihevker ê welatekî "kûr" jê re tê gotin, ku bi mîlyonan welatîyan di xwe de vedihewîne, yên ku ji ber krîza aborî û pozbilindîya merivên bi quwet, li erdê tên xistin û bi guhdarîya muzîkeke gelêrî û gelparêz a bi dirûşmên nostaljîk, sedemeke ji bo dîsa pîrozkirina amerîkîbûna xwe dibînin.

* Nivîskara Poor White Trash. Xîzanîya Jênefretkirî ya Amerîkîyê Spî, Presses l'Université Paris-Sorbonne, Parîs, 2011.

1 Bêjeyeke dijunker ji bo Spîyên gundî, bi taybetî li dewletên başûr, ku wek mirovên xedar ên alkolîk û paşvemayî tên nîşan dan

2 James Edward Akenson, *Country Music Goes to War (Country Music Diçe Şerî)*, University Press of Kentucky, Lexington, 2005

3 Awayekî neteweparêzîya tund ê navê Andrew Jackson ê heftemîn serokkomarê amerîkî (1829-1837) lê hat kirin

4 Aaron A. Fox, *Real Country: Music and Language in Working-Class Culture (Countrya bi rastî: Musîk û Ziman di Çanda Çîna Karker de)*, Duke University Press, Durham, 1994

5 Bixwînin Jessie Emkic, "Une chasse aux sorcières contre les Dixie Chicks (Nêçîra Cadûyan li dijî *Dixie Chicksan*)", *Le Monde diplomatique*, adar 2008

Wergera ji fransî: Simko Destan

Ew xwedî dikanan yan restorantan in û ew zagonan wekî mufetişa ruxset, yan tendurustîyê dibînin ku tên da ku wan aciz bikin û ji ber tiştên piçûk cezayê pere didin wan. Tecrûbeya wan a bi qaîdeyên hikûmetê ewqas e. Û dema ku ew li ser JP Morgan Chase û Goldman Sachs û ji nû ve sazkirina bankayan dibînin, ji bo wan ew heman tişt e'. (15) Rastgirîya xwe nû kirî serê xwe pê naêşîne ku wê ferqa navbera wan her du pêkanînên kapîtalîst zelal bike.

Karsazîyên piçûk îro rûyê rastgiran e, ji ber ku mesajên şerût û dij-karsazîyên mezin xîtabî moda tahl a neteweyê dike; lê tiştê ku rastgir bi rastî dikin wekî hercarî belavkirina heman qencîyan bi heman kesan e. Ev yek fenomeneke aşîna ye. Di xebata xwe ya sala 1951ê de civaknasê navdar **C. Wright Mills** dîyar kiribû ku *'bala muteşebisên amerîkî'* ji serkeftinên aborî yên karsazên piçûk derneket, lê ji *'bikêrhatîbûna wê îmaja wê ya bo berjewendîyên siyasî yên karsazên mezintir'* derket. Muteşebis *'bû ew kesê ku bi riya wî îdeolojîya kapîtalîzma utopîk hîna jî ji gelek hevdemên me re tê pêşkeş kirin'* . (16)

Ji me re hat gotin ku divê baca mîratgirîyê here, ne ji ber ku ew bac dewlemendan nerehet dike, lê belê ji ber ku gefek e li dij malbatên cotkar. Birînên bacî yên Bush divê bimînin, ji ber ku bê wê karsazên piçûk dê têk biçin. Rakirina çavdêrîya bankayan ji bo alîkirina dikandarên bajarên piçûk hatibû kirin. NAFTA (Peymana Bazirganîya Serbest a Bakurê Amerîkayê) wekî kelepûr firotin ji bo destpêkeke nû ya muteşebisî. Hertim û niha jî, yek wê derkeve û israr bike ku navbera berjewendîyên *Wall Street* û dikandarên cadeyan de tu cudahî nîne.

* Rojnameger. Nivîskarê *Pity the Billionaire. The Hard-Times Swindle and the Unlikely Comeback of the Right*, (Dilê We Wê bi Mîlyarderan Bişewite. Dek û Dolabên Demên Dijwar û Vegera Rastgirîyê, ku ne Mumkin e.) Metropolitan Books, New York, 2012.

1 Herman Cain 3yê kanûna 2011ê biryar da ku xwe ji namzedîyê vekişîne

2 Sidney Blumenthal, *Mirina Ecêb a Amerîkaya Komarxwaz: Kronîkên Hilweşîna Partîyekê*, Weşanên Union Square, New York, 2008

3 "AprilMadness: Can GOP win back the House in 2010? (Dînitîya Nîsanê: Gelo GOP dikare li kongreyê sala 2010ê ji nû ve bi ser keve?)", http://rothenbergpoliticalreport.com, 27ê nîsana 2009ê

4 Civata dewlemendên sektora pîşesazîyê ya amerîkî ya ku sala 1934ê hat damezirandin

5 "The New Deal vs Democracy" (*Pergala Nû li dij Demokrasîyê*), American Liberty League, 1936

6 Bixwîne Peter Custers, "A quoi pourrait ressembler un véritable 'New Deal vert'? ('New Dealeke Kesk' a bi Rastî Dikarîbû Bişibe Çi?)", *Le Monde diplomatique*, gulan 2009

7 "Perspective", *Discovery, the Quaterly Newsletter of Koch Companies, (Kifşkirin, Bultena Şirketên Koch) Çile* 2009

8 *Forbes*, New York, 11ê gulana 2009ê

9 Eamon Javers, "Inside Obama's bank CEOs meeting (Di Hundirê Bankeya Obama de Civîna CEOyan)", Politico.com, 3yê nîsana 2009ê

10 Jack McHugh, "What the Tea Party is, *is not*, and its 'core competence'" (*Partîya Çayê Çi ye, Çi Nîne û Selahîyetên Wê yên Sereke*), 16 kanûn 2010. http://www.michigancapitolconfidential.com ; "Surface tension. Tea Parties and the political establishment" (*Tengezarîya ku Tê Dîtin. Partîya Çay û Dezgehên Siyasî*), rapora *Sam Adams Alliance*, 13 kanûn 2010

11 Jim DeMint, *Saving Freedom: We Can Stop America's Slide Into Socialism (Rizgarkirina Azadîyê: Em Dikarin Nehêlin ku Amerîka Bişemite Nav Sosyalîzmê)*, Fidelis, Nashville, 2009

12 Robb Mandelbaum, "Meet the new small business owners in Congress" (*Hevdîtina digel Xwedîyên Karsazîyên Nû yên Piçûk*), *New York Times*, 16 çirîya paşîn 2010

13 David Cay Johnston, "Nonsense posing as wisdom (Kelevajîtî Xwe Weke Zanetîyê Nîşan Dide)", 13ê îlona 2011ê, http://blogs.reuters.com

14 Ronald Reagan, "Radio address to the nation on small business (Axaftina ji Netewe re ya di Radyoyê de li ser Mijara Dikandarîyê de)", 14ê gulana 1983yê, www.presidency. ucsb.edu

15 "Matt Taibbi on deluded Tea Partiers, Ayn Rand and how the U.S. is like the Soviet Union" (*Matt Taibbi, Li ser Alîgirên Partîya Çayê, ku Hatine Xapandin, Ayn Rand û DYA jî wekî Yekîtîya Sovyetan e*), http://alternet.org, 21ê irîya paşîn 2010

16 C. Wright Mills, White Collar. The American Middle Classes, (*Stukurên Spî. Çîna Naverast a Amerîkî*) Weşanên Zanîngeha Oxfordê, 1953

Wergera ji îngilizî: Celîl Kaya

Ji sê albûmên herî pir firotî yên sala 2010ê, didu albumên hunermendên *country* bûn: Li du **Eminem**ê rapbêj, *Need you now* a koma **Lady Antebellum** hebû û li pey wê jî, albuma *Speak now* a Taylor Swift. Bi tevahî, herduyan jî ji şeş mîlyon albuman bêhtir firotin; tê gotin ku ji destpêka karîyera xwe ve, **Taylor Swift**ê bêhtirî bîst mîlyon album firotine. Li sînemayê jî, ev cûr bi nirx bû ji dema ku fîlmê bîyografîk ê stranbêj **Johnny Cash**, *Walk the Line*, li 2005ê xelateke Oscar wergirt. Çar sal bi şûn ve, rexnegiran fîlmê *Crazy Heart* pir baş nirxand, yê ku gerên kevnestranbêjekî ***country*** ê alkolîk û bi tenê vedibêje, herçi *Country Strong*ê di havîna 2011ê de li Fransayê derket, girseyeke temaşevanan civand. Ji wê bêhtir bi mane, nîsana 2011ê, yek ji mezintirîn stêrkên ***Rythm and Blues*** (R'n'B) ê welêt, stranbêja reş **Rihanna**, derket ser dikê *Country Music Awards* -merasîmeke xelatdayînê ya ku heta wê demê moda wê bihurî dihat hesibandin-, ku ev jî "kêlîya" country ya Dewletên Yekbûyî yên hevdem dide xuya kirin.

Dîroka *country* kokên xwe ji cihaneke *rural* a amerîkî ya ji dinyayê veqetiyayî werdigire û destpêka sedsala 20ê, hin produktorên jîr û jêhatî çûn wir da ku *"old time songs"* (klamên zemanên berê) ên xwedêgiravî rihê amerîkî yê rasteqîn nîşan didin, keşf bikin. Qeydên pêşî destpêka salên 1920ê çêbûn, lê hin dîroknas û nijademuzîknas hebûna wê digihînin serdema şerê serxwebûnê. (2) ***Balad*** û stranên gelêrî li gel enstrumanên dîyar (gîtar, banjo, deng) û gotinên melankolîk nemaze di pey Krîza Mezin re dilê Amerîkaya gundî bi xwe ve dikişînin. Reşikên bindest xwedîyên *bluesê* ne û civatên *rural* ên çîya û deştên îzolebûyî xwedîyên *country* ne ku carina jê re *"hillbilly blues", "bluesa gundîyan"* tê gotin. Lewre ku ew îdeala şivanî ya pêşengan bi bîr dixe, her weke nihêrîna efsanewî ya başûrekî spî, gelêrî, ji bertîlgirîya dinyayê parastî -lê ku zû jî dişkê- û agirê neteweparêzîyeke jacksonî ya demên berê dîsa gur dike. (3) Piştî têkçûna xedar a 1865ê, nostaljîya tahl a başûrê tekçûyî bû paşxaneya *country*ya bi pey re hatî: Qeyda deng a welatparêzîyeke amerîkî ya dilmayî.

Xirecira komarxwazan a eşkerekirina namzedê/a xwe ya ji bo hilbijartina 2012ê nikare bide ji bîr kirin ku serokkomarê li ser kar bixwe bi kampanyayekê rabûye; ber bi xwe ve kişandin û bi taybetî bandorkirina li ser berbijêrên 2008ê yên ku dengên xwe nedabûn wî. Li ser vê, roja 21ê mijdara bihurî, **Obama** festîvaleke muzîka *country* digel beşdarbûna navdarên wek **James Taylor**, **Lyle Lovett** an jî **Dierks Bentley** li dar xist û bi vê boneyê navê "Mala gel" li Qesra Spî danî. Serokkomar derbirî ku, di ber hevdîtinên wî bi welatîyan re, ew jî ferî ecibandina vê mûzîka *"li ber dilê wan hêja"* bû.

Ev înîsîyatîveke dilawer e, ji ber ku ev awayê bijarte ya çanda gelêrî ya Amerîkaya spî, ku bi asayî ji hêla giregirên Waşîngtonê ve piçûk tê dîtin, weke cihê sembolîk yê nerazîbûnê tê nirxandin: Cihê nefreta ji dewletê, pênebawerîya kêmneteweyan û şermezarkirina elîtên bajarî. Bê guman e ku serokkomar **Barack Obama** ji alîgirên demokratan pirtir, yên Tea Party ber bi xwe ve dikşîne, nemaze yên reş û derçûyên Harvardê. Îfadekirina neyarîya li dijî mêrên spî yên pîr û ji asta xelkê hatî, destûrê dide ku amerîkbûneke li gor wan jidestxistî û jirêderketî di welatparêzîyeke zelal de xeniqandî dîsa kefş bikin û xwedîyê dîrokeke dûv û dirêj e. Obama jî baş fêm kir ku nabe ew bi tenê zemînê partîya komarxwaz û karîkaturên "rednecks" bibe. (1) ***Country music*** a ku li başûr eslên xwe terk kir, li gel aksanên zemanê berê yên îmaja kowboyekî bi kincên pînekirî tînin bîran, ji çend salan û vir de dinyaya çandî ya tevahîya Amerîkayê zeft kir.

Li Hollywoodê "Blues"

www.rojkurd.org

ÇIRÎYA PÊŞÎN 1993

LÎSTIKÊN MEZIN ÊN REJÎMA ANKARAYÊ

Li Kurdistanê ji bo artêşa tirk "rêya vekirî"

MICHEL VERRIER *

Ji tebaxa 1984ê û vir de, ku PKK (Partîya Karkerên Kurdistan) li Tirkîyeyê şerê çekdarî li dar xistiye û heta niha di nav neh salan de neh hezar kes hatine kuştin. Di destpêkê de li herêmên başûr-rojhilat, niha jî li seranserê rojhilat belav dibe û berê xwe dide hedefên turîstîk. Hikûmeta Ankarayê hemû pêşniyarên PKKê yên ji bo agirbest û lihevkirinê paşde vegerandin û hemû hesabê xwe li ser zor û zordestîyê ava dike. Dixwaze bi yekcarî bi projeyên hîdro-elektrîk û barajan bandora xwe ya aborî li ser herêmên başûr û rojhilat bi hêztir bike.

Li Kurdistana Tirkîyê şer ji nû ve geş bû. Artêş û hikûmeta Ankarayê, hemû pêşnîyarên **PKK**ê (Partîya Karkerên Kurdistanê) yên ji bo lihevkirinan, ku ji buhara çûyî ve dest pê kiribûn, bi paş de şandin û qebûl nekirin. Rêya ku da ber xwe; bi qaweta zorê, şerê çekdarî têk bibe û "terorîzmê" ji holê rake. 11ê tîrmeha 1993yê, serekerkanê giştî û serokwezîra nû **Tansu Çiller**, hemû berpirsîyarên rojname û çapemenîya herî mezin ji dervayî du rojnameyan ku bi çavê "gumanbar" li wan dihat nêrin, li dora xwe civandin da ku bikaribin lihevhatinekê li ser vekirina riyekê bo artêşê bi dest xin, da ku bikaribe *"li hember terorîzmê şerekî mezin li dar xe."* (1)

Rojnamevanekî bal dikişand ser wê yekê ku hefta bihurî kabîneya hukûmetê desteka xwe ya polîtîk ya temamî dida hêza leşkerî ku operasyonên ji niha û pê ve, ne bi tenê li hember militanên PKKyê, lê herweha li hember hemû kes û rêxistinan be yên ku bi çi awayî dibe bila bibe, piştgirîyê dike. Yanî 375 000 kes, li herêmên ku tên bahs kirin ji her deh ciwanan yek dikeve bin bandora van operasyonan. (2) Nêzî 500 gund ji berê ve hatine vala kirin, leşker tu caran razî ninin, her zêdetir heq û îmkanan û dixwazin, ji bo ku bikaribin hemû cûre çekan û herweha bombayên napalm jî bi kar bînin.

Roja 17ê adara 1993ê birêz **Abdullah Öcalan**, serokê PKKê, bi hêvîya ku bikaribe guft û goyên lihevhatinê bi hikûmeta Tirkîyê re bimeşîne, ji bo mehekê agirbestek îlan kir. Ji bo vê yekê jî ji hikûmetê daxwaz dikir ku "rewşa awarte" ji 11 herêmên kurdan yên li Başûr-Rojhelat were rakirin, ev rewşa taybetî ji meha gulana sala 1987ê ve her berdewam e; efûyekek giştî, naskirina nasnameya kurdî bi awayekî fermî, azadîya avakirina partîyên siyasî û legal yên kurdan, îmkanên vegera kurdên penaber bo gund û warên xwe, tedawî kirina mexdûrên şer ji alî hikûmetê ve. (3)

Her çiqas hikûmeta tirkî, PKKê wek muxetab qebûl neke û wê weke rêxistineke terorîst bibîne, dîsa jî karibû bi rêya partîya **HEP**ê, ku bîst wekîlên wan li meclîsê hene, têkîlîyan bimeşînin; an jî bi rêya birêz **Celal Talabanî**, ku yek ji serokên kurdên Iraqê ye û ji şerê ***Kendav***ê û vir de navbêna wî û tirkan baş e.

HEP û birêz Talabanî, her du jî di cîvîna konferansa çapemanîyê ya birêz **Öcalan** ku 17ê adarê li dar xistibû û agirbest dirêj kiribû de beşdar bûn. Lê di 17ê nîsanê de bi mirina serokkomar **Turgut Özal** re, Suleyman Demîrel dewsa wî girt, û wî hemû dan û standinên di vî warî de, bi temamî dan sekinandin.

Turgût Özal di derheqê pirsgirêka kurdî de, bi muqayese hesastir bû, berî mirina xwe bi demekê, bi çend şexsîyetên dora xwe şêwirî bû, hinek ji wan jî yên derdora PKKê bûn, da ku bikaribe çareserîyekê ji pirsgirêka kurdan re peyda bike û bi awayekî serbilind şer rawestîne. Ji bo vê yekê, nivîskarê mezin **Yaşar Kemal**, ji bo serokkomar weha digot: *"Artêşa tirkî dikare Öcalan ji holê rake, mirov dikare 15 milyon kurdan bide sekinandin... Lê belê ger mirov cengekê li hember miletekî, li hember kurdan bimeşîne, wê bibe ku wek mirov şer li hember raya giştî ya dunyayê bimeşîne, bi şerekî weha, mirov tu caran nikare bi ser keve, li halê amerikîyên li Vîetnamê binêrin, yan jî li yên sovyetîyên li Afganistanê."* (4)

Em ferz bikin ku **Turgut Özal** ev îş qebûl kir, lê zehmet bû ku bikaribaya ev yek bi serekerkanê giştî bida qebûl kirin, ji ber ku hemû operasyonên li Kurdistanê di destên leşkeran de bûn. Piştî hilbijartinên meclîsê yên çirîya pêşîna 1991ê, partîya **Suleyman Demîrel**, DYP û partîya Sosyal Demokrat ya **Erdal Inönü**, ji sozên xwe yên ji bo çareserîyeke siyasî peyda bikin, zû paşde vegeriyan. (5) Wekî ku rojnamevan **Ismet G. Imset** dida zanîn *"hikûmeta nû, qerar da ku şer li hemû Kurdistane belav bike, tam tersê sozên ku hatibûn dayîn. Gelek taqîbgerên vê meseleyê pê hesiyan ku Demirel rêya siyasî bi carekê ve red dike û Konseya Netewî ya Ewlekarîyê dicivîne."* (6)

Ev konsey, ji alî serok leşkeran ve tê îdare kirin û tu hêza sivîlan têr nake ku mudaxele bikin. Li gor Qanûna Esasî, ku bi qaweta serekleşkeran dirûst bûye; serekerkanê giştî qet nakeve bin hukmê wezareta parastinê. Bêyî ku mîzaha reş bike, ji rojnamevanan re weha digot: *hikûmetê qerar daye, wekî bîst û heft serhildanên berê, ev serhildan jî dê di xwînê de bê fetisandin!*

Li herêmên Başûr -Rojhelat, biryara agirbesta berî ***Newroz***ê, aramîyek di nav xelk de peyda kiribû. *" Dê hejmara mirî û kuştina kêm bibin,* digot avûkatekî ku berpirsîyarê Rêxistina Mafên Mirovan li Cizîrê bû. *Herçiqas gel, hêvîya xwe diparêze jî, dîsa jî gelek bi pirs e li hember pêşniyazên gerîla ku ji Ankarayê daxwaz dikin"*, ji ber ku li vê herêmê tirs pir e û tansîyon bilind e. Ev jî, di vê buhara 93yê de, bi kontrolên eskerî, bi şewitandina gundan, bi operasyonan, bi zilma ***JITEM***ê ve girêdayî ye. Li gor devberkê PKKê yê Ewropayê, di navbeyna 20ê adarê û destpêka hezîranê de, 44 gund hatine şewitandin, 165 kes hatine kuştin û 3 500 kes hatine girtin.

Li gel hemû vê zulmê jî, PKK dîsa jî agirbestê berdewam dike û dide dîyar kirin ku dan û standinên lihevkirinan berdewam bibin. Piştî 24ê gulana bihurî, gerîla ji 30an zêdetir eskerên bê çek li herêma Bîngolê kuştin. Wezîrê Karê Hundur **Ismet Sezgîn** derhal bi nav dikir û digot: Sozên PKK tenê xapandin bûn û artêşa tirk, li herêmê dest bi operasyonan kir: Li gor hikûmetê di navbêna 10ê gulanê û 10ê tebaxê de 733 kes hatine kuştin. Ev kemîn ji alî dem ve ji bo PKKê ya herî xerab e, ev jî hinek pirsan bi xwe re tîne, gelo ev provakasyona Hêzên Taybetî yên Artêşa Tirk nîn be? Öcalan bê dilê xwe ev bûyer qebûl kir.

Di mesaja xwe ya 29 ê gulana 1993ê de, ji bo xwepêşandana Bonnê ku ji alîyê bi deh hezaran kurdan ve hatibû amade kirin, **Öcalan** behsa betalkirina agirbestê nedikir. Pêwist bû ku li hêvîya 8ê hezîranê bimîne, ji bo ku ji hikûmeta Ankarayê re bide dîyar kirin ku ji nuha û pê de hemû axa Tirkîyê dibe qada şer û ji turîstan rica dikir ku neyên Tirkîyê û neçin ber peravên Bosforê, şer ji nû ve geş bûbû. Nîşana wî ew bû ku çend kesên bîyanî hatin revandin ku çar ji wan fransî bûn: 24ê meha tîrmehê hatin revandin, 10ê meha tebaxê jî hatin berdan. 15ê meha tebaxê, li gel ku dixwest xwe ji sûcdarî û tawanbarîya terorîzmê dûr bixe jî, PKKê dîsa dest pê kir çend turîst revandin. (7)

Gurbûna şer bi awayekî din xwe nîşan dida; ew jî ew bû ku êrişen dewletê li ser rêxistinên legal ên kurdan berdewam bû. Di 17ê tîrmeha 1993yê de Dadgeha Qanûna Bingehîn, bi îthama parçekirina yekîtîya komarê û alîkarîkirina Partîya Ked a Gel (**HEP**) hate qedexe kirin.

Di vê pêvajoyê de gelek kes û endamên vê partîya siyasî ku di meclîsê de cih digirtin, hatin girtin û tehdît kirin. Ji bo ku vê meseleyê bi awayekî çareser bikin, kadroyên HEPê Partîya Demokrasîyê (**DEP**) ava kirin ku ew jî dîsa her di bin tehdît û tirsa girtinê de bû.

Mixabin mirov dikare bibêje ku ev pêvajo rastî konferansa çapemenîyê ya 17ê adarê hat ku birêz Öcalan di wê konferansê de pêşnîyara guhertina stratejîya tevgera xwe dikir û dixwest bi Ankarayê re li hev bike, ne ji bo serxwebûnê, lê ji bo federasyoneke tirk û kurdan.

Ev perspektîv ne tiştekî nû bû, ji ber ku berpirsyarên PKKê beyan dikirin ku:"*Mirov dikare bibêje ku kurd ji veqetandinê zêdetir, yekîtîyeke azad dixwazin. Ev yekîtî jî divê li ser bingeha wekhevî û azadîyê be".* (8)

Ev fikra federalîzmê herweha ji bo çarçoveya Rojhilatê Navîn jî dihate munaqeşe kirin da ku hemû eqelîyetên li Îran, Iraq, Sûrîye û Lubnanê û li cîyên din jî bikaribin vê pirsgirêka xwe çareser bikin. Ev guhertin di heman demê de bûn sebeb ku PKK bi hin partîyên din ên biçûk re -wek PDKa Tirkîyê ku nêzî **Mesûd Barzanî** ye, PSK ya birêz **Kemal Burkay** ku wî bixwe jî bi salan ji PKKê re digot "terorîst"-, hevkarîyê bike.

Birêz **Ziya Acar**, berpirsîyarê PSK yê Parîsê weha dibêje: *"Di nav 19 salan de me xwest em pirsgirêka kurdan bi rêya aştîyê çareser bikin. Lê îro em şerê çekdarî bi temamî înkar nakin, ji ber ku hikumeta tirkan divê bizanibe ku bi vê siyasetê ew ê zerareke mezin bibîne. Em dizanin ku bi rêya eskerî çareserî nabe, em terefdar in ku agirbest ji alî herdu terefan ve berdewam be û guftûgoyên lihevkirinê bên kirin û çareserîyeke siyasî were peyda kirin."*

Ev hevkarî gavek e ji bo avakirina enîya rizgarîya neteweyî, ku di nav de, ji komunîstan bigire heta bi îslamîstên lîberal, ji dehan zêdetir rêxistinên cuda cih digirin. Herçendî koka wê digihîje partîyên çep ên ekstrem, ên Tirkîyê yên salên heftêyî jî, PKK di merheleya guherînê de ye ku bibe partîyeke neteweyî û ji îdeolojîya xwe ya marksîzm-lenînîzmê dûr bikeve û di heman demê de ew di nav gel de bi temamî bi cih bûbû, vê yekê jî hêsantir kir ku, ev lihevhatin di navbera van partîyên ku bi dehan salan li hember hev şerên dijwar kiribûn, pêk were.

Tecrube û siyaseta ku ji alî kurdên iraqê ve ji şerê ***Kendav***ê û vir de tê meşandin, bê guman tesîreke mezin li ser kurdên herêmê jî dike, bi taybetî li ser kurdên Tirkîyeyê. Parlamentoya Hewlêrê ku paytextê Kurdistana Iraqê ye, bi pluralîzm û azadîya xweîfadekirinê dimeşe: Her partîyek xwedîya rojnameyên xwe û piranîya wan xwedî radyo ne jî. Hikumetê hêzeke 30 000 kesî ji polîs û leşkeran saz kiriye ku ew jî ji pêşmergeyên rêxistinên siyasî yên cuda tên. Rast e, ku mezinahîya pirsgirêka aborî û blokekirina hukumeta Bexdayê dikare vê tecrubeyê xera bike, lê li gel wê jî hedefeke giring û balkêş e.

www.kurdistanskurdi.org

Halbûkî têkilîyên PKKê bi kurdên Iraqê re hîç ne rehet bûn. Di dema serhildanên li hember rejîma **Sedam Huseyin** de, mehên adar û nîsana 1991ê, **PKK**ê di destpêkê de, tercîha xwe li alî pêşmergeyan danî, paşê li hember êrişên gelek giran ji alî rejîma Bexdayê ve, PKKê berê çekên li ser milên xwe guhart û destpêkir herdû serokên kurdên Iraqê birêz Talabanî û birêz Barzanî bi "îxanetê û bi hevalbendîya Bexdayê û herweha bi serokatîya feodal" sucdar bike. Li gel van çewtîyên polîtîk yên giran ji alî kurdên Iraqê ve jî, PKKê qerar da ku xwe li bakurê Kurdistana Iraqê bi cîh bike, cîhên ku ji artêşa Bexdayê vala bibûn, ji alî PKKê ve hatin dagir kirin. Têkilî û bi hev re jîyana PKKê û peşmergeyên kurdên Iraqê gelek zor û zahmet bûn. Di teşrîna pêşî ya sala 1992yê de, li ser zextên tirkan, pêşmergeyan êrişî ser meqerên PKKê kirin, ji ber vî şerê birakujîyê, bi sedan kes hatin kuştin.

Piştî îmzekirina lihevhatinên agirbestê, gerîlayên PKKê heq bi dest xistin ku li Kurdistana Iraqê bi cîh bibin, bi şertê ku ji cihên ku dimînin êrişî artêşa tirkan nekin, her du alîyan biryar da ku rûpelê biqelibînin û tiştên bihurî ji bîr bikin, bi vî awayî jî hêdî hêdî fêrî hev bûn; nîşana vê yekê jî ew bû ku dema ku birêz **Abdullah Öcalan** konferansa çapemenîyê saz kir, birêz **Talabanî** li gel wî bû. Operasyonên leşkerên tirkan, ku li dû endamên PKKê li Kurdistana Iraqê digerin, dikarin vê destekê têkin talûkê. Kurdên Kurdistana Iraqê ji alîyê xwe ve di bin êriş û bombardimanên artêşa Sedam de ne, wisa dîyar e ku lîstikên hêzên mezin yên herêmê dê nehêlin yekîtîya kurdan zû bi zû ava bibe.

Bi munasebeta salvegera nehan ya destpêka şerê çekdarî yê 15ê Tebaxê yê PKKê, **Ilknûr Çevîk**, şef-redaktora rojnameya *Turkish Daily News*, weha digot: *"Hersal di salvegera vê tarîxê de, em bi hefteyan ji hemû cûre berpirsîyaran beyanên fermî dibîhîsin ku, îsal dê bibe sala ji hev xistin û parçekirina tevgera PKKê. Ev 9 sal in ku her sal em van gotina dibihîsin, PKK parçe nebû û ji hev neket, berevajî, bûyerên nû peyda rû dan ku talûka wê hîn mezintir e; ew jî ev e ku tirk û kurd wek milet bi hev dikevin, ev bi hêsanî dikare bibe sebebê parçebûna Komara Tirkîyê"*. (9)

* Rojnamevan.

1 Turkish Daily News, 12 tîrmeh1993

2 Turkish Daily News, 12 tîrmeh 1993

3 Christiane More, "Les Kurdes, un enjeu oublié du Proche-Orient", *Le Monde diplomatique*, çirîya pêşîn 1986, û Kendal Nezan, "Privés d'Etat, les Kurdes ne peuvent oublier les leçons de l'histoire",*(Christiane More, "Kurd, lîstikek jibîrkirî di Rojhelatê Navîn de" û Kendal Nezan" Kurd, ji dewletekê bê par, mafê wan tuneye ku dersên dîrokê ji bîr bikin".) Le Monde diplomatique*, hezîran 1991

4 Le Monde, 13 tîrmeh 1993

5 Lire Michel Verrier, "La guerre s'étend au Kurdistan", *(Şer li Seranserê Kurdistanê Belav Dibe) Le Monde diplomatique*, çile 1993

6 Ismet G. Imset, The PKK, a Report on Separatist Violence in Turkey, *(PKK, raporek li ser şideta veqetînxwazan li Tirkiyeyê)*, Turkish Daily News Publication, Ankara, 1992

7 *Di raporeke ku meha bihurî ji alîyê Amnesty International ve hatibû weşandin, rexneyên mezin li metodên hêzên leşkerên tirk û di heman demê de li PKKê jî digire, ji ber kuştina bi zanîn a hepsîyan, ji bo ku nehêlin gundî bibin "korucu"*

8 Kurdistan Rapport, nîsan 1992

9 Turkish Daily News, tîrmeh 1993

Wergera ji fransî: Vehbî Aydin



Mehmet Latif Saglam: **Ji rêza 33 gule**, Seramîk

Wênesazê vê hejmarê

Mehmet Latif Saglam

Di sala 1966ê de li Qoserê ji dayik bûye. Perwerdeya xwe ya seretayî û navîn li Qoserê temam kiriye. Li zanîngeha Marmarayê, beşa huner a peykerê tewa kiriye.

Ji ber ku zaroktîya wî li deşta Qoserê derbas bûye, dîmenên zevî û bostanên deşta Qoserê yên bê ser û binî tesîreke mezin li se wî hîştine. Ev tesîr di xebatên wî yên hunerî de dê biba mijara bingehîn a rêzewêneyên "batirsokên bostanan".

Di nav hunerên plastîk de bi beşên wek wêne, peyker, seramîk û fotografê re mijûl bûye. Ji ber vê yekê di xebatên xwe de hewl daye ku vegotina devkî (wêjeya helbestî) veguherîne vegotina plastîk. Di xebata xwe ya bi navê "Portreyên Bi Rengên Helbestan" hewl dide ku vegotina helbestên **Ehmedê Xanî, Cegerxwîn, Celadet Elî Bedirxan, Ahmed Arîf, Feqîyê Teyran** û **Yilmaz Guney** bi zimanê hunera plastîk şirove bike.

Hunermend **Saglam** di pêşengeha xwe ya bi navê "***çar cara çar***" de jî çar helbestên Ahmed Arîf, Nazim Hîkmet, Hasan Huseyin û Orhan Weli bi hunera plastîk şirove kir.

Saglam di gelek komeleyên huner, sendîka û rêxistinên hunerî de xebitîye û rêveberî kirîye. Demeke dirêj e di festîval û kampên hunerê de rêveberîyê dike. Li gelek bajarên Tirkîyeyê beşdarî çalakî û pêşengehan bûye. Di sala 1992yê de dest bi mamostetîya hunerê kir. Niha jî li lîseya hunerên bedew a li bajarê Meletîyê wek mamoste dixebite.

Berî bi pêncî salan gelê Cezayîrê gihişte serxwebûnê. Di tîrmeha 1962yê de rojên şahî û pîrozbahîyê venaguherin tu şideta li dijî fransîyên hê li Cezayîrê ne. Bi tenê Oran îstîsna bû, li Oranê bi dehan pieds-noirs [navê li Ewropîyên li bakurê Afrîkayê bicihbûyî dihat kirin e, maneya wê lingreş e; nota wergêr] ji alîyê girseyê ve hatin kuştin. Ji nîvsedsalê û vir ve behskirinên sereke yên vê komkujîyê xwe ji şahidîya cezayîrîyan re kerr dikin.

ÇÎROKA KOMKUJÎYA AMADEKIRÎ

Oran, 5ê Tirmehê 1962

PIERRE DAUM û AUREL *

Oran, piştî pêncî salan, pîremêrê me şaşika xwe ya spî û paqij bi usûl rast dike: *"Hûn baş ewle ne ku divê mirov ji nû ve behsa van tiştan bike, vê herîyê hemûyî cardin bileqîne? Demeke dirêj derbas bû! Li vir em dixwazin vê tiştê ji bîr bikin"*. Tam pêncî sal berê, ev camêr beşdarî şerê serxwebûna welatê xwe bibû. Cîgirê fermanberê Arteşa Rizgarîya Neteweyî (ALN) bû (1), hertim çekê wî li mil, li hember leşkerên fransî şer dikir, li gel ku gelek bawermend bû, lê dîsa jî hez nedikir behsa van kuştinan bike. Yextiyarê me bi têkoşîna xwe ya wê demê îro jî bawer e û rastîya pêwîstîya wê diparêze. Bi şêweyekî provakatorane ji min dipirse: *"Tu, tu bixwe fransî yî? Tu yê qet nizanibî tê çi maneyê ku mirov ji yekî re bibêje komircî! Bi ser de jî dema ku mirov li welatê xwe bi vî awayî bête gazî kirin!"*. Halbûkî dema mirov behsa 5ê tîrmeha 1962yê ya li Oranê dike, ku ew bixwe beşdar bû, wê çaxê çavên wî dibiriqin. *"Her çiqas min ji bo ku kuştin çênebe her tişt kir jî, ev roj wek rojek rûreşîyê ye ji bo me…"* Wê rojê, hemû Cezayîrê serxwebûna xwe pîroz dikir. Ji serê sibê ve, li hemû bajaran, li hemû gundan, bi mîlyonan cezayîrî ketibûn ser riyan, li gel bi hezaran alayên kesk û spî, kêf dikirin, govend digirtin û stran digotin. Li Cezayîrê, (berî şer, li ser mîlyonekê bû) hîn çar sed hezar fransî mabûn, di destpêkê de hinekî bi tirs bûn, paşîyê hinekan ji wan dest pê kir, tevlî qelebalixê bûn. Li tu derekê tu nerhetîyek çênebû. Tenê li Oranê. Li metropola mezin ya rojava, li gel du sed hezar cezayîrî, hîn bi qasî pêncî hezaran "***pieds-noirs***", (***pê-reş***) mabûn. Ji nişka ve kêfxweşî sekinîn û kuştinên mezin dest pê kirin. Di nav çend saetan de, bi dehan heta bi sedan jin û mêrên ewropî bi derbên kêran, bi biviran, an jî bi guleyan hatin kuştin.

Hecî Welî ku wê demê 18 salî bû, weha tê bîra wî: *"Halbûkî her tiştî bi xweşî dest pê kiribû. Rojeke pêncşemê bû û gelek germ bû, li gel malbata min em li taxa **Saint-Antoine** rûdinîştin, mala me ji alî OASê (2) ve sê caran hatibû bombe kirin, ji ber wê em mecbûr man em çûn **Ville Nouvelle** (Bajarê Nû), li wê derê bi tenê cezayirî diman. Roja 5ê meha tîrmehê, hemû kesên taxê çûn navenda bajêr, ber bi îstiqameta meydana çekan ve. Ji nişka ve berî nîvro me dengê çekan bihîst, bêyî ku mirov bizanibe deng ji ku derê tê, ji kîjan alîyî tê, lê deng belav dibe: Ev teqîn ji alî OASê ve pêk tê û gel gulebaran dikin."* (3)

"Herkes bi her alîyî ve direve û dengê çekan ji hemû alîyan ve dihat, kesî nizanibû çi dibe, îro jî kes nikare bibêje bi rastî wê rojê çi qewimî, ev ne mumkin e, ji ber ku herkes di nav tevlîhevîyeke wisa de bû ku tiştek ne zelal bû û ji vê tarîyê dema ku mirov şîyar dibe, mirov gelek kesên kuştî dibîne, rastî ev bû." Dema ku em jê dipirsin gelo wî bixwe jî, di wê hengameyê de kes kuşt an na? Bi kenekî bê hemdê xwe, çiva dide ku bersiva pirsê nede: *"Tiştên ku ji devê min derneketiye bi min nedin gotin! Ez ji we re dibêjim kesî nizanibû çi dibe û sergêjîyeke mezin hebû, paşîyê jî qewimî, tiştê ku qewimî…Ev çîrok hemû, divê bên ji bîr kirin… "*

Me car din israr kir û me jê pirsî. Kê li navenda bajêr ev bûyer dît û bû şahidê gulebaranê? Piştî bêdengîyeke dûr û dirêj; *"Min ji bîr kiriye!"* Dîsa bêdengî; *"Di bîra min de tiştek nemaye!"*.

Li gel hemû israran jî, me tu agahdarî an jî şahidî, ne ji vî camêrî û ne jî ji gelek kesên din yên ku wê rojê li Oranê ji nêzik ve li cîhê bûyerên bûn û herweha hinek ji wan belkî beşdarî vê roja naletî û barbarîya li hember ewropîyan jî bibûn, negirt. Hinek ji wan ku belkî kêmtir beşdar bibûn, qebûl kirin ku şahidîyê bikin, her wek **Raşîd Salih** ku hingê mamosteyekî ciwan bû. *"Ev hêçbûnek bû, qelebalixek hîsterîk, ku tu tiştek ne di kontrola kesî de bû, belkî hêçbûnek kolektîf û deravêtina heyfgirtina bi salan bû… ez nizanim wekî din bi çi hawayî vê bûyerê bi nav bikim…"* Mamosteyê me yê ku paşê bûye polîs, bi vî awayî çîrokê ji me re dibêje.

Demekê ez li meydana ***Ville Nouvelle*** (Bajarê Nû) bûm, li pêşîya min qelebalixek har û hêç, min hew dît şexsekî fransîyek girt û bi derba kêrê, li ber çavên lawê wî, hûre wî bera ber wî da. Min hêl da ku lawikê biçûk ji wir dûr bixim ji bo ku halê bavê xwe nebîne, lê giş bi ser min de qêrîyan! Ez derhal ji wir revîyam çûm mala hevala xwe, li bûlvar ***Paul Doumer***, nêzî ***Plateau Saint-Michel***. Ji wir, ji balkona qata yekem, min dît ku grupên çar pênc kesî, yên **pîeds-noirs** ji alî cezayîrîyên harbûyî ve dihatin birin. Yên ew dibirin ne leşker û ne jî fedayî bûn (4), tenê qelebalixên hîsterîk û har û dîn bûn".

Hemû şahid yek tiştî dibêjin: Dema ku piranîya xwepêşanderan vekişiyan û zû bi zû vegerîyan taxên xwe, kesên din yên li navenda bajêr mabûn bela xwe di hemû tîpên ku hema hinek bîna "fransîyan" jê bihata, didan. *"Rast e barbarîyeke mezin e, lê mirov nikare behsa 5ê tîrmehê bike, bêyî ku meriv behsa tiştê ku hatiye serê me neke"*, bi vî awayî aciz dibe û dibêje **M. Mokhtar Boughrassa**, 80 salîyê ji Oranê û hê jî li ser xwe. *"Bûrayekî min hebû, di çirîya pêşîn a 1961ê de li Plateau Saint-Michelê, li kuçeya Dutertreyê, di dema xwepêşandaneke **pieds-noirs** (**pê-reş**) de, benzîn lê kirin û bi saxî ew şewitandin. Ev mînakeke ji hezaran yek e.*

*Ji havîna 1961ê û vir de her roj li **Ville Nouvelle**yê, mirîyên me hebûn ku ji alîyê **Pieds-Noirs** ve wek kîroşkan bikujin, dihatin kuştin û avahîyên taxa me dihatin gulebaran kirin. Carna guleyên topan diavêtin taxa me. Rojekê, keçika min a 3-4 salî ku bi keçika cîrana me ya 9 salî re, bi destê hev girtine, li kuçeyê dimeşîyan, keçika cîran ji dûr ve ji alî nîşangirekî ku xwe li jora **Rue Stora** li taxa **Plateau Saint-Michel** veşartibû, bi guleyên dom-dom hate kuştin. Destê wê di destê keça min de bi wî awayî nefesa xwe ya dawîyê da".*

Girseyê bendên li pêşîya kîn û hêrsa xwe teqandin, weke ku kunêrek biteqe

M.Saddek Benkada, ku di navbêna salên 2007 û 2010ê de şaredarê bajarê Oranê bû. Berî vêya jî, ew bi xebatên xwe yên universîter yên li ser dîroka bajarê xwe di dema osmanîyan de hatibû nasîn. Sala 1980ê, bi hevalê xwe **Fouad Soufî** re, li ser hebûna fransîya yên mehên dawîn li bajarê Oranê xebatek tarîxî çêkirin. **M. Benkada** weha şahidîyê dike: *"Mirov bizor dikare bawer bike bi bûyerên ku hatine serê wan û zulma ku cezayîrîyan sala berî 5ê tîrmehê kişandine, ji alîyê din, FLMê jî (Enîya Rizgarîya Neteweyî) gelek caran bersiv dida, lê belê hêzên ku nedihatin muqayese kirin. OASê, ji artêş û hukmên îdarî yên fransî alîkarî digirt, di destên wan de malzeme û çekên bê sînor hebûn. Fedayîyên, bi grupên pênc şeş kesî, belengazan bi tenê debançeyek dibû para wan. Min lîsteya temamê kuştîyên bajarê Oranê yên navbêna 1ê çile û 30ê hezîrana 1962ê bi dest xistin: Ji musilmanan 859 kes, li hember çend kuştîyên ewropî. Bûyerek bi taybeti bi êş ew bû ku di 28ê meha sibata 1962yê de, li meydana **Ville Nouvelle**, du otomobîlên tije bombe û teqemenî hatin teqandin, 78 kes bi awakî barbarî hatin kuştin, laşê yekî ji wan nedihate nasîn, şevek ji şeva remezanê bû, parçeyên laşên kuştîyan li hemû alîyên meydanê û li ser gel belav bibûn. 5ê tîrmehê hinek jî ev dînîtîye, ev gel bû ku salek seranser berî 5ê tîrmehê di bin zulma OASê de dinalîya û ji nişkave wek birîneke bi kem bi carekê de teqîya".(5)*

"Niha, bihêlin em bi xwe tola xwe hilînin"

Li hember vê qelebalixa har û dîn, ku mirin ketibû çavên wan, berpirsîyaran bi temamî kontrol ji dest berdabûn. Berî her tiştî jixwe ev berpirsîyar çi kes bûn? Ev yek ji sebeba mezin ya mezinbûna qetlîamê bû. Ji ber ku wê rojê, li bajarê Oranê kesên ku ji ewlekarîyê berpirsîyar bûn, bê hêz bûn û artêşa fransî di bin fermandarîya **General Katz** de bû, mafê wê yê mudaxeleyê tunebû: Ji dema beyankirina serxwebûnê û vir de yanî ji 3ê tîrmehê û vir de, xwe li ser axa bîyanî hesab dike. Emir bê mehne ne, derketina ji qişleya eskerî qedexe ye; parastina ewlekarîyê di destê cezayîrîyan de ye. Lê belê cezayîrî hîn tu wextê wan çênebibû ku xwe bi rêk bixin û ji vî îşî fam nedikirin. Ji ber wê yekê jî di nav xwe de gelek parçe bûn û li hev nedikirin. Di dema herbê de tenê fedayîyan li bajarê Oranê têdikoşîyan. Di bin fermanberîya du kesan de, ku navên wan, **Sîdî Abdelbaqî**, ew bixwe qûmandarê ***Ville Nouvelle***ê bû, yê din **Sîdî Abdelhemîd** bû ew jî qûmandarê taxên ***Lamur, Médionî, Victor Hugo*** û ***Petit Lac*** bû, ev ciwan bi gelek grupên biçûk organîze bibûn, rastî ew bû ku di şertên dijwar yên dizî û illegal de, dan û stendina grupan gelek zahmet bû û têkilîyên hîyerarşîk baş pêk nedihatin, ji ber wê jî bi wextê re her grupek bi serê xwe dibû grupeke otonom.

"Piştî rawestîna şer, ya 19ê adara 1962yê rewş hîn xerabtir bû: Kesên ku beşdarî soreşê nebibûn "adarî" (navê wan ji tarîxa 19ê Adarê tê) *bi carekê de bûn şervanên mezin!*" bi vî awayî bi acizî fikara dike **M. Mohamed Benaboura**, ku ji alîyê leşkerên fransî ve hatibû îşkence kirin û çar salan di girtîgehê de mabû, berî ku di sala 1961ê de bibe berpirsîyarê FLN yê ***Derb***ê ku taxeke yahûdîyan a li bajarê Oranê bû. *"Derdê mezin, ev kes bi taybetî bûn çeqel û diz, pêxwasên bê kontrol." "Grupa herî xwîndar ya taxa **Petit Lac** bû"* li gor **M. Sûfî**, "*ev tax ji alîyê **Attou Mouedden** ve dihat îdare kirin û kesekî bê wijdan û bê rehm bû, kuştin û şêlandin ji alîyê zilamên wî ve pêk dihatin. Ji nîsana 1962yê û vir de, van kesan riyên mezin qut dikirin û rêwî dikuştin."* Di wê demê de, ALN, efserekî xwe ku navê wî qûmandar **Bakhtî** bû, dişîne

Li vir têlên hesinî ku sînorên taxa misilmanan dîyar dikin û li seranserê bûlvara Paul-Donner û rêya Général-Cérg hatine bi cîh kirin, digihin hev û rêyê digrin.

www.kurdishmonde.org

bajarê Oranê. Li dora wî kêm însan hebûn, lê karê wî ew bû ku kontrola bajar ji destê fedayîyan bigire. **Sîdî Abdelbaqî** hevkarî qebûl kir, lê ne **Sîdî Abdelhemîd**.

Ber bi 5ê tîrmehê, dabeşkirina otorîteyê û şerê ji bo vê hîn bêtir tansîyona polîtik bilind dike, di navbêna şerê desthilat û hukim yê Houarî Boumediene- Ahmed Ben Bella (6) û di navbêna endamên Hukûmeta Muwaqet ya Komara Cezayîrê, (GPRA), qumandar Bakhti yên yekem hildibijêre, yê dûwem jî dibe Sîdî Abdelhemîd. *"Bi kurtayî 5ê tirmehê, bûyer ji taqeta me der çûbûn"*, bi vî awayî dibêje ev camêrê bi şaşik, ku yek ji zilamên nêz ê parastina Bakhtî bû. *Her yek çi ji destên wî dihat dikir. Ez li ser **Boulevard Clémenceau** bûm (tam li navenda bajêr), min hewl dida ku musilmanên harbûyî derbasî taxên ewropîyan nebin, li paş min zilamên min û sîvîlên cezayîrî yên aram, alîkarîya sivîlên ewropîyan dikirin da ku wan bînin nêzî wîlayetê ku polîsê cezayîrî kontrol dikir û ez bi wan bawer bûm. Paşê ev kes bi aramî gîhandin malên wan"*. **M. Sîdî Moueddene**, navê wî yê şervanî **Sîdî Omer** bû û piştî **Sîdî Abdelhemîd** di nav fedayîyan de şexsê duyem bû. Ew di eynî demê de, apê **Attou Moueddene** e: "Ez li pêşîya komîserîya taxa ***Saint Antoine***, li kuçeya ***rue de Tlemcen*** bûm. Cezayîrî ewropî dianîn qereqolê, me alîkarîya wan dikir ku karibin bi ewlekarî li qereqolê bên parastin, ji ber qelebalixîyê dixwest êrişî wan bike, ji ber vê yekê milet bi ser me de diqîrîya û digot: *"Dema OASê êrişî me dikir û malbatên me dikuştin, kesî em nediparastin, hûn jî di nav de, îro dora me ye, me berdin em heyfa xwe hilînin!"*. Li gor **M. Soufi** hinek elemanên ALNê bê ku haydar bikin, cezayîrîyên ku bela xwe di ewropîyan didan, dikuştin.

Piştî nivro ber bi saet diduyê ve aramî hêdî hêdî li merkeza bajêr hukim dibe. Lê li alîyê din, li taxa ***Petit Lac***, bûyer germ dibin. Qismek mezin ji qelebalixê li vir dicivin, li vê taxê bi tenê musilman rûdinên, bi taybetî li hêla başûr û rojhilatê bajêr, ev tax herweha ber bi rojhilat dewam dike û çopa bajarê ***Oran***ê li vir civîyaye. **M. Kader Benahmed** wê demê 14 salî bû. Wê rojê serê sibê, li gel çend hevalan daket meydana **"Place d'Armes"**, piştî gulebarana yekem û şoka destpêkê, ew jî gîhaştin qelebalixê. *"Herkes ber bi **Petit Lac** ve dimeşîya. qelebalix ecêb zêde bibû, kesên mezin bi keviran bera me didan û em diqewirandin, ji bo ku em nebin şahidên operasyonê"*. Kîjan operasyon?

"Diviyabû dosya were veşartin, sûcdar werin dîtin"

Tu kesên ku em bi wan re axivîn, ji me re tiştek negot û tu kesî bi çavên xwe tiştek nedîtibû, lê belê herkesî eynî çîrok bîhistibû: Zilamên, mirovên ekîba **Attou** taxên ewropîya bi erebeyan 'qoleçan' dikirin, digerîyan û ewropîyên ku bi tesadufî diqefaltin, bi zorê dianîn "çoplix"ê û deh kes li wir dikuştin û laşê wan di nav çopê de vedişartin. *"Hela! Ev ne mumkun e!"* dibêje şaşmayî camêrê bi kofî, kesê yekem ku ji me re dibêje ku wî bûyer bi çavên xwe dît, li ser çopê, piştî nîvro. *"Di navbêna saet 15 û 19ê de, belkî deh caran çûm heta **Petit Lac**, (Gola Biçûk), navenda bajêr mişt cenaze bû, divê çareserîyek bihata peyda kirin.Goristana ewropîyan? Di kîjan gorê de? Cîh tune, morg ji berê ve tije bûye. Gotina wê ne xweş e mirov bibêje, lê rastîya wê ew bû ku me çoplix tercîh kir. Bi grupan mirov diçûn, laş top dikirin û danîn Petit Lacê, li wê derê bi du bûldozeran ku ji şantîyeyeke nêzîk revandibûn, vedişartin"*. Gelo çend laş bi vî awayî hatin veşartin? Li Fransayê, ***Pieds-Noirs*** behsa ji 350 heta 5 000 laşên mirovan dikin. Kaloyekî bi xwe bawer û hinekî jî bi hêrs weha digot: "Tew 350 jî, bi temamî mubalexe ye! Her piştî nivro ez dihatim ser çopê û min dipirsî çend kes hatine veşartin? Deh, pênc, sed... Piştî operasyonê, di navbêna sed û pênc yan jî sed û şêst laş hatibûn veşartin."

Evarê ku aramî bi temamî paş de hat, qumandar **Bakhti** bi awayekî fermî ji **General Katz** xwest ku ewlekarîyê bi dest xe û ku sucdarê vê bûyerê bên ceza kirin. Lê belê di vir de sûcdar kî ne? Qelebalixên harûdîn bûyî, tu yê kê ji wan bineqînî û sûcdar şanî bidî, sûcdar tesbîtkirin gelek dijwar e, ne mumkin e. Di vir de **Attou** û çeteya wî dê wek sûcdarên îdeal bên şanî dan. (7)

Eynî êvarê, **Attou** û çend alîkarên wî hatin girtin. Sê rojan bi şûn de bi alîkarîya ALNê, **Bakhti** li taxên *Victor Hugo* û *Petit Lac* dest bi girtinan dike. Di 10ê tîrmehê de gazî çapemenî û rojnameyan dike û bi quretî du sed girtîyan dide nasîn û dibêje: *"Ew ê derkevin pêşberî dadgeha leşkerî, ger sucdar bin, dê hemû bên gulebaran kirin!"*. (8) Bi rastî tu dadgeh çênebûn, ev gumanbar, çil rojan di bin çavan de man, paşê **Ben Bella** ji bo hêza xwe li paytextê, li *Aljê* xurtir bike, emir da û hemû dan berdan. **General Katz** jî bi tenê bi laşên li morgê peyda bûn îdare dike û ji çapemanîyê re beyan dike ku 25 ewropî û 76 cezayîrî hatine kuştin. Hinek ji van ji alîyê elemanên bê kontrol yên OASê, an jî ji alîyê ewropîyên ku xwe diparastin ve hatine kuştin. Hinek ji wan jî di bin piyan de, hinek jî kesên ji alîyê leşkerên fransî ve li ber qereqolan hatine kuştin, yên din jî, ew kesên ku dixwestin ewropîyan xelas bikin, ji alî mîlîtanên FLNê ve hatine kuştin, çi dibe bira bibe dema agahdarîya qetlîama ***Petit Lac***ê tê guhê **General Katz**, general bi tenê efserekî dişîne, paşîyê beyan dide û dibêje: *"Ev tiştên ku tên gotin hemû bê bingeh in û derew in"* (9) çawa mirov dikare bawer bike? *Fransayê xwe ji vî darê ku herdû alîyê wî bi gû ku navê wî "problema cezayîrî" bû, zûtir xelas nekir*, bi vî awayî heyfa xwe dianî, yextîyarê bi kofî. Pêwistî hebû ku hemû sûcdar bihatana dîtin û ceza kirin, selamun aleykum! û herkes vedigere mala xwe! Sûcdarên rastî, civateke harbûyî bû û ji hîsterîya kollektîv muzdarîb bû. Civatek ku şeş mehan her roj pênc kes ji wan dihat kuştin. Ya girîng ew bû ku 6ê tîrmehê, şanî da ku ne hukûmeta cezayîrî, ne ALN û ne jî FLNê li hev kirin û peymanên Evîyanê bi cîh neanîbûn û hurmeta wê negirtibûn. Di vir de kêmasîya hevkarîyê jî derket holê. Li ser vê fikrê, şefên herdû alîyan jî, yanî hem yên general **Katz** û yên **Bakhti** wek hev difikirîn, ji bo vêya jî pêwist bû ku ne gotibana sed û pêncî kuştî hene..."

Dema ku min xwe amade dikir ku ez ji Oranê derkevim, vî şervanê kevin xwest bi min re were heta balafirgehê. Riya me di taxa Petit Lac re derbas dibû, ji ber ku wextê me hebû min jê re got ger bikaribe min bibe cîhê laşên veşartî. Bêyî ku gotinek ji devê wî derê, yextiyarê me derhal dîreksîyon ber bi milê çepê ve şkand û çend sed metre wir de erebeya xwe sekinand. Cîhekî vala şanî min da û got: ***"a va ye li vir e",*** gotina wî di qirka wî de ma û çavên wî sor bûn, wisa di cîhê xwe de sekinî bêyî ku bileqe, kolozê wî jî ji serê wî ketibû.

* Yê pêşî rojnamevan e, yê din şêwekar e.

1 Le Front de Liberation National (FLN), Enîya Rizgarîya Neteweyî, tevgereke siyasî bû û ALN beşê wî yê leşkerî bû

2 (OAS) Di sala 1961ê de, hat damezirandin. Rêxistineke illegal ya leşkerî bû ku ji alîyê pieds- noirs û leşkerên ku ji bo Cezayîra Fransî şer dikirin pêk hatibû. Tê texmîn kirin ku nêzî sê hezar musilman kuştine

3 Wek ku Fouad Soufi dibêje: "Her çiqas tê gotin ku kadroyên OASê, di dawîya meha hezîranê de Cezayîr terk kiribûn û çûbûn Ispanyayê jî, kî dikare garantî bide ku endamên wan berî 5ê tîrmehê hîn li Oranê nemabûn". Ji alîyên din ewropî û yahûdîyên Cezayîrê bi piranîyeke mezin terefdarên OASê bûn û kirinên wan tesdîq dikirin". Cf. Fouad Soufi, "Dîrok li hember bîranînê: Oran, 5ê tirmeha 1962yê" 2002 binêre www.idh-toulon.org

4 Fedayîn, şervanên bajaran, Mucahîdîn şervanên gund û çîya bûn

5 Cf.Saddek Benkada, "Vegera ser bûyerê: Teswîrkirina bîranîna roja 28ê sibatê, li Oranê" 2008. Binêre: www.univ-skikda.dz

6 Serokê Parastina Giştî yê ALNê, Huari Boumediene, di îlona 1962yê de dibe cîgirê serokwezîrê hukûmeta yekem ya piştî serxwebûna Cezayîrê, berî ku li hember serokkomar Ahmed Ben Bella, cûntayeke dewletê di meha hezîrana 1965ê de li dar keve

7 Di dîroka bîranîna bajarê Oranê de, Attou Moueddene, wek kesekî qatil, qesas û nefretkirî hate nasîn. Karê wî yê qesabîyê ev karakterê wî hîn hêsantir dikir. Ev kes di îlona 2011ê de mir, Sîdî Abdelhamid, 23ê îlona 2011ê de, li nexweşxaneyeke Parîsê mir

8 l'Echo d'Oran, 12ê tîrmeha 1962yê

9 Joseph Katz; Rûmeta generalekî, Oran 1962, L'Harmattan. 1993

Wergera ji fransî: Vehbî Aydin

Lêkolînên meyldar, bîra bijarî

Dramaya 5ê tîrmeha 1962yê, ya li Bajarê Oranê, li Fransayê gelekî kêm tê zanîn, ji dervayî ewropîyên penaber yên ku ji Cezayîrê hatine, ev bûyer ji bo bîranînên wan bîranîneke herî esasî ye. Gelek caran vê roja tarî ji xwe re dikin sebeb ji bo bikaribin bibêjin ku "li gel ereban jîyan ne mumkun e". Di reportajên ku li ser ***pîeds-noirs***an (*pê-reş*) çêdibin ev gotin gelek caran tê holê: *"Piştî 5ê tîrmehê li Oranê, me baş fam kir ku ew me naxwazin û divê ku em herin, em terk bikin!"*. (1) Herweha, ji pêncî salan û vir de ye, li Fransayê her ev versîyon tê guhdarî kirin, versîyona ku ji alîyê kesên vê roja tarî jîya bûn, an jî carna ji alîyê kesên ku bi tenê bihîstibûn û bi ser de çîrok li ser tên zêde kirin; herwekî: *"pismamê min ku li wir bû, ji min re bahs kir..."* Di destpêka salên1980yê de, kovara ***pied-noir*** "l'Echo de l'Oran" (Dengê ji Oranê), xebatek bi rûmet bi cîh anî, bîrhatinên vê bîranînê berev kirin, paşê ev berhem wek sê cildan hat weşandin, *L'agonie d'Oran*, (Sekeratên Oranê, Mîratbûna Oranê), di bin berpirsîyarîya **Geneviève de Ternant** de, (édition Gandini, Nice 1985-2001) .(2) Di vî warî de, bi tenê du dîroknas tên nasîn; Jean Monneret û Jean-Jacques Jordi (3). Taybetmendîya wan ew e ku ew ne bi tenê li Cezayîrê hatine dunyayê, herweha bi şêweyekî îdeolojîk parastina ***pieds-noirs*** kirine, wan wek qurbanên her timî yên FLNê dibînin, "erebên" General de Gaulle, çapemenî "bi temamî di destên fikrên çep û anti-kolonîyalîst û yên wek wan de ne". Xebata xwe bi temamî ji çîrokên berhevkirî yên ***pieds-noirs***, an jî ji arşîvên artêşa fransî pêk tînin. Yek ji wan di xwe re nedîye ku here Cezayîrê û guhdarîya çîrokên wan jî bike, ji bo ku bikaribe çavkanîyên xwe û yên cezayîrîyan bide ber hev. Xebatên wan heta nuha yekalî bû, bi tenê tiştên bi kêrî wan tên bi kar tînin, îfade û maneyên şaş bi zanebûn hatine bi kar anîn, bi awayekî sîstematîk dixwazin şanî bidin û vê teorîyê bi kar bînin: *"Ku pieds-noirs mecbûr bûn Cezayîrê terk bikin"* an na *"yan valîza wan, an jî cenazê wan dê bihata"*. (4) Halbûkî, piştî du hefteyên destpêkê ku fransî bajarê Oranê bi lezûbez terk dikin, paşê ev koçberî gelek eşkere kêm bû. "Ji meha tebaxê pê ve, hîsîyeta ewlekarîyê bi temamî bi paş de hatibû", Guy (Gî) Bonifacio bi vî awayî şahidîya xwe tîne bîra xwe, ku tu caran bajarê ku lê çêbibû, terk nekir. Adara 1965ê, li bajarê Oranê hîna ji bîst hezaran zêdetir ***pieds-noirs*** peyda dibûn.

P. D.

1 Binêre: Wek mînak Gilles Pérez, les Pieds-noirs. *Dîroka Birînekê*, 156 deqîqe, weşana yekem li ser France-3 18/11/2006

2 Du çîrokên din yên bîranînê lê zêde dibin: Gérard Israël, Le dernier jour de l'Algerie française,-*Roja Dawîn ya Cezayîra Fransî*, Robert Laffont,Paris, 1972, û Alain-Gerard Slama, Oran, 5 juillet 1962. Le massacre oublié", -Oran, 5ê tirmehê 1962. *Komkujîya Jibîrkirî*. l'Histoire, Paris, no 231,1999

3 Jean Monneret, La tragédie dissimulée, Oran, 5 juillet 1962, *Trajedîya Veşartî*, Oran, 5ê tirmehê 1962. Michalon, Paris, 2006, û Jean-Jacques Jordi, un silence d'Etat, *Bêdengîya Dewletê*, Soteca, Paris, 2011

4 Pour une étude critique de cette théorie, voir Ni valise ni cercueil. Les pieds-noirs restés en Algérie après l'indépendance,- *Ji bo xabeteke rexnegirîya vê teorîyê, binêre "ne valîz, ne jî cenaze (tabût), pê-reşên ku piştî serxwebûnê li Cezayîrê mane,* Actes sud, Arles, 2010



Lojmanên li navenda bajarê Oranê (rue d'Arzew, rue Alsace-Lorraine, Front de Mer, Place d'Armes), cîhê ku avahîya şaredarî û tîyatro lê peyda ne. Ev tax her tim ew tax bûn ku ewropî lê dijîyan. Li taxên hîn dûrtir, hinekî tevlihevî hebû. Ji havîna 1961ê û pê de zordestîyeke dijwar ji alîyê OASê ve li hember cezayîrîyan dest pê kir û neheqîyên mezin çêbûn. Taxên Navenda -Bajêr, Saint-Antoine, Plateau Saint- Michel, Gambetta, Saint-Eugene, bi demê re ji sedî sed dibin taxên ewropî û yahûdîyan. Li gel wê taxa Ville Nouvelle (Medîna Cedîda, navê bi erebîya Oranî), Lamur, Médionî, Victor Hugo û Petit Lac, ji sedî sed bûn taxên musilmanan. Di destpêka 1962yê de, dora Ville Nouvelle, taxa musilmanan ya herî nêzî navenda bajêr, bi temamî bi têlan hatibû girtin. Hemû kesên ku derdiketin û diketin hundir ji alîyê leşkeran ve dihatin kontrol kirin.

www.kurdishstudies.net

Çalakîyên bi tehlûke yên rêxistineke kêm tê nasîn

Înternasyonala Sosyalîst an jî tu tişt nekirina li Amerîkaya Latîn

Maurice Lemoine*

Sala 1951ê Înternasyonala Sosyalîst (ÎS) çalakîyên xwe ji nû ve bi rêk û pêk kirin da ku "gelan ji girêdanan wan ya bi kesên navgînên hilberandinê di destê xwe de digirin, azad bike". Şêst salan piştre birêveberên wê tercîh dikin ku behsa "birêkûpêkkirina adil a bandorên globalbûnê yên zirarê didin" bikin. Jirêderketine hêdî ya ku helwêsta van "sosyalîstan" li hemberî hempîşeyên wan ên latîno-amerîkî nîşan dide.

Dema axaftina xwe ya destpêkê ya Konseya Înternasyonala Sosyalîst (ÎS), ya ku li avahîya Rêxistina Hevkarî û Pêşketina Aborî (OECD) ya pir zêde lîberal, 15ê çirîya paşîn a 2010ê pêk hatî, sekreterê yekem ê Partîya Sosyalîst (PS) a fransî **Martine Aubry** kêfxweşîya xwe venaşêre: "*Ez hez dikim nexasim silavê li serokê me* ***Giorgos Papandreou*** *bikim û ji ber encamên di hilbijartinên herêmî yên Yewnanîstanê de pîrozbahîya wî bikim* [rêjeya tevlînebûna hilbijartinan rekorek bû, ango % 53]. *Di çarçoveyeke zehmet de ev teşwîq û serkevtineke ku wêrekîyeka siyasî ya hêjayî heyranîyê xelat dike.*" Em dizanin çi hat serê birêveberê Tevgera Sosyalîst a Panhelenî (PASOK) û "siyaseta aborîya tedbîrên hişk a adil" a ku wî qaşo li ser welatê xwe ferz dikir. Em wekî din bi çarenûsa gelek endamên navdar ên vê rêxistina sosyal demokrat jî dizanin ku miletê wan li ser wan ferz kir; li vir navên çend ji wan binivîsin, Laurent Gbagbo, Zeynel Abidîn Bin Elî, Husnî Mubarek.

Bi şaşî û lêkêmkirineke evçend a analîzê û awayekî bi tenê xuyayî yê likarbûnê, gelo bi rastî jî mirov matmayî dimîne ku ev meclîsa bijarte ya "sosyalîst" tevgerên ku Amerîkaya Latîn ji berîya deh salan ve ji binî ve dihejînin û serûbinîhev dikin, bi tevahî nebîne.

7ê kanûna 2010ê li Brukselê, portreyek û navek li ser derîyê "Altierro Spineeli" yê Parlemana Ewropayê hatiye daliqandin, bûye kemer: Ev portre û nav ê Guillermo Fariñas e, sêyem muxalifê kubayî ye ku di nav heşt salan de **Xelata Sakharov** a ji bo Mafê Mirovan û Demokrasîyê wergirtiye. Li hemberî vê bêyî ku reklam hatibe kirin, bi tenê li amfîteatrekê, nêzî deh parlemanterên Parlemana Ewropayê û asîstanên parlemanteran hatine guh bidin sendîkavan û parazvanên mafê mirovan ên ji Kolombîyayê hatî.

Darbeya werçerx ya eskerî li Şîlîyê

Şahidî û îfadeyên wan dikin ku girîzok bigirin bedena mirovî: Ji dema destpêka berî çar mehan a desthilatdarîya **Juan Manuel Santos** (kevne-wezîrê bergirîyê yê serokdewletê berîya xwe Alvaro Uribe) ve di navê de sîhûneh sendîkavan û duwanzdeh milîtanên Qutba Demokratîk a Alternatîf (Polo Democrático Alternativo-PDA) jî gelek kes hatine qetil kirin. Sosyal demokratê danîmarkî **Ole Christensen** agahîyan lê zêde dike: Tîrmeha 2010ê tevî parlemanterê *Partîya Karker a Brîtanî* **Richarg Howitt**, ew jî hazir e, ew bi rêxistina ***Justice for Colombia*** re çûye cîhekî bi xembarîya xwe navdar, La Macarena. "*Em heta bi gorên komî çûn. Bêtirî du hezar kesan* [kesên ku artêşê û paramilîteran kuştî] *li wir hatine veşartin. Divê em ji Peymana Bazirganîya Serbest* [TLC] *re ya ku Yekîtîya Ewropî û Kolombîya li ser hevdîtinan pêk tînin, bibêjin na.*" Bi tenê dengekî wê siyaseta Bogatayê biparasta, dengê nûnerê Partîya Sosyalîst a Karker a Spanyayê (PSOE) Emilio Menéndez del Valle: "*Hûn bawer dikin ku hukûmetek bikaribe tevahîya pirsgirêkan di nav sê mehan de çareser bike. Heke tevahîya welatekî bi awayekî girseyî* [% 55.59ê hilbijêran neçûne ser sindoqan] *dengê xwe dabe Santos, divê mirov rêzê jê re bigire!*"

Ev hersê parlemanterên Parlemana Ewropayê yên ku girêdayî rêxistin û partîyên endamên Înternasyonala Sosyalîst in, bi awayekî eşkere dengê saza xwe eyar nekirine û li hev neanîne. Şêwirmendê Çepa Yekbûyî ya Ewropî/ Çepa Kesk a Bakurî (GUE/NGL) (1) yê belçîkî Paul-Emile Dupret vê civînê û gelekên din tîne bîra xwe û dibêje: "*Di nav koma xwe ya parlemanteran* [Partîya Sosyalîst a Ewropî, PSE] *de Christensen û Howitt bêtir di tevgera dijber de ne. Ez pê bawer nînim ku piranîyek li dijî mohrkirina TLCekê fikra xwe rabigihîne. Serokê komê yê alman Martin Schulz* [Partîya Sosyal- Demokrat- SPD] *destekê dide peymanê. Jixwe PSOE bê şert destekê dide!*"

Bêyî ku em dakevin kûrahîyên binê dîrokê, dê bê bîra me ku Partîya Sosyalîst a (PS) Şîlîyê ya sala 1933yê ji alîyê **Salvador Allende** ve hatî damezirandin, wê red bikira bi ***IS***yê re bibe yek û weke sedem jî rexne li "*helwestên wê yên konformîst ên di nav sîstema demokratîk a bûrjîwaya kapîtalîst*" girtibûn. (2) Di dema şerê sar de ev pirs bi rastî nedihate pirsîn: Dema ku mirov herêmê weke herêma bandora Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê binirxîne, ***IS*** nakeve nav serpêhatî û macerayên bi tehlûke. Endamê wê demê yê sekreterîya têkilîyên derve yê Beşa Fransî a Înternasyonala Karker (SFIO) Antoine Blanca lê diponije "*li ser deqên ku ji desthilatdarîyê xistina Jacobo Arbenz li Guatemalayê ya sala 1954ê şermezar dikin, tu tişt li bîra min nîne. Deh salan paşê dema ku min mafê axaftinê xwest da ku behsa desttêwerdana deryavanên* amerîkî *ya li Saint-Dominque bikim, Guy Mollet çavên xwe beloq kirin!*"

Di wê navê de şoreşa kubayî (1959) dij-împeryalîzm xistibû navenda nîqaş û guftûgoyan. Lê belê encamên wê yên girîng çênebûn: "*ISyê bi awirekî elaqedar nêrî, lê di dawîyê de li zêde dûr nêrî* ." Heta 11ê îlona 1973yê. Ji desthilatdarîyê xistin û kuştina Salvador Allende li cem sosyalîstên ewropî bû sedema trawmayeke weke ya şerê navxweyî ya Spanyayê xurt; Blancayê çend rojan piştî *derbê* li balefireke ISyê şandî suwarbûyî, "*piştgirîyeke hestbar û keşifkirina cîhaneke nas nedikirin*" tîne bîra xwe. Li Viña del Marê çû serdana gora serok *compañero*, piştre ew ji welêt kirin der. "*Li hemberî Washingtonê ev dozeke hêjayî navê wê bû, Înternasyonaleke ku heta hingê hertişt dikir ku xwe weke ku stratejîya amerîkî û ya NATOyê* [Rêxistina Peymana Bakurê Atlantîkê] *qebûl kiriye, nîşan bide.*"

Desteka Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ya ji dîktatoran re ji hingê û şûn ve xala sereke lihevnekirinê ya nifşekî sosyal demokratan –**Willy Brandt** (Almanya), **Olof Palme** (Swêd), **François Mitterrand** (Franse), **Bruno Kreisky** (Awûsturya), lê belê herweha **Mario Soares** (Portûgal) yan jî **Felipe González** (Spanya)– bi Amerîkaya hevgir re bû. Li alîyên xwe partîyên reformîst ên van rejîmên otorîter li nav welatên bipêşketî de li hevgiran digerin. Têkilî zêde dibin. Civîna pêşî ya fermî nîsana 1976ê li ser vexwendina serokdewletê Venezuellayî **Carlos Andrés Pérez** û partîya wî Çalakîya Demokratîk (AD) li Karakasê pêk hat. *"Yekem konferansa herêmî ya ÎSyê ji bo Amerîkaya Latîn û Karaîban"* li Saint-Domingueê adara 1980yê pêk hat û wê bibûya nîşana li herêmê xistina dewrê ya vê tevgera siyasî.

Awayê likarbûna "gendelî û bertîlxwurîyê"

Di nav bîstûneh rêxistinên herêmî yên hingê de ji bo Nîkaraguayê Bereya Sandînîst a Azadîya Neteweyî (FSLN), ya ji sala 1978ê ve weke endam qebûlkirî, tevî ku hingê çek li dest ji bo ku dawîyê li desthilatdarîya **Anastasio Somoza** bînin şer jî dikirin– **Fidel Castro** weke serokê halêhazir ê Tevgera Welatên Bêalî hat vexwendin. Û ewropî jî "alî digirin": Hebûna partîyên "bira" di nav Bereya Demokratîk a Şoreşger (FDR) a li Salvadorê de, di nav Bereya Demokratîk a li dijî Zilmê (FDCR) a li Guatemalayê de û di nav Bereya Welatparêz (FP) a li Hondurasê de – ku ji bo herduyên pêşî xwedî şaxekî siyasî û baskekî serhildêr bû– dikir ku di rastîyê de ew destekê bidin şerê çekdarî.

Sala 1981ê li Fransayê, Mitterrand tê qesra serokkomarîyê ya li Elysée, gula di mista destî de. Di bin bandora **Lionel Jospin, Régis Debray** (wezîfedarê erkan li serokkomarîyê) û **Blanca** (ku wê sala 1982yê weke sefîrê seyar li Amerîka Latîn bihata wezîfedar kirin), Parîs li herêmeke ji bo Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê pir nazik, nav di xwe dide. 28ê tebaxa 1981ê danezana franko-meksîkî ya li ser nûnertîya muxalefeta salvadorî –baskê wê yê çekdar jî di nav de (3)– tesîreke girîng kir. Mitterrand sempatîya xwe ya ji bo sandînîstan venaşêre; têkilîyên bi Kubayê re xurt û biîstîqrar in. Devê wî ji kêfa ji hev Blanca dibêje "*li ser navê ÎSyê û bêyî ku haya Washingtonê jê hebe, ji min hin "derb" hatin, weke pêşîlêgirtina qerqeşûn û alozîyeke di navbera Kostarîka û Nîkaraguayê de!*".

Tevî zivêrbûna **Ronald Reagan** jî, tezên Înternasyonalê, ango çareserîya siyasî ya şerên çekdarî, xwedî giranîya dîyarker bûn. Serokdewletê Kostarîkayê **Oskar Arias** plana aştîyê ji bo Amerîkaya Navîn pêşnîyaz kir, vê yekê jî kir ku sala 1987ê xelata Nobelê bistîne. Kevne gerîlla **Miguel Angel Sandoval** ku di vê demê hemûyî de endamê Komîsyona Siyasî Dîplomatîk a ya Yekîtîya Şoreşger a Neteweyî ya Guatemalî (URNG) bû, wan deman weha tîne bîra xwe: "*Tevgera me timî di nav ÎSyê de qadeke ku îhtîmal e bi kêrî armancên me were didît: Hevdîtin û lêgerîna aştîyê. Jixwe bi vî rengî hevdîtina me ya pêşî bi hukûmetê re bi saya PSOEyê li Madrîdê pêk hat. Lê belê me timî pê dizanî û em bîrewer bûn der barê cihêtîyên di navbera partîyên hingê de yên weke swêdî, fransî, spanî û yên reformîsttir yan jî bi awayekî zelal rastgirtir.*"

Ji dema civîna li Saint-Domingueê û vir ve, cihêtîyan xwe da der. Hin endamên "latîn" ên ÎSyê –Partîya Azadîya Neteweyî (PLN, Kostarîka), AD (Venezuella), Partîya Şoreşger a Domînîkî (PRD) û hwd.– xwe ji bandor û mohra ewropîyan rizgar dikin. Neku weke van, hinên din hene ku kok û rîşên xwe yên dûr di nav marksîzmê de nakin, bi ti awayî kapîtalîzmê naxin ber lêpirsînê, di gelek rewşan de jî xwe bi awayekî hişk weke dijkomunîst dîyar dikin. Bi vî rengî birêveberê Çepa Demokratîk a Ekwatorî (ID) **Rodrigo Borja** diwêrabû bibêje "*têgeha çîna civakî bi xwe jî li Amerîkaya Latîn pir cihê nîqaşê ye.*" (4)

Kêm reformîst in, ew [endamên ÎSyê yên latînî] ÎSyê bi kar tînin, da ku dema ku dîktatorî ketin, li hemberî demokrasîya xirîstîyan xwedî avantaj bin û ji ber ku haydar in ji hêza aborî ya welatên ku hevalên wan ên li alîyê din ê Atlantîkê bi rê ve dibin, yan jî wê di demeke nêzîk de bi rê ve bibin; ew hesabê sûdên dikarin ji vê yekê bi dest bixin, dikin. Sala 1999ê **Porfirio Muñoz Ledo** yê meksîkî (Ji Partîya Şoreşger a Demokratîk, PRD) gazinên xwe bi dengekî bilind derdibire: "*Înternasyonala Sosyalîst bi awayê kişandina mêz û meyla nasan dixebite. Hin partî tên vê deverê ji bo ku yeko yeko diçin ber destê ewropîyan, weke ku bi çîna jor re bidin û bistînin.*" (5)

Di Komîteya ÎSyê ya ji bo Amerîkaya Latîn û Karaîban (SÎCLAC) ya sala 1980yê damezirandî de hem FSLN, hem jî Yekîtîya Sivîl a Tunrew (UCR) a pir navendparêz a Arjantînê hene; hem PSya Şîlîyê (sala 1996 ji nû ve bû yek) ya ku tevî Xirîstîyanên Demokratîk hukûmet e û hem jî Partîya Şoreşger a Sazûmanî (PRI) a meksîkî, ya ku bi awayekî têra xwe kêm demokratîk ji heftê salan û vir ve desthilatdar e, hene. Di navê de Partîya Lîberal (PL) ya kolombîyayî jî heye ya ku modela neolîberal da dest pê kirin (1990-1994), ya ku di dema hukûmetên wê de rêxistina çepgir Yekîtîya Welatparêz hat tine kirin (1986-1990) û ya ku Uribe heta sala 2002yê endamê wê bû. (6)

Xem nîne. Bi zêdekirina endametîyên Înternasyonalê, sosyalîstên Ewropayê "qada bandora xwe fireh dikin". Bi heman riyê bi birêveberîya herikî nav kadroyên lîberal re û bi hewldana başkirina wê heta mumkin e, ew berjewendîyên derdorên karsaz û sermayeyê yên ewropî teşwîq dikin.

Civîna Konseya ÎSyê ya li 25 û 26ê hezîrana 1999ê li Buenos Airesê; Felipe González dihejije: "*Berê sosyalîzm pir hişk û dewletparêz bû, lê belê sosyalîzma demokratîk timî bazar qebûl kiribû, ya ku di rastîyê de tevî demokrasîyê ferên cotekî ne.*" (7) Tevî ku "*newekhevîyên trajîk ên ku dinya ji destê wan dike nalenal*" rûreş dike jî, danezana encamê vê pêşnîyazê dike: "*sûdgirtina ji globalbûnê*" ji bo bidawîkirina bêkarîyê, birçîbûnê û bêderfetîyê. (8) Kurt û kurmancî, **Leonel Brizola** yê brezîlî (Partîya Demokratîk a Karkeran-PDT) deqê weha şirove dike "*ewqasî giştî ye ku hem dikare li piyê çepê were û hem jî li yê rastê.*" (9) Bi awayekî zêde li ber çavan nekeve (?), paragrafeke kurt behsa mijûlbûna ÎSyê dike beramberî "*beridîna pêvajoya siyasî ya li Venezuellayê* [û beramberî] *siyaseta dijberbûna misêwa ya hukûmetê bi otorîteyên bicihbûyî re*". Hingê serokdewlet Hugo Chavez hê nû ... şeş mehan desthilatdar bû.

Merasîmeke bi heman rengî bi qasî li Konseyan (tevahîya partîyan beşdar

www.lemondediplomatique.org

dibin) serdest e, ewqasî jî li civînên herêmî yên SICLACê serdest e. Kevne alîkara serokê ÎSyê **Margarita Zapata** (FSLN) bi girnijîn dibêje "*divê mirov du rojên ehmeqbûna bi tevahî ya guhdarîkirina çend serokdewletan, yan jî serok partîyan derbas bike, axaftinên ku bi awayekî giştî ji alîyê şêwirmendên wan ve hatine amade kirin û pirî caran dema ku têne ser dika axaftinê pê dihisin, bi zehmetî dixwînin.*" Blanca vê daxuyanîyê temam dike: "*Gurzek ji peyvên pûç û vala, tijî ji niyetên baş, ku ji wan bi tu awayî ti encam dernakeve, tu ber û alîyî li pêşîya mirovan ferz nake; herkes vedigere quncika xwe bêyî ku der barê rewşê de xwedîyê fikreke teqeztir be.*"

Yekane fêdeya van foruman çi ye: "*Hevdîtinên şexsî yên di navbera du kesan de û hevhimbêzkirina bi dostên kevin re hene*" (Blanca); "*em têkilîyan datînin û berîya hertiştî hevalan dibînin*" (Zapata). Jixwe kesê pê nizane, nîne "dijminên dostên min, dijminên min in".

Piştî ku 1ê çileya 1989ê Carlos Andrés Pérez –yê bi navê CAP– ji nû ve bû serokdewletê Venezullayê, Gonzálezê spanî bi kelecan dibêje: "*bi dayîna biryarên ku bi bawerîya min wê werin dayîn, welat bi taybetî dikare xwe li ser lingan bigire.*" Te baş dît "rêhevalo"! CAP ji riya xwe gerîya, çû ser xeta lîberalîzmê û bi Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) re li ser sererastkirinên bunyewî hevdîtin kirin, CAPî bi vî awayî kir ku miletê wî bi carekê birçî bimîne. Gelê Venezuellayê 27ê sibatê serî hilda, vê serhildanê di dîrokê de navê xwe bi *Caracazo* girt.

Bi hovîtîyeke berê nedîtî, bersiv û êrişa desthilatdarîyê bû sedema mirina qedera sê hezar mirovan. Bextê partîya CAPî Çalakîya Demokratîk (AD) ji yê Civata Destûra Demokratîk (TDD) xweştir bû, lewra ÎSyê *piştî* zexta tevgera gel a çileya 2011ê partîya serokdewletê tûnisî **Bin Elî** wê bikira der, lê belê tu tişt bi ADê nekir. Sala 1993yê piştî ku ji ber bertîlxwarinê ji wezîfeyê hat bi dûr xistin, Buroya Înternasyonalê wê daxwuyanîyek ji CAPî re bişanda û jê re wê behsa qedir û dostanîya wî bihata kirin. Rast e ku di dema dewra xwe ya pêşî ya desthilatdarîyê de, "*ew merd bû bi dostên xwe yên ewropî re: Bi awayekî giştî herkes pê dizane ku di bin birêveberîya González de PSOEyê bi awayekî berfireh ji 'piştgirîya" wî ya malî sûd wergirtiye*". (11) Ev yek wê Yarbay Chavezê sibata 1992yê li hemberî "*demokrasîya neadil û bertîlxur*" rabûbû, sempatîk nake.

Weke li Venezuellayê, birêveberên partîyên "latîn" ên ku endamê ÎSê bûn ên ku di salên 1980 û 1990ê de bûn desthilatdar –Arjantîn, Bolîvya, Brezîlya, Şîlî, Ekwator, Meksîka, Panama û hwd.– xwedî siyaseteke bi rastî ya civakî ne: Ew serê xwe bi pêdivîyên baş dinixumînin û baş xwarinê diêşînin. Bi kêmkirina desttêwerdana dewletê û taybetkirina bi lez û bez, bi hevkarîya Washington, Bankeya Cîhanê û IMFê, kir ku dawîyê bawerî êdî bi wan hew were, heta ji desthilatdarîyê werin xistin. Di encamên têkoşînan an jî tevgerên gel de lîderên nû derdikevin holê: Chávez (Venezuella), Luiz Inácio Lula da Silva (Brezîlya), Evo Morales (Bolîvya), Rafael Correa (Ekwator).

Desteka ji darbekarên venezuellayî re

19 û 20ê tîrmeha 2002yê SÎCLAC li Karakasê civîya, mêvandarên wê birêveberê ADê **Rafael Angel Marín,**

Mehmet Latif Saglam: **Rêza batirsokan**, li ser tuwalê boyaxa akrîl, 100 x 100 cm

Antonio Ledezma (Hevgirtina Milletê Wêrek –ABP) û gerînendeyê rojnameya bi navê *El Nacional* **Miguel Henrique Otero** yên venezuellayî ne. Di astên cihê de hemû tevlî hewldana darbeya eskerî ya li dijî **Chavez** a 11ê nîsana bihurî bûne. Şêwirmendê serokdewletê Venezuellayê yê hingê **Maximilien Arvelaíz** dibêje: "*Dostên di nav PRI û FSLNê de ez hişyar kirim, min jî pêwendî bi sekreterê giştî yê ÎSê **Luis Ayala** yê şîlîyî re danî û wî hevdîtinek bi vî şertê li jêr bi Chavez re qebûl kir: Beşdarên ku hez dikin wê 'li ser navên xwe yên şexsî' biçine wir. Dotira rojê bi rastî jî çendek hatin, lê belê Ayala bi xwe di kêlîya dawîyê de qulipî, nehat.*"

Der barê civîna xwe de SICLACê daxuyanîyek da çapemenîyê, di wê daxuyanîyê de wê dida zanîn ku wê biryar daye "*destekê bide Çalakîya Demokratîk û Koordînasyona Demokratîk di seferberî û bergirîya sîstema demoktratîk û sazîyê wê de*" –ango: Destekê bide darbekaran! Jean-Jacques Kourliandsky ê ku weke çavdêrê PS a fransî li civînê amade bû, wê demê tîne bîra xwe: "*hindik mabû ku min bikira sekreterê giştî yê ADê êrişî min bike, lewra min protesto kir: Encamên civînê hatibûn nivîsîn û di çapemenîya muxalif a venezuellayî de* berîya *kar dest pê bikin, hatibûn weşandin!*" Paşê wî milên xwe daweşandin: "*di rastîyê de ti nirxê wan nîne.*" Gelo şaşîtî bû yan korî? Ew daxuyanî hê jî weke hemûyên din ên piştre, li ser malpera fermî ya ÎSê ne (12), yekser danadera van hersê partîyên venezuellayî yên ku endamên ÎSê ne –AD, Tevgera ber bi Sosyalîzmê ve (MAS), Podemos–, hemû jî bi awayekî tund dijminên şoreşa bolîvya ne.

Kevneşêwirmendê sefereta Bolîvyayê li Parîsê **Alfonso Dorado** digirnije, eşkere jî vê dide xuya kirin û dibêje: *"Înternasyonala Sosyalîst? Paz Zamora alîkarê serokê wê bû. Di bîra hevpar de ev bi roleke girîng radibe..."* Paz Zomora birêveberê Tevgera Çep ya Şoreşger (MIR) bû, sala 1989ê bi kevne-dîktator **Hugo Banzer** re li hev hat da ku bibe serok. Sala 2002yê ji bo ku pêşîyê li bûna desthilatdar a Morales û Tevgera wî ya *Ber bi Sosyalîzmê* ve (MAS) –divê mirov wê bi partîya hevnav a li Venezuellayê re tevlîhev neke– bigire, ew bû hevgirê **Gonzalo Sánchez de Lozada** yê multîmîlyoner yê ku hat hilbijartin û piştre bi teqîneke civakî ya çirîya pêşî ya sala 2003yê ji desthilatdarîyê hate bi dûr xistin. MASa bolîvyayî ne endama ÎSê ye, Partîya Sosyalîst a Yekbûyî ya Venezuellayê (PSUV) jî, Hevgirtina Welêt a Correa, FMLN a salvadorî û URNGa guatemalî jî ne endamên wê ne; jixwe tu kesî ji wan nexwestiye bibin endam jî.

Bi tenê xewneke Înternasyonalê heye: Bike ku Partîya Karker (PT) a Brezîlyaya xurt û nîşana siyaseta çep a latîn ***Lula da Silva*** bike endama xwe. Lê belê PTê hêlîna xwe li devereke din danîye. Sala 1990ê tevî **Fidel Castro** wî ***Foruma São Paulo*** damezirand, ku hem partîyên nerm (herweha endamên ÎSê) hem jî rêxistinên di nav şerê çekdarî de pijiyayî, partîyên komunîst (ya Kubayê jî di nav de) û gelek partî û rêxistinên ji wan veqetyayî dihewîne. Endamê birêveberîya neteweyî ya PTê **Valter Pomar** rave dike: "*Li Amerîkaya Latîn ji bo rabûna li ber neolîberalîzmê helwesteke vekirî û pirreng divê, herweha ev helwest divê krîza komunîzm tê re derbas dibe û ya derbê li sosyal-demokrasîyê dide jî li ber çavan bigire. Tevî vê jî, têkilîyên me yên bi ÎSê re baş in...*" Lê belê ji dûr ve.

Potugalî ne tê de, sosyal demokratên ewropî di nav hevgirtinên xwe yên berê de çikîya ne, ji vê Amerîkaya Latîn a nû tu tiştî fêm nakin, ya ku diwêre behsa "sosyalîzma sedsala 21ê" bike, li riyeke demokrasîya "tevlîker" digere, carinan şaşîyan dike, bi pêş ve diçe, bi paş ve tê, lê belê di mijara civakî de destketîyên girîng û bipêşketinan bi dest dixe.

Weqfa **Friedrich Eber**, SPDa alman xwedîya derfetên pir mezin ên malî ye, lê belê serê xwe bi herêmê re naêşîne. Partîya Karker a Brîtanî "ya bi rastî" ya ku **Blair** ew li tebeqeyên tenik parçe kir, niha weke eşîra li ber tinebûnê ne. Ji Îtalyayê bi xwe deng bi tevahî qut bûye... Arvelaíz bi henekî dibêje "*Massimo d'Allema* [Partîya Demokrat] *hat Karakasê. Ew pir şidyayî û bi stres bû. Me kir ku bi Chavez re rûne. Dema ku derket, bi kêf bû û bi kelecan got 'ev ciwanîya min tîne bîra min...*"

Dupret vê tesbîtê dike ku li Parlemana Ewropayê "*cihê ku ji gelek salan û vir ve, peymanên pevguherîna serbest mijara sereke ya rojevê ye, piranîya koma sosyalîst zêde pêşverû nîne. Weke mînak me tu caran nekarî bi wan bidin qebûl kirin ku Hondurasê* [sala 2009ê darbeyeke eskerî lê pêk hatibû] *bînin rojeva parlemanê.*" Li hemberî vê sala 2004ê serokê PSEyê **Enrique Barón Crespo** yê spanî wê pêşnîyaz bikira ku serokdewletê Kolombîyayê **Uribe** were vexwendin. Dema ku 10ê sibatê Uribe axivî, *"GUE/NGL, kesk, hin lîberal û gelek sosyalîstan bi terikandina salona axaftinê, Barón Crespo rûreş kirin. Lê spanîyan ev nekir!"*

Der barê mijara Amerîkaya Latîn de Madrîd di nav Yekîtîya Ewropayî de xwedîya bandoreke mezin e. Spanya Kubayê –kolonîya wê ya dawî– weke Galîsya yan jî Endulûs be, ji nêz ve dişopîne, heta Spanya hema hema yekane welat bû ku daxwaza normalkirina têkîlîyên giravê bi YEyê re dikir. Heta ku di çirîya paşîn a sala 2011ê desthilatdarî ji dest da, PSOE di tevahîya hevkarîyê de bi rolekî girîng rabû. Doradoyê bolîvyayî îşaret pê dike ku "*bi tu awayî elaqeya wê bi nêzîkbûneke siyasî re nîne*".

Li Parîsê "cehaleta lenetî"

Li Parîsê 22ê çirîya pêşîn a 2010ê coş û peroşeke mezin li ser rêya Solférino heye: Berdevkê PSê **Benoît Hamon** da zanîn ku ew "xwe amade dike" biçe Venezuellayê û li wir bi serokdewlet Chavez re rûne, çima na? Ew tîr û brûskên baskê rastê yên partîyê bi ser xwe de dikişîne, hevalbendên **Strauss-Kahn** hewl didin wî bidin erdê.

Bi ezmûn û tecrûbeya xwe ya weke sefîrê Bolîvyayê, Dorado digihêje encameke hişyar: "*Bi **Ségolène Royal** û **Martine Aubry** re pêwendîyên me yên ku me dikarîbû weke serpêhatîyan behsa wan bikin hebûn, lê PSyê tu caran elaqeyeke taybet nîşan neda da ku tiştê li welatê me diqewime nas bike. Me hewl da pêwendîyên xwe xurttir û zexmtir bikin, lê tu encam ji vê hewldana me bi dest neket; ango hîç derfeta me çênebû ku em sosyalîzma sedsala 21ê, yan jî tecrûbeya întegrasyonê ALBA* [Hevgirtina Bolîvarî ya Gelên Amerîkaya me] *bi wan re nîqaş bikin*. (13)" Rast e, ALBA dema mirov bi awirekî neolîberal lê binêre, bi tevahî bi berjewendîyên aborî û jeopolîtîk ên ewropîyan û herweha yên amerîkîyan re nakok e.

Bêguman me şandeyên asta bilind ên PSê li Forumên Civakî yê **Porto Alegre** ên sala 2002 û 2003yê de dîtin: Lê armanca şandeya PSê ew bû ku li hemberî alter-globalîstan xwedî avantaj bin û şelafîyê ji Brezîlyayê re bikin. Di dema kampanyaya xwe ya hilbijartinan de Royal wê bi awayekî eşkere xuya bike ku li cem **Cristina Fernández de Kirchner** û **Michelle Bachelet** amade bû –ku yek ji wan sûdên wê yên siyasî wê bibûya destûrdayîna siyaseta rasta hişk careke din bibe desthilatdar di bin nîşana ... dewamîbûnê de.

Asîstanê parlemanterîyê yê **Henri Emmanuelli**, **Roberto Romero** bi hêrs dipeyive: "*Ev bîst sal in ku em mirovên ku serê xwe bi Amerîkaya Latîn diêşînin, dişînin civînên SICLACê û heta niha jî tu tişt nekirine, tu tişt. Ne ji ber ku di nav PSê de dijminahîyeke ji bo filankes û bêvankes heye. Mesele nezanîneke çepelî ye! Tiştê ku xwe ji bo agahdarîyê disipêrinê asta **Le Mondeê** yan jî ya **La Libérationê** ye ku tercîhên wan ên edîtorîyal ên derbarê Amerîkaya Latîn dişibe dezînformasyonê.*"

Hem ji bo **Romero** û hem jî ji bo piranîya kesên em bi wan re peyivîn, "*ÎS, ev qaqilkê vala, bêguman çêtirîn buroya gerûgeştê ya dinyayê ye, û têra xwe jî rehet û xweş e... Lê belê tu tişt jê dernakeve!*" Gelo ev yek vê çendê teqez e? Ji civînên SICLACê û ji partîyên endamên wê yên ku bawerî êdî bi wan hew tê, daxuyanîyan didin û ÎS van daxuyanîyan diweşîne. Li Amerîkaya Latîn çapemenîya muxalif bi tîpên mezin sernûçeyan dinivîse: Çepa dinyayê hemûyê pişta me digire! Çapemenîya ewropî ji ber wan digire. Waweylê li "populîzmê"! "Sosyalîst dixwînin. Û em dîsa li wî cihî ne ku me jê dest pê kiribû.

* Rojnamevan; nivîskarê pirtûka bi navê *Cinq Cubains à Miami (Pênc Kubayî li Miamiyê)*, weşanên Don Quichotte, Parîs, 2010.

1 Koma partîyên dijlîberal, dijkapîtalîst, ekososyalîst, komunîst yan jî post-komunîst e

2 Danezana prensîpê ya ku di kongreya duyemîn a partîyê de sala 1935ê hatibû qebûl kirin

3 FDR-FMLN baskekî siyasî ye ku bi hatina cem hev a FDRa ku Guillermo Ungo yê sosyal demokrat rêveberîya wê dike, û tevgera gerîla Bereya Farabundo Martî ji bo Azadîya Neteweyî (FMLN) pêk tê

4 *Nueva Sociedad*, hejmar 48, Karakas, gulan-hezîran 1980

5 *Pagina 12*, Buenos Aires, 27 hezîran 1999

6 Di navbera endamên "xwedîyên mafên tam", "yên şêwrê" û "yên çavdêr" de halê hazir sîhûneh partî di SICLACê de hene

7 *Pagina 12*, 26 hezîran 1999

8 "Conseil de Buenos Aires: façonner le changement (Konseya Buenos Airesê: Rengdana Guherînê)", malpera Înternasyonala Sosyalîst, 25-26 hezîran 1999, www.internationalesocialiste.org

9 *La Nación*, Buenos Aires, 28 hezîran 1999

10 *El País*, Madrîd, 2 sibat 1989

11 Bernard Cassen, "Union sacrée à Strasbourg (Yekîtîya pîroz li Strasbourgê)", *Le Monde diplomatique*, nîsan 2004

12 "Réunion du Comité de l'Internationale socialiste pour l'Amérique latine et la Caraïbe, SICLAC (Civîna Komîteya Înternasyonala Sosyalîst ji bo Amerîka Latîn û Karaîban, SICLAC)", 19 - 20 tîrmeh 2002, www.internationalesocialiste.org

13 Kuba, Bolîvya, Ekwator, Honduras (berîya darbeya eskerî ya 2009ê), Venezuella, Saint Vincent, Grenada, Antiga û Barbuda

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Li alîyekî rewşeke aborî û civakî ya berê nehatîye dîtîn heye. Li alîyê din nîqaşeke gişti ya peritî heye, ku heta ku ji ber bi tenê alternatîveke di navbera siyaseta rastgir a şidandî û hişkbûna siyaseta çepgir de mayî, hatiye rûçikandin. Qada nîqaşên fermî çawa xwe bêsînor dike, bi kîjan mûcîzeyê bawerîya hindikahîyekê vediguhere "raya giştî"? Di dersên xwe yên li ser dewletê de yên sala 1990ê li Collège de Franceê dayî û vê mehê weke pirtûk çapbûyî, civaknas Pierre Bourdieu vê yekê rave dike.

Du dersên Pierre Bourdieu li Collège de France

Fabrîkeya guftûgoyên giştî

Pierre Bourdieu *

Mehmet Latif Saglam: **Jinên me**, li ser kaxizê nîgar, 50 x 100 cm

Mirovê fermî yek ji wan mirovan e ku ji zikê xwe dipeyive, ew li ser navê dewletê diaxive: Ew dibe xwedîyê helwesteke fermî –divê mirov mîzansena tiştê fermî terîf bike–, ew ji bo berjewendîyên koma jêr dipeyive û li şûna heman komê diaxive, ew ji bo herkesî û li şûna herkesî dipeyive, ew weke ku nûnerê gerdûnê be dipeyive.

Em niha behsa fikra modern a raya giştî bikin. Ev raya giştî çi ye ku afirînerên huqûqa civakên modern, civakên di nav wan de huqûq heyî, serî lê didin? Ev bi awayekî zimnî fikra herkesî ye, ya piranîyê û ya wan kesên ku hesab ji wan tê kirin û kesên ku hêja ne fikreke wan hebe. Bi ya min xwedîyê mafê patenta têgehê di nav civakekê de ye ku xwe li demokratîkbûnê datîne, divê mirov pê zanibe ku fikra fermî, fikir û raya herkesî ye, di nav xwe de terîfeke nedîyar vedişêre: Raya giştî fikir û raya wan kesan e ku hêja ne xwedîyê fikrekê bin. Terîfeke sansurwarî ya raya giştî heye ku wê weke fikra rohnîbûyî, weke raya hêjayî navê xwe terîf dike.

Mentiqê komîsyonên fermî ew e ku komekê biafirînin ku bi rengekî pêk hatibe ku tevahîya nîşanên derve bide, hemîn yên bi awayekî civakî qebûlbûyî û dikarin bên qebûl kirin; yên jêhatîbûna derbirîna fikra hêja ye were derbirîn û helbet di nav şêwazên guncaw de. Yek ji pîvanên bidizî yên herî girîng ên neqandina endamên komîsyonê, nexasim jî serokê wê, ew hestiyarî ye ku bi wan mirovên ji pêkhatina komîsyonê berpirsîyar re heye; li gor vê hestiyarîyê kesa/ê ku weke ku dikare bibe endamê/a komîsyonê lê tê nêrîn, bi rêzikên bidizî yên cîhana burokratîk dizane û wan qebûl dike: Em bi awayekî din bibêjin, keseke/î dizane lîstika komîsyonê bi awayê rewa bilîze, ew kesa/ê ji rêzikên lîstikê bibihure, lîstikê rewa dike; mirov tu caran ewqasî zêde di nav lîstikê de nîne, bi qasî dema ku ji lîstikê û wê de diçe. Di tevahîya lîstikê de rêzik û *fair-play* hene. Der barê zilamê kabîl/berber, yan jî cîhana întellektuel de min ev formula li jêr pêk anîbû: Di piranîya civakan de ya bêqisûr hunerê lîstina bi rêzikên lîstikê ye, bi riya rêzika lîstikê ji vê lîstikê îhtîrameke mezin ji lîstikê re diafirîne.

Koma serdest endaman dineqîne li gor nîşanên piçûk ên rabûnûrûniştinê ku bi xwe hunerê rêzgirtina ji rêzika lîstikê re ne heta ku bigihêje binpêkirinên birêkûpêkkirî yên rêzika lîstikê: Edeb, serperiştî. Hevoka navdar a **Chamfort** weha ye: "*Alîkarê Keşe yê Mezin dikare li hemberî axaftineke li dijî dîn bigirnije, Metran bi xwe dikare bikene, Kardînal dikare gotinekê lê zêde bike û tevlî wan bibe.*" (1) Mirov çiqasî di hîyerarşîya ekselansan de hilkişe jor, ewqas zêde dikare bi rêzikên lîstikê bilîze, lê belê bi rengekî ku ji bo erkê be, ji meqamekî bi wî rengî û pê ve ku êdî guman jê neyên kirin. Mîzaha dij-sîstema erkdarên dînî ya kardînal, heta mirov bibêje bes li gor sîstema erkdarên dînî ye.

Raya giştî timî qadek e ku rastî lê cot e. Ew e ku nabe mirov serî lê nede dema ku mirov dixwaze qanûnan li ser qadên destpênebûyî çêke. Dema ku mirov dibêje "valahîyeke huqûqî" (peyveke awarte) heye der barê otenazîyê de yan jî pitikên-ezmûnên tibbî de; hingê mirov wan kesan vedixwîne ku wê bi tevahîya otorîteya xwe bixebitin. **Dominique Memmi** (2) komîteyeke exlaqî [li ser dolgirtina sunî] terîf dike, ji mirovên bi tevahî ji hev cihê –psîkolog, sosyolog, jin, femînîst, metran, xaxam, alim û hwd.– pêk tê yên ku armanca wan ew e ku yekûneke zimanên ferdî yên exlaqî veguherîne nîqaşeke gerdûnî û ev nîqaş jî wê valahîyeke huqûqî dagire, ango wê çareserîyeke fermî ji bo pirsgirêkeke zehmet a civakê serûbinîhev dike, bibîne –weke mînak qanûnîkirina dayikên pitikên xelkê ji bo zayînê hildigirin–. Eger mirov di rewşên bi vî rengî de dixebite, divê mirov serî li rayeke giştî bide. Di vê çarçoveyê de fonksîyona li anketan tê bar kirin pir baş tê fêm kirin. Dema mirov bibêje "anket pişta me digirin" weke ku mirov di çarçoveyeke din de bibêje "xwedê pişta me digire".

Lê belê anket, zivêr dikin, lewra fikra rohnîbûyî carinan li dijî îdamê ye, tevî ku anket alîgirên wê ne. Hingê gelo divê mirov çi bike? Mirov komîsyonekê çêdike. Komîsyon ji rayeke giştî a rohnîbûyî pêk tê û ew ê serî li fikra rohnîbûyî bide ku li ser navê raya giştî fikra rewa ye –raya giştî bixwe wekî din tişta dijber dibêje, yan jî tu fikra wê nîne (li ser gelek mijaran rewş ev e). Taybetmendîyeke anketan ew e ku ji mirovan hin pirsan dikin, ku ew bixwe ji xwe napirsin, bersivan didin wan pirsên ku mirov ji xwe napirsin û bi vî awayî bersivan li ser mirovan ferz dikin. Ev di pêkanîna mestereyan de pirseke xwar e, ev rastîya ferzkirina li ser kesî ya wan pirsan e ku fikra rohnîbûyî ji xwe dike û bi vê rastîyê afirandina bersivên herkesî li ser pirsên ku bi tenê çend kes ji xwe dikin, ango dana bersivên rohnîbûyî, lewma ew bi riya pirsan hatine afirandin: Me kir ku pirs çêbin ji bo mirovan, pirsên ku berê ji bo wan nebûn, tevî ku ya ji bo wan pirs, pirs bi xwe ye.

Ez ê ji we re pê re pê re deqeke **Alexander Mackinnon** ya ji sala 1828ê wergerînim, min ji ber pirtûkeke **Peel** ya li ser **Herbert Spencer** girtiye. (4) **Mackinnon** raya giştî terîf dike, heke di civakeke demokratîk de ne cihê şermê bûya, ev terîfa wî wê bibûya terîfa fermî. Dema ku em behsa raya giştî dikin, em timî du lîstikan bi hev re dilîzin, di navbera terîfa dikare were qebûl kirin (fikra herkesî) û fikra destûra wê hatiye dayîn û bi bandor e, ku ji weke koma jêr a sînordar a raya giştî hatiye girtin û ev raya giştî jî bi awayekî demokratîk hatiye terîf kirin:

"*Ew, ew hisa ku li ser mijarekê ye ku mirovên herî baş agahdar, herî biaqil û herî exlaqî yên di nav civakê de wê li ser piyan digirin, çêdikin. Ev fikir hêdî hêdî belav dibe û ji alîyê herkesê/a hinekî xwendî û xwedîyê hisa li gor dewleteke medenî ve tê qebûl kirin.*" Rastîya serdestan vediguhere ya herkesî.

Mîzansena otorîteya ku destûra peyvînê dide

Salên 1880yê li Parlemana Neteweyî tiştê ku sosyolojîyê diviyabû hê vebîne, bi awayekî eşkere dihat gotin, weke mînak sîstema dibistanê diviya zarokên çînên herî zêde mexdûr vebijêre. Pêşî pirs hat kirin a ku paşê bi tevahî ji ber çavan hat bi dûr xistin, lewra sîstema dibistanê dest bi ya jê dihat hêvî kirin kiribû, bêyî ku jê were pirsîn. Lewma jî ne hewce bû behsa wê were kirin. Pir girîng e mirov vegere destpêka pêkhatinê, lewra di destpêkan de nîqaş hebûn ku di wan de her tişt bi zelalî dihat gotin û ev tişt paşê weke dîyarkirinên provokator ên sosyologan xuya dikin.

Afirînerê fermî dizane biafirîne –maneya koka peyvê: Produserê ango "derxistina holê/ber rojê"–, bi dirûvdana şanoyî ya hin tiştên tunene (bi maneya ya tê his kirin, dîtin), li ser ser navê tiştê ew behsa wî dike. Ew divê wî tiştî biafirîne, ya ku ew li ser navê wê dikare biafirîne. Nabe ku ew teatralîze neke, nabe bi gewde neke, nabe mûcîzeyan pêk neyîne. Mûcîzeyên herî asayî ji bo afirînerekî devkî, mûcîzeyeke devkî ye, serketina xîtabetê ye; ew divê mîzansena wî tiştî biafirîne ya ku destûrê dide gotina wî, ango wê otorîteya ku li ser navê wê destûra wî heye bipeyive.

Terîfa prosopopeyîya ku ez lê digerîyam min aha niha dît: "*Kesayeta xîtabetê ye ku mirov bi riya wê dike ku kesekî nehazir, mirîyek, heywanek, tiştekî kesayetî lê hatibe bar kirin, bipeyive û tevbigere.*" Û di ferhengê de ku timî amûreke bêqisûr e, em pêrgî vê hevoka Baudelaire ya der barê helbestê de tên: "*bi zaneyî bikaranîna zimanekî, ev pêkanîna awayekî sêhrbazîyê ye ku tiştekî bi bîr dixe.*" Erkdarên dînî yên ku bi zimanekî zanyarî dilîzin çawa ku huqûqzan û helbestvan jî dikin, divê mizansena nîşana behsa wê dikin a xeyalî çê bikin ya ku li ser navê wê dipeyivin û bi xwe dema ku bi rengê pêwîst e dipeyivin, diafirînin; divê ew bikin ku ew tişta derdibirin çêbibe û vê jî li ser navê wê tişta ku ew derdibirin bikin. Divê ew di heman demê de hem nîqaşekê biafirînin û herweha bawerîya bi gerdûnîbûna nîqaşa xwe jî bi hilberîna hesas a bi maneya bibîrxistina xeyalan, pêjnan, biafirînin –dewlet pêjnek e, xeyalek e... – xeyala wî tiştî ku wî tiştî çêdikin misoger bike: "Netewe", "karker", "gel", "sira dewletê", "ewlekarîya neteweyî", "daxwaza civakî", û hwd.

Percy Schramm nîşan da çawa merasîmên tacîdarkirinê veguhestina merasîmên dînî ber bi qada siyasî ve bûn. (5) Heke rêzikên merasîmê yên dînî ewqasî hêsan dikarin veguhezînin merasîmên siyasî, bi riya merasîmên tacîdarkirinê, sedema vê yekê ew e ku mesele di herdu rewşan de jî bikin ku mirov bawer bikin; ji bo nîqaşê bingehek heye ku tenê bi saya mîzansenê xweafirîner xuya dike, rewa ye, gerdûnî ye, yanî weke koma yekbûyî û razî ji nîqaşa ku wan dike yek –bi maneya bibîrxistina efsûnî, sêhrbazîyê. Jixwe qaîdeyên merasîmên huqûqî ji vir tên. Dîrokzanê ingilîz **E. P. Thomson** bi israr behsa rola bi rengê şanoyî danîna pêvajoyên huqûqî di sedsala 18ê de kir –perûk, û hwd.–, mirov nikare bi tu awayî fêm bike heke nebîne ku ew ne çerxeke nehêsan e, çawa ku **Pascal** jî dibêje: Ew hêmanê afirîner ê kirina huqûqî ye. (6) Mirov heq û huqûqê bi bedlên bi êlek ên amerîkî bibêje, ev karekî bi rîsk e: Tehlûke heye mirov şetefata nîqaşê ji dest bide. Timî behsa reformkirina zimanê huqûqê tê kirin, lê ti caran ev reform nayê kirin, lewma ev cilûbergên dawî ne: Qralên tazî êdî ne karîzamatîk in.

Ya fermî, yan jî niyeta xirab a kolektîf

Yek ji alîyên pir girîng ê mîzansenê, mîzansena berjewendîyê ji bo berjewendîya giştî ye; Ev mîzansena bawerîya bi gerdûnîbûna berjewendîyê ye. Weke ku ne xwedî berjewendî be nîşandana siyasetvanîyê ye –mîzansena bawerîya dînî ya keşe, bawerîya siyasî ya siyasetvanî, bawerîya wî ya bi tiştan dike. Mîzansena bawerîyê beşek ji şertên bidizî yê îcrakirina pîşeyê erkdarekî dînî ye –mamosteyekî fîlozofîyê neçar e weke ku ji fîlozofîyê bawer dike xuya bike–, lewra ev bawerî îhtîrama sereke ya mirovê fermî li hemberî tiştê fermî ye; ew e tiştê ku mirov divê bide fermîyetê da ku bibe mirovekî fermî: Divê mirov bêberjewendîbûnê, bawerîya bi ya fermî qebûl bike, da ku bibe mirovekî fermî yê bi rastî. Bêberjewendîbûn nirxekî talî nîne: Ew *nirxê* siyasî ya tevahîya nûnerîyan e. Dek û dolabên keşeyan, hetîketîyên siyasî, hilweşîna bawerîyên siyasî yên bi vî rengî ne, ya ku tê de herkes niyetxirab e, bi gotinên sartrî, bawerî weke tiştekî mîna niyeteke xirab a kollektîf e: Lîstikek e ku tê de herkes derewan li hev dike û li yên din dike û pê dizanin ku derewan li hev dikin. Ev e ya fermî...

* Sosyolog (1930-2002). Ev deq ji berhema bi navê *Sur l'Etat. Cours au collège de France 1989-1992* (*Li Ser Dewletê. Dersên li Collège de France 1989-1992*) hatiye girtin. Ev berhem li Parîsê wê 5ê çileya sala 2012ê ji alîyê weşanên Raisons d'Agir – Le Seuil ve were weşandin.

1 Nicolas de Chamfort, *Maximes et pensées (Prensîp û Fikir)*, Parîs, 1795

2 Dominique Memmi, "Savants et maîtres à penser. La fabrication d'une morale de la procréation artificielle (Zane û Hosteyên Fikrê. Çêkirina Exlaqekî ji bo Dolgirtina Sunî)", *Actes de la recherche en sciences sociales*, hejmar 76-77, 1989, rûpel 82-103

3 Ji peyva grekî *idios*, "ferd" tê: Axaftina ferdî

4 John David Yeadon Peel, *Herbert Spencer. The Evolution of a Sociologist (Herbert Spencer. Beridîna Civaknasekî)*, London, Heinemann, 1971. William Alexander Mackinnon (1789-1870) demeke dirêj parlamanterê Meclîsa Brîtanî bû

5 Percy Ernst Schramm, *Der König von Frankreich. Das Wesen der Monarchie von 9 zum 16. Jahrhundert. Ein Kapital aus Geschichter des abendlischen Staates* (*Qralê Franseyê. Cewherê Monarşîyê ji Sedsala 9ê heta ya 16ê. Sermayeyek ji Dîrokên Dewletên Rojavayî*) (du berg), H. Böhlaus Nachf, Weimar, 1939

6 Edward Palmer Thompson, "Patrician society, plebeian culture (Civaka Esîlzadeyan, Çanda Gel)", *Journal of Social History*, 7 (4), 1976, rûpel 382-405

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.kurdishmedia.com

Her du rûyên dewletê

Pierre Bourdieu

Kêlîya ku dewlet dev ji serwerîya xwe ya budçeyî berdidin û didin dest dezgehên di ser neteweyan re –nexasim yên ewropî– sosyolojîya dîrokî bi bîra me dixe ka di nav dînamîkên întegrasyonê de ji şidet û desteserkirina mal û milk çi heye.

Terîfkirina pêvajoya avakirina dewletê, terîfkirina pêvajoya pêkanîna sektoreke civakî ye, ango komeke civakî ya girtî (mîkrokosmek e) ye ku di nav cîhana civakî ya li derdora xwe de têra xwe serbixwe ye. Di vê mikrokosmê de lîstikeke taybet li dar e, lîstika siyaseta rewa. Weke nimûne, afirandina parlementoyê, cihê ku bi awayekî eşkere, maqûl, li gor qanunê û li hemberî herkesî li ser pirsgirêkên di navbera komên xwedî berjewendîyên cuda de nîqaş lê pêk tên. Marks tê de bi tenê pişta perdeyê didît: Bikaranîna vê metafora şanoyê û mîzansena pêvajoyê, ser wê rastîyê dinixumand; yên ku ben di destê wan de biryarê didin, armancên bi rastî û hêzên bi rastî ne. Ew li deverên din in. Avakirina dewletê avakirina qadekê ye ku wê polîtîka lê dîyar bibe, wê xwe bike sembol û wê formên dramatîk bigire.

Ketina nav vê lîstîka siyaseta maqûl û rewa, tê maneya xwedibûna wê çavkanîya hêdî hêdî hatî berhev kirin ya bi navê "gerdûnî". Di peyva gerdûnî de, di helwêstên gerdûnî de mirov dikare li ser navê herkesî, li ser navê *gerdûnê* yanî tevahîya komekê biaxive. Mirov dikare li ser navê ya başîya giştî behsa tişta baş a ji bo gelemperîyê bike û bi vî awayî xwe bike xwedîyê wê. Ev prensîpa "Bandora Janus" e: Hin kes hene ku xwedîyên imtîyaza gerdunîyê ne, lê mirov nikare bibe xwedîyê gerdunîyê bêyî ku di heman demê de monopolê gerdunîyê be. Kapîtala gerdûnîyê heye. Pêvajoyê ku tê de merciyeke birêveberîya gerdûnî heye, nikare dûrî pêvajoyeke pêkanîna kategorîyeke hêmanan be ku xisleta wan xwe xwedîkirina gerdûnîyê ye.

Ez mînakekê di warê çandî de didim. Afirandina dewletê pêvajoyek e ku tê de rêzeke navendîkirina çavkanîyên cihê heye: Navendîkirina çavkanîya agahîyan (statîstîkên ku bi riya lêkolîn û raporan çêdibin), ya sermayeya lînguîstîk (fermîkirina şiklekî axaftinê ye ku dibe zimanê desthilatdar û hemû zimanên din ji xwe bêqîmettir û xirabtir dike). Ev pêvajoya navendîkirinê ligel pêvajoyeke jidestdanê dimeşe: Weke paytext avakirina bajarekî, weke cihekî ku şêwazên kapitalê hemû tê de kom dibin (1) tê maneya weke bi jidestdana kapîtalê avakirina derdor û melbendekê; maneya fermîkirina zimanekî ew e ku mirov zimanên din hemûyan dike zarava. (2)

Çanda rewa, çanda ku ji alîyê dewletê ve tê misoger kirin e, ji alîyê vê sazîyê ve ku sernavên çandê misoger dike, ya ku dîplomayên xwedîbûna çandekê misoger dikin, dide. Bernameyên perwerdeyî pirsgirêkên dewletî ne; guhertina bernameyekê tê maneya guhertina şiklê belavbûna kapîtalê û tinekirina hin şewazên kapitalê. Weke nimûne, ji holê rakirina perwerdeya zimanên latînî û yewnanî tê maneya lawazkirina tevahîya çîneke xwedî sermayeyên lînguîstîk. Min bi xwe, di hemû karên xwe yên li ser dibistanê yên berê de, ji bîr kiribû ku çanda rewa çanda dewletê ye…

Ji bazara herêmî derbasbûna bazara neteweyî

Ev navendîkirin di heman demê de yekkirin û şiklekî gerdûnîkirinê ye. Li şûna cudatî, bêserûberî, belavbûn û herêmîyê, yekbûn heye. Bi **Germaine Tillion** re, me hêmanên pêvanê yên li gundên kabîl ên di nav sîh kilometreyan de tên bi kar anîn, dabûn ber hev: Çiqas gund hebûn, me ewqas hêmanên pîvanê dîtin. Avakirina şiklekî netewî ya hêmana pîvanê pêşketinek e kur ber bi gerdûnîbûnê ve diçe: Sîstema pîvanê ya metrîk (bi metreyan) şiklekî gerdûnî ye ku lihevkirinekê li ser maneya metreyê pêwist dike. Ev pêvajoya navendîkirinê, ya yekkirin û întegrasyonê ligel pêvajoyeke jidestdanê dimeşe, lewre zanist û jêhatîbûnên girêdayî şiklên pîvanê yên herêmî li derve tên hîştin.

Bi gotineke din, pêvajoya ku gerdûnîbûnê bi pêş dixe, di heman demê de navendîkirineke gerdûnîyê ye jî. Yên ku sîstema metrîk dixwazin hene (matematîkzan) û yên ku sîstemên pîvanê yên herêmî tercîh dikin hene. Pêvajoya afirandina çavkanîyên hevpar bi tenê bi riya afirandina wan weke kapîtaleke di yek destî de komkirî mumkin e, ev kapîtal di destê wan kesan de ye ku xwedîyên yekdestdarîya têkoşîna ji bo monopola gerdûnîyê ne. Tevahîya vê pêvajoyê *–avakirina qadekê; serbixwekirina vê qadê ji pêdivîyên din; afirandina pêdivîyeke taybet li gor pêdivîya aborî û ya malan; afirandina sîstemeke taybet a zêdebûna burokratîk ku ji sîstema zêdebûna malîyan cuda ye; afirandina pêdivîyeke taybet e ku cuda ye ji pêdivîya dîn–* girêdayî pêvajoyeke navendîkirin û afirandina çavkanîyên nû ye ku bixwe gerdûnî ne, yan jî qet nebe çavkanîyên ku asta gerdûnîbûna wan ji yên berê bilindtir e. Di warê aborî de û herweha sembolîk be jî, em ji bazara herêmî derbasî bazara neteweyî dibin. Rastî ev e ku sazkirina dewletê bêyî sazkirina monopola gerdûnî nabe, çand jî mînaka herî baş a vê yekê ye.

Hemû xebatên min ên berê dikarin bi vî awayî bi kurtasî bên terîf kirin: Ev çand rewa ye, ji ber ku xwe weke çandeke ji herkesî re vekirî û gerdûnî pêşkeş dike, ji ber ku mirov dikare bê tirs li ser navê vê gerdûnîbûnê yên ku ne xwedîyên vê çandê ne, ji holê rake. Ev çanda ku wisa xuya ye yekitîyê pêk tîne, di rastîyê de ji hev dûr dixe û parçe parçe dike, yek ji amûrên mezin yên desthilatdarîyê ye. Lewre monopolên vê çandê hene, ev monopolîyek e mirovî dibizdîne, ji ber ku ne mumkin e mirov vê çandê weke taybet binirxîne. Çanda zanistî bi xwe jî sînorên nakokîyê derbas dikin. Şert û mercên afirandina vê gerdûnîyê, pêkanîna zêdebûna wê girêdayî şertên afirandina kastekê, elîteke dewletî ye, ku gerdûnê dixin destê xwe, ew "yekdestdarên" wê ne. Bi saya vê analîzê mirov dikare projeya gerdûnîkirina şert û mercên xwegihandina gerdûnîyê bide pêş xwe. Lê divê mirov zanibe çawa?: Gelo ji bo bigihe vê armancê pewîst e mirov "yekdestdarîyan" mecbûr bike sermayeya xwe ji dest bidin? Em baş dibînin ku divê em çareyê li vî alîyî negerin.

Ji rêbaz û maneya nivîsên min baştir wê bê fehm kirin, heke ez bi paraboleke [vegotina exlaqekî bi mînakên ji jîyana rojane] gotina xwe bi dawî bînim. Berî sîh salan, şeveke noelê, ez çûbûm Bearnê li gundekî çep ku tu kes nas nake da ku li gund beşdarî şahîyekê (3) bibim. Hin direqisîn, hin rûdinîştin; hin kesên ku ji yên din kal û pîrtir bûn û cilûbergên gundîyan li wan bûn, nedireqisîn, di nav xwe de diaxivîn da ku rewa bikin ka ji bo çi li wir in û dîsa jî nareqisin. Divê ew zewicîbin, lewra kesên zewicî êdî nareqisin. Şahî cîhê hevnaskirina ji bo zewacê ye: Bazara mal û milkiyetê ya sembolîk ya zewacê ye. Rêjeya kurên jinneanî û keçên mêrnekirî lê pir zêde bû: Temenê % 50yê wan di navbera 25 û 35 salan de bû.

Min hewl da sîstemeke vê yêke rave dike, bibînim: Berê bazareke herêmî ya parastî hebû ku ne yekbûyî bû. Wextê tiştê em jê re dibêjin dewlet ava dibe, yekbûneke bazara aborî pêk tê ku ji alîyê siyaseta dewletê ve tê xurt kirin. Û yekbûneke bazarên danûstandinên sembolîk pêk tê. Yanî bazara parastina rêûresman, ya tevgeran, ya cilûbergan, ya kesan, ya nasnameyê, ya pêşandanê. Ev gundî xwedîyên bazareke herêmî ya parastî bûn ku ji wan dihat kontrol bikin. Vê yekê destûr dida ku gundî bi biryar û kirina malbatan, di nav xwe de bizewicin. Berhemên vî awayê zêdebûnê di vê bazara herêmî de xwedî şansekê bû: Ew hêjayî firotinê bûn û ji xwe re keç didîtin.

Cotkar çawa veguherîn xelkê derveyî bajaran û paytextê

Li gor mentiqê modela ku min behsa wê kir, tiştên ku di şahîyê de diqewimîn encama yekbûna bazara danûstandina sembolîk bûn: Paraşûtvanekî ku bi qureyî tevdigerîya, lê belê ji bajarokê cîran dihat berekî dîskalifîyeker bû ku nirx ji reqîbên wî yên gundî kêm dikir. Bi gotineke din, yekkirina bazarê, ku em dikarin qet nebe ji bo mirovên ku koçberî deverên nû dibin weke pêşketinekê binirxînin. Yanî ev yek dikare tesîreke azadkar li ser jin û hemû bindestan bike. Dibistan mirovan derbarê tevgereke din de perwerde dike û lixwekirina cilên din fêrî mirovan dike û hwd., derîyê gerdûnîyê vedike.

Lê ev asta gerdûnîbûnê girêdayî bandora serdestîyê ye. Di demeke kin de min gotareke ku bi henekî min navê *"zêdebûn qedexe ye"* (4) lê kir û ku analîza min a rewşa ezebên Bearnê û tiştên ku min berê gotibûn rave dike, weşand. Ez tê de nîşan didim ku encama yekser a vê yekkirina bazarê di jîyana rojane de qedexekirina zêdebûna bîyolojîk û civakî ji kategorîyeke mirovan re ye. Di vê demê de li ser materyalekê ku bi tesadufî rastî wê hatibûm, xebitîm; belgeyên biryarên şaredarîya gundekî piçûk ku di dema şoreşa fransî de dused şênî lê diman. Li vê herêmê mirovan tevan dengê xwe dida heman namzedî, yan jî heman deng didan. Piştre biryar-qanûn digihêjin gund ku dibêjin hilbijartin ne bi yekdengî, belê bi piranîya dengan bi ser dikevin. Gundî êdî nîqaşê dikin, hin hene ku li hember fikra giştî radibin; du bend hene. Hêdî hêdî piranî alîyê din têk dibe: Gerdûnî piştgirtîya wê dike.

Gelek nîqaş li ser vê pirsgirêkê hebûn ku **Toqueville** bi mijara mantiqeke dewamî/demî ya şoreşa fransî dabû dest pê kirin. Pirsgirêkeke bi rastî ya dîrokî hîn dimîne: Hêza taybet ya gerdûnîyê çi ye? Vê hêza gerdûnîyê prosedurên siyasî yên van gundîyên xwedî rêûresmên hezarsalî ji holê rakirin, weke ku wan li ber tiştekî ji hêla mantiqî ji wan bi qewettir serî tewandibe: Ew tiştekî bajarî ye, xwedî axaftineke ne pratîk, lê raveker û rêbazî ye. Ew bûn gundî û kesên derdorê. Belgeyên biryardanê êdî wiha bûn: "Walî biryar da ku… ", "Konseya Şaredarîyê civîya…" Bihayê gerdûnîkirinê jidestdanek û yekdestdarkirinek e. Avakirina dewletê, avakirina cihekî ji bo îdareya gerdûnîyê ye ku di heman demê de yekdestdarkirina gerdunîyê û gelek hêmanan e ku bi xwe beşdarên vê yekdestdarîyê ne û herweha beşdarên wî tiştî ne ku weke gerdûnî tê îfade kirin.

Mehmet Latif Saglam: **Jinên me**, li ser kaxizê nîgar, 50 x 80 cm



Mehmet Latif Saglam: **Jinên me**, li ser kaxizê nîgar, 50 x 80 cm

Mehmet Latif Saglam: **Jinên me**, li ser kaxizê nîgar, 50 x 70 cm

Mehmet Latif Saglam: **Jinên me**, li ser kaxizê nîgar, 50 x 80 cm

1 Ev têkîlîya di navbera kapital û paytextê de wê piştre ji alîyê Pierre Bourdieu ve di "Effets de lieu (bandora cih)", *La Misère du monde (Xizanîya Dinyayê)*, Seuil, Parîs, 1993, rûpel 159-167 de bê pêşxistin

2 Li ser mijara zimanê fermî û pêvajoya girêdayî jimilkkirinê binêre li beşa pêşî ya berhema Pierre Bourdieu, *Langage et pouvoir symbolique (Ziman û Desthilatdarîya Sembolîk)*, Seuil, Parîs, 2001, rûpel 59-131

3 Binêre li terîfkirina vê "sehneya destpêkê" li destpêka berhema Pierre Bourdieu, *Le Bal des célibataires. Crise de la société paysanne en Béarn (Şahîya Ezeban. Qeyrana Civaka Gundî li Bearnê)*, Seuil, Parîs, 2002, rûpel 7-14

4 Pierre Bourdieu, "Reproduction interdite. La dimension symbolique de la domination économique (Zêdebûna Qedexe. Alîyê Sembolîk ê Desthilatdarîya Aborî)", *Etudes rurales*, hejmar 113-114, 1989, rûpel 15-36, herweha di berhama *Le Bal des célibataires (Şahîya Ezeban)* de dîsa hat çap kirin, *berhema li jor behsa wê hat kirin*, rûpel 211-247

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

Dema ku dîktatorîyek hildiweşe, em zorê didin xwe da ku fêm bikin ka çawa wê dikarî xwe li ser piyan bigire. Li Lîbya, Misir yan jî Tûnisê bersiva pirsê qismî di kontrolkirina bi rêkûpêk a ragihandinê de ye. Bi alîkarîya materyalê şirketên amerîkî û ewropî dayî wan. Van şirketan li wan deveran mişterîyên xwe ji kompleksan xilas dikirin û herweha erdekî ku dikarin lê teknolojîya xwe li qadeke mezin biceribînin, peyda dikir.

TEKNOLOJÎYEKE HEM BALA DEWLETAN Û HEM JÎ YA ŞIRKETAN DIKŞÎNE

Kontrola "hûr û kûr" li ser Înternetê

ANTOINE CHAMPAGNE *

Rojnamevana *Wall Street Journal* **Margaret Coker** a ku, bi pey herifîna rejîma Trîpolîyê, navendeke guhdarîkirina gel ziyaret kir, bi çavên serê xwe dît ku hertişt li wir tê kontrol kirin: Tevna înternetê, telefonên destan ên GSM û girêdan (înternet û telefon) ên bi riya satelîtê. Di hin dosyayan de, ji nav tiştên din, e-peyam, an kurtasîyên sohbetên li ser xetê yên muxelîfên rejîma **Muammar Qedafî** cih digirt. Li ser dîwarên navendê, afîşên piçûk ên şirketa ku ev binesazî saz kiribû daliqandî bûn: ***Amesys*** a şubeya fîrmaya fransî ***Bull***. (1) *Le Canard Enchaîné* bi pey re dîyar kir ku Birêveberîya Istîxbarata Leşkerî (DRM) ji bo perwerdekirina "kontrolkar" ên lîbyayî bû alîkar. (2)

Li Sûriyê, teçhîzatên amerîkî rê didin desthilata Beşar el-Esad ku înternetê sansûr bike û li gor kêfa xwe şanenav û şîfreyên welatîyan bi dest bixe, da ku têkeve peyamdankên wan ên elektronîk, an jî rûpelên wan ên li ser medyayên civakî Facebook û Twitter. Ev jî aleteke pir girîng e ji bo vedîtina têkilîyên muxelifekê/î yên digel piştevanîyên hundirîn an derveyî.

Navê şîrîn ê "***Deep Packet Inspection***" (DPI, bi kurdî " *Teftîşa Kûr ya Paketan*") li teknolojîyên bikarhatî hat dayîn. Dema ku mirov e-peyamekê dişîne, bi dehan makîne destê hev û du digrin da ku wê bigihînin peyamstînerî/ê. Ew bi tenê elaqedarî navnîşana hedefê ne û li naveroka peyamê nanihêrin û weha rasterast wê digihînin makîneya cîran. Gav bi gav, peyam digihîje hedefa xwe. Wek **Jonathan Zittrain** ê bisporê hiqûqa înternetê şirove dike, *"Ev hinekî weke hûn beşdarî êvareke li gel kesên ciwanmêr dibin. Eger hûn dûrî barê disekinin û xelk zêde ye û riya barê li ber we digire, hûn ê ji cîranê xwe bixwazin ku bîrayekê bigihîne we. Ew ê jî ji cîranê xwe yê nêzîktirî barê bixwaze û hwd. Di dawîyê de, daxwaza we digihîje barê û bîra bi heman riyê ve tê. Ji ber ku hemû jî ciwanmêr in, tu kesî di ber re qurtek ji peyalê venexwarîye"*. (3)

Li gel DPIyê, vîzyoneke din a înternetê dikeve dewreyê. Ne ewqasî cihê ciwanmêrîyê ye. Eger cîranê we di serî de daxwaza we analîz dike, an jî dersên exlaqê dide we, hûn ê çi bibêjin? Yan jî belkî ew biryarê bide vexwarina we biguherîne, avê an jî madeyeke kêfçêker a xurttir bixiyê? Ya ku teknîkên DPIyê destûrê didinê jî ev e: Xwendina naveroka sohbetan, guherandina wan, şandina wan ji keseke/î din re...

Fîrmaya Amesys li ser vê bazarê ne bi tenê ye. Qosmos, fîrmayeke din a fransî, taze ji hêla Bloombergê ve li ser sûc hat girtin. Ajansa çapemenîyê ya amerîkî weha îsbat kir ku Qosmosê hûrlêkolînên DPIyê dane konsorsîyumeke berpirsa teçhîzatkirina Sûriyê li gor mînaka Lîbyaya ***Qedafî.*** (4) Li Çînê, teknolojîyên DPIyê li navenda sîstema mezin a parastina komputeran ji vîrusan cih digirin, sîstema ku riya hikûmetê li ber sansûrkirina sohbetan û kontrolakirina welatîyan vedike.

Mirov pê zanibe ka kî ji Înternetê dadixîne xwarê

Jixwe, çawa ku belgeyên navxweyî yên pirhejmar ên van fîrmayan, ku ji hêla Wîkîleaksê ve taze hatin dîyar kirin, nîşan didin, şopandina şebekeyên ragihandinê *"pîşesazîyeke bi dizî ya nû ye, ku bîst û pênc welatan dihewîne.* (…) *Di çîrokên sîxurtîyê yên adetî de, dezgehên ewlehîyê yên wek MI5 ya brîtanî, telefona yek an du kesayetîyên balkêş didin guhdarî kirin. Lê di ber deh salên dawîn re, pergalên şopandina gîştî û cudanekirî bûne qaîde"*. (5) Berî demeke kurt, *Wall Street Journal* bêhtirî du sed belgeyên marketîngê yên ji sî û şeş şirketan derketî, weşandibûn, ku amûrên şopandin û korsanîya înternetê li rayedarên dijterorîst ên amerîkî pêşkêş dikir. (6)

Li Dewletên Yekbûyî, gulana 2006ê DPI di dema xwe ya herî serketî û şa de bû: **Mark Klein**ê kevneteknîsyenê AT&T (Firoşkereke Xizmetên Înternetê ya mezin a amerîkî), bêdengîyê dişkîne. Ew li dijî bicihkirina li cem şirketa xwe ya berê, yanî li navenda şebekeya înternetê ya amerîkî, berhemên şirketa *Narus* diaxive. Hostekar jî *National Security Agency* (NSA) ya navdar bû, ya ku di salên 1980-1990ê de projeya ***Echelon*** îcad kiribû. (7) Dirûşma Narus: "See Clearly. Act Swiftly" ("Zelal bibînin. Zû tev bigerin"). Vî weşînerê teknolojîya DPIyê ya li 1997ê damezrandî, li gel sed û pencî xebatkarên xwe, 2006ê 30 mîlyon dolar qezenc kirin û 2010ê ji hêla *Boeingê* ve hat kirîn. Tê gotin ku berhemên wê di dewra **Husnî Mubarek** de li Misirê bi kar dihatin. (8) Ji nav herikên agahîyan ên di înternetê re derbas dibin, operatorên teleragihandinê Web, e-peyam, sohbetên yekser, pevguherandinên devkî, vîdeo, sohbetên neahengî, daneyên brût û ym. dibînin. Piranîya van herikan bêyî şîfrekirineke krîptografîk bi zelalî tên pevguherandin. Lewre jî korsanê amator herweke servîsên ewlehîyê yên dewletan bi hêsanî dikarin guhdarîya wan bikin.

Hin aktorên ferdî jî di van teknolojîyan de xwedî parên berjewendîyan in. Operatorên teleragihandinê yên weke ***Free, SFR*** an ***Orange*** her ku diçe bêhtir ji derbasbûna komeke daneyên ji aktorên bo ragihandinê pere nadin derketî, bi gazinc in. Wek mînak, FXI ji peredayîna bo vîdeoyên ***YouTube***yê yên bi mecbûrî pêşkêşî abonedarên xwe dikin, nerihet dibin. Fikira lêzêdekirina fiyateke zêde li ser fatûraya birêkerê/a daneyan an bikarhênerê/a dawî ji wir tê, herweke hêdîkirina bijarte ya hin herikan da ku hinên din bên tercih kirin. Lê belê, ji bo vê yekê, pîvaneke hûrgilî pêwîst e da ku bizanibin çi di lûleyan re derbas dibe.

Bi heman awayî, operatorên telefonên destan biryara bisînorkirina têketina înternetê ya bikarhêneran da, da ku xercên wan ên binesazîyê kêm bibin. Ji ber vê yekê, ew pevguherînên dosyayên ferd-bi-ferd (peer-to-peer), an jî bikaranîna aletên ragihandina devkî, an vîdeoyên weke ***Skype***yê li bikarhênerên telefonên "jêhatî" qedexe dikin.

Di wir de jî, DPI rê dide wan ku şopandin û birêvebirina herikan çalak bikin û firehîyeke bantê ya bilindtir ji bo hin xizmetan (wek mînak, xizmetên ku ew bixwe diweşînin...) veqetînin. Ev jî bi têgiha "alînegirîya şebekeyê" re nakok e, ya ku rola firoşkera xizmetan weke derbaskirina bê cihêkarîyê ya hemû daneyên xwestî tarîf dike.

Dema ku ji bo gerîna li ser ***Web***ê tê bi kar anîn, DPI dihêle ku şopên hemû tevgerên wê bên parastin. Dilê pîşekarên marketîngê şa dibe û ew xeyala xebitandina van daneyan dikin. Jixwe, Orange berî demeke kurt pêşkêşeke bi navê "Orange bijarte" berpêş kir, ku li ser bingeha DPIyê dixebite û bi destûra abonedar, malperên Webê yên ku ew lê digere analîz dike da ku, bi pey re, reklamên bazirganî yên pir hedefkirî pêşkêşî wî/wê bike. Bi vî awayî, FXI dikarin bi qasî ***Facebook*** an ***Google***yê qezencker bin, bi şertê ku ev bernameyên dilsozker-şopîner bala aboneyan bikişînin; lê belê îfadeya anonîmbûna daneyan wê bi temamî rê bide firotina berhemê.

Xwendevana/ê meraqdar dikare çav li rûpela "***Data Privacy***" ya malpera GFKê, grupeke navneteweyî ya lêkolîna marketing a hîssedara Qosmosê, bigerîne: Ew bi asayî behsa "***cookies***" ên gera li ser înternetê dike, lê belê ew bikaranîna xwe ya teknolojîyeke DPI, xwedêgiravî "anonîmkirî" bi awayekî ku ew tenê pê dizanin, ji bo "şopandina" ziyaretkerên malperên înternetê, li derve dihêle. GFK di bêhtirî sed û pencî welatan de cih digre, hemû jî ne welatên pir demokratîk in...

DPI herweha fîrmayên heqdaran û xwedanên mafên parastî bi xwe ve dikişîne, yên ku dixwazin li dij pevguherînên dosyayên "derqanûnî" li ser *tevnên ferd-bi-ferd* (*Bittorrent*), an jî malperên daxistina rasterast, wek ***Megaupload***, têbikoşin. Binesazîyeke şopandinê ya "kûr" û li tevahîya noqteyên pevguherîna daneyan belavbûyî, yanî FXI, bi tenê dikare bizanibe ka kîjan înternetvan dixwaze kîjan fîlmî an dosyaya mûzîkê daxe komputera xwe û rê li ber wê/wî jî bigire.

Şopandina qanûnî jî bazareke xwezayî ya DPIyê ya din e. Polîs carina di çarçoveya lêpirsîneke hiqûqî de û li bin kontrola dadgêrekê/î û herçi Fransayê, "komîsyoneke şopandina zeftkirinên ewlehîyê" jî muhtacî guhdarîkirina bizavên ferdekê/î ye. Lê belê, ev bazareke piçûk û taybet e ku bi tenê beşeke pir piçûk a nifuse elaqedar dike. Ji derveyî pêşdîtina lêzêdekirineke nû û bilind a budçeyên dijterorîzmê, weha xuya ye ku, eger jêhatî bin, divê fîrmayên sektorê li hedefên ticarî yên din bigerin.

Hikûmetên dewletên polîsî jî di wir de xwedîyên rolekê ne, ji ber ku ew dixwazin guhdarîya her kesî bikin. Bi xêra van welatan, nivîsbarîyên şopandinê di rastîyê de tên ceribandin. Tûnusa **Zeynelabidîn bin Elî** weha bi buhayekî erzan ji pergalên hîn xeletî di wan de hebûn sûd werdigirt. Herçi Amesys, Lîbya bêguman ceribandineke rastîn a imkan (û bêimkanîyên) nivîsbarîya wê ***Eagle*** bû. (9) ***Alcatel*** herweha li Bîrmanyayê jî dixebite. (10) Gav bi gav şixulandina daneyên ji DPIyê berhevkirî, girtinan hêsan dike. Îşkence jî vî karî temam dike û celad teknîkên berê yên ku pê dizanin û encaman jê derdixînin, bi kar tînin.

Parlemana Ewropî ya ku bi îhtîmaleke mezin ji ber hebûna komeke şirketên ewropî li ser bazarên bi vî rengî bi fikar bû, pêşnîyareke zagonê ya weha pesend kir ku firotina derve ya pergalên şopandina telefon an jî peyamên nivîskî, an jî şopandineke hedefkirî ya Înternetê pêşkêş dikin, qedexe dike, eger ew li dij qaîdeyên demokratîk, mafên mirovan, an azadîya îfadeyê tên bi kar anîn. (11) Konseya Ewropayê 1ê kanûna 2011ê biryarên sînorker ên li hember desthilata Sûrîyeyê zexm kirin û weha *" ixrackirina teçhîzat û nivîsbarîyên ji bo şopandina înternet û ragihandinên telefonî"* qedexe kir.

Lê belê, ixrackirina berhemên guhdarîkirina gîştî hîn bêyî çarçoveyeke hiqûqî ya zelal in. Produktor dikarin bi rihatî bê zerar bigihîjin armancên xwe. Pirrengîya zagonan jî alîkarîya wan dike. Destûrên ji alîyê hikûmetê hatine dan, nayên weşandin. Nivîsbarîyên bi vî rengî jî, weke sîlehên rasteqîn nayên hesibandin.

* Rojnamevan, Reflets.info

1 Paul Sonne û Margaret Cocker, "Firms Aided Libyan Spies *(Fîrmayan ku alîkarî da sîxurên lîbyayî)*", *The Wall Street Journal,* New York, 30 tebax 2011

2 "Des experts des services secrets français ont aidé Kadhafi à espionner les Libyens *(Pisporên rêxistina istîxbaratê ya fransî alîkarî dan Qedafî da ku lîbyayîyan bişopîne)*", *Le Canard enchaîné,* Parîs, 7 îlon 2011 û "Secret militaire sur le soutien à Kadhafi (*Sira eskerîya li ser alîkarîya bi Qedafî re*)", 12 cotmeh 2011

3 Jonathan Zittrain, "The Web as random acts of kindness (*Tevna înternetê weke kirinên rastlêhatî yên qencîyê*)", konferansa TED, tîrmeh 2009

4 "Syria Crackdown Gets Italy Firm's Aid With U.S.-Europe Spy Gear (*Zilma Sûriyê desteka fîrmaya îtalî destine tevî teçhîzata sîxurîyê ya DYA-Ewropayî*)", Bloomberg, 3 mijdar 2011

5 WikiLeaks, "The Spy Files (*Dosyayên sîxur*)", 1 kanûn 2011

6 Jennifer Valentino-Devries, Julia Angwin û Steve Stecklow, "Document Trove Exposes Surveillance Methods (*Sebeta belgeyan ducarî rêbazên şopandinê dike*)", *The Wall Street Journal,* 19 mijdar 2011

7 bixwîne Philippe Rivière, "Le système Echelon (Pergala Echelon/qonaxê)", *Manière de voir,* hejmar 46, "Révolution dans la communication (Di Ragihandinê de Şoreş)", tîrmeh-tebax 1999

8 Timothy Karr, "One U.S. Corporation's Role in Egypt's Brutal Crackdown (*Rola şirketeke amerîkî di zilma xedar a li Misrê de)*", The Huffington Post, 28 çile 2011

9 Li dosyaya Amesys a li ser malpera Reflets.info binihêrin

10 Diane Lisarelli û Géraldine de Margerie, "Comment Alcatel se connecte à la junte birmane (*Alcatel çawa elaqedarî cuntaya Bîrmanê ye*)", *Les Inrockuptibles,* Parîs, 26 adar 2010

11 "Le Parlement européen interdit la vente de technologies de surveillance aux dictatures (*Parlemana Ewropî firotina teknolojîyên şopandinê bo dîktatorîyan qedexe dike*)", Fhimt.com, 11 cotmeh 2011

MEHMET LATIF SAGLAM: **Rêza batirsokan**, li ser tuwalê boyaxa rûnî, 70 x 100 cm

Wergera ji fransî: Simko Destan

www.arsivakurd.org

Namzetên serokkomarîya Fransayê pêşnîyazên xwe yên ji bo reformekirina pergala perwerdeyê zêde kirin. Ne ji xwe ve, têkoşîna li dijî bêkarîyê, kêmkirina newekhevîyan û heta carinan yekîtîya neteweyî kê elaqedar dike. Li Fransayê û li dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hem li çepê û hem li rastê dersxaneyên dibistanan bi nirxên herî mezin ên siyasî hatine xemilandin. Lê belê gelo dibistan dikare bi rastî hertiştî bike?

Li hemberî newekhevîyan dermanekî xapînok

Gelo perwerde wê têrê bike?

John Marsh *

Di cotmehê de, dema ku protestoyên *"Wall Streetê dagîr bike"* dest pê kiribûn, ku li bajarên din ên Dewletên Yekgirtî û cîhanê belav bibin, Buroya Budçeya Kongreyê (CBO) ya ne-partîzan û xwedî îtîbar, (1) lêkolînek weşand, ku piştrast dikir ka xwepêşandêran çima park dagîr kirin, an ku newekhevîya aborî anîn rojevê. CBO di rapora xwe de dîyar kir ku ji 1979ê heta 2007ê, derameda (hatinî) piştî bacê ya malbatên naverast (derameda nîvê malbatan li jêr, nîvê wan jî li jor naverastê ne) 35 dersed mezin bû. Lê belê nakokîya mezin ew bû ku derameda naverast a yek derseda civakê, ku xwedî derameda herî zêde ne, 275 dersed mezin bû. (2)

Rojekê piştî ku CBO rapora xwe aşkere kir, qunciknivîsekî *New York Times*ê **Nicholas Kristof** gotareke bi serenavekî provokatîf belav kir: ***"Polê Dagîr Bike".*** (3) Kristof di gotara xwe de qala pirsgirêka newekhevîya aborî ya li Dewletên Yekgirtî dike. Lê belê di şûna bangkirina guhertina bac û qanûnan, yan jî destgîrkirina çend bankeran, wekî xelkê ku ***Wall Street*** dagîr kiribû dixwest, Kristof îdia dike ku *"tehna pêngav, ku herî baş dikare newekhevîyê kêm bike, dirêjtirkirina perwedehîya temenpiçûk a zarokatîyê ye."* Kristof weha berdewam dike: *"Xaleke hevbeş, dema ku ez li ser xizanîya li New York, yan li Siera Leoneyê dinivîsim ew e, ku ji rizgarbûna ji xizanîyê de perwerdehî, pêlikên otomatîk in ku mirov dikare pê ewle be."* Kristof dirêjahî pê dide: *"Hevbeşîyeke din jî ew e, ku çi li Amerîka çi li Afrîkayê be, zarokên bi dezavantaj pir caran wê derfetê nabînin ku li wan pêlikên otomatîk siwar bin."*

Ev banga ji bo perwerdehîya baş, da ku xelk pê ji nav xizanîyê derkeve, dibe ku di warê protestoyên dagîrkirina ***Wall Streetê*** de ecêb, xerîb xuya bike. Jixwe, yek ji daxwazên berbiçav, ku ji xwepêşandêran hatibûn, efûkirina deynên xwendinê bû, ku gelek ji wan herçend li pêlikên otomatîk ên ber bi perwedehîyeke baş ve lê siwar bûbûn jî, wan piştî mezûnîyetê nikaribûn ji xwe re karekî baş (yan jî karekî çawa dibe bila be) bibînin. Dîsa jî, di warê kêmkirina newekhevîya aborî de pêşnîyarkirina Kristof a perwerdehîyê gelek piştgirî wergirt. Di axaftineke xwe ya meha nîsanê de **Barack Obama** mebesta xwe ya *"dana perwerdehîya herî baş a guncyayî bo her piçûkên me"* dubare kir û got ji ber ku *"perwerdehîya herî baş a guncyayî di warê serkeftina zarokan de faktora yekta ya herî girîng e"* Wî herweha got: *"Perwedehî derfeta mifte ye. Di roja me ya îroyîn êdî meseleyeke mafên medenî ye."*

Lihevkirineke kêmdîtî

Balkêş e, ku ji ber ku her du partîyên siyasî yên li Dewletên Yekgirtî nikarin li ser hevbîr bin, ku îro kîjan roja hefteyê ye, her du muxalîfên ji alîyên dijber ên siyasetê yên wekî Kristof û Obama di wê bawerîyê de ne ku perwerdehî dikare wekhevîya aborî ewle bike.

Di destpêka sermawezê de, piştî ku komeke xwendekarên ***Zanîngeha Harvardê***, da ku pêşdarêzîyên wî yên kapîtalîst protesto bikin, ji dersa destpêka aborîyê ya **Gregory Mankiw**, ku yek ji şêwirmendên berê yên **George W. Bush** bû, derketin Mankiw jî di hevpeyvîneke radyoyê de behsa mezinbûna "ferqa navbera dewlemend û xizanan" kiribû. Lê belê wekî Kristof û Obama, Mankiw îdia kiribû, ku yek ji sedemên bingehîn ên newekhevîya aborî "pergala perwerdeyîyê" ye. Wî herweha bal kişand ser lêkolînekê ku îdia dikir: *"pirsgirêk ew e ku em têra xwe kesên perwerde hilnaberînin, da ku bikaribin bigihîjin daxwaza bilind a karkerên kalîfîye."*

Divê ev yek ne surprîz be, ku ewqas kes ku ji alîyên cuda cuda yên siyasetê tên, bawer dikin ku perwerdehî -carna bi tenê perwerdehî- tiştên ku me niha nerehet dikin, çareser bike, ku minasib e ku newekhevîya aborî jî tê de be. Ji bilî xwedê, amerîkî tu hêzeke bi ser perwerdehîyê nas nakin. Lê belê, gelo ev yek rast e? Giranîdana ser derfetên perwerdehîyê û serkeftinê dê bikaribe xizanîyê kêm bike? Gelo perwerdehî dikare wekhevîya aborî, ku her ku diçe mezin dibe, berevajî bike?

Di warê hebûna xwedê de, delîl carna têrê nakin. Bi rastî jî, rewş carna berevajî wê yekê nîşan dide: Ku di têkoşîna li dij xizanî û newekhevîya aborî de perwerdehî ristekê dilîze, ku dikare were îhmal kirin.

Wekî xeberdanên siyasî, dirûşmeyên wekî (di warê perwedehîya seretayî ya zarokan de) ***Head Start*** [1-0 pêş de dest pê dike], Ji bo asta herî bilind têbikoşe û bila tu zarok li paş nemîne, pir baş bi rê ve diçin. (4) Wekî polîtîka, ev slogan mehkûm in ku têk biçin. Di warê destpêkê de, ne dîyar e, ka qadên lîstîna perwerdehîyê bikaribin bipîvin. Di deh salên rabihurî de, gelek lêkolînan nîşan da, ku zarokên malbatên xizan, berî ku dest bi zarokxaneyê bikin, li gor zarokên malbatên dewlemend li paş in. Pir caran jî dibistan vê ferqa navbera wan zarokan wekî xwe dihêlin -ferqê kêmtir nakin. Wekî rojnameger **Dana Goldstein** di demeke nêzîk de nivîsîbû: *"Fikra hevbeş a lêkolînê aşkere ye û ev zêdeyî deh sal in ku nayê guhertin: Herî zêde jî hîndekarî bi tenê 15 derseda serkeftina xwendekaran dîyar dike, lê belê faktorên sosyo-ekonomîk dora 60 dersedî."* (5) Bi gotineke basît, sînorê wan tiştan heye, ku dibistan dikarin pêk bînin. Dibistan dikarin meyla zarokan, ku ew bi xwe re tînin dema ku dest bi perwerdehîya fermî dikin, kêmtir bikin, lê belê nikarin bi giştî biguherînin.

Wekî encam, ewên ku perwerdehîyê wekî çareserîya newekhevîya perwerdehî û aborî dibînin, di esasê xwe de wan tiştan piştguh dikin; dîyar dikin ka zarok di dibistanê de çawa bikin. Heger me bi rastî jî hewl bidaya, ku bandora xizanî û derameda nizim a li ser serkeftina perwerdehîyê bertaraf bikin, divîyabû em neketena li dû 15 derseda perwedehîyê, lê belê rasterast li ser çavkanîyê hûr bibûna; an ku faktorên sosyo-ekonomîk ên 60 dersedî. Heger em bi awayekî aşkeretir bibêjin; heger we divê ku zarokên xizan di dibistanan de serkeftîtir bin, nexwe perwerdehîya wan ji bîr bikin û di şûna wê de wan kêmtir xizan bikin.

Lê belê rêya ku ji wekhevîya perwerdehîyê ber bi wekhevîya aborî diçe, bi dijwarîteyeke sexttir re rû bi rû ye. Heger perwerdehî bikaribe serî bi bandorên xizanîyê re derxe û derfetê bide her xwendekarekî/ê ku bikaribe here zanîngehê, ev yek bandorekê li ser wê aborîyê nake, ku zarok bêyî ku lê were nihêrtin ka wan kengî dest pê kiriye, yan ew dê çi hîn bibin, bikevin navê. Da ku em bikaribin vê yekê bibînin ji xwe re *'quizek'*ê bikin. Di 2018ê de li Dewletên Yekgirtî kîjan kar dê bêhtir pozîsyonan veke: Bersiv? Kasîyer. A rêza duyemîn? Firoşkarên perakende. Rêza sêyemîn? Garson. Çaremîn? Nûnerên xizmetên mişterîyan. Ên sê hebên di dorê de? Hemşîre, amadekarîya xwarinan û karkerên xizmetkirinê û xebatkarên li buroyan.

Gelo wekhevîyekê bala we kişand? Ji bo tu karên li jorê dîplomaya lîsansê navê. Ji bilî hemşîreyan, ku ji bo wê jî dîplomaya dibistana pîşeyî divê, tu ji wan perwerdehîya kurt, yan jî dema naverast a li ser kar pêwîst dike. Û bi tenê hemşîre dikarin têra xwe pere bi dest bixin, bikaribin li ser sînorê xizanîyê debara malbata xwe bikin. Bi rastî, li gor Buroya Îstatîstîkên Kedê, heta 2018ê bi tenê yek ji çar karan dîplomaya zanîngehê pêwîst dike. Ji bo yên din wê tecrûbeya karî û perwerdehîya kar hewce be û li gor wê jî pere were dan.

Ev yek çima girîng e? Ji ber ku ne xem e em derfetên perwerdehîyê wekhev bikin û bawer bikin ku ew dê yeksan (wekhev) bin, divê *hin kes* bi telefonê tiştan bifroşin, li dikanan mal bifiroşin, sîparîşa we ya taştêyê bistîne, dilê mişterîyan xweş bike, hêkên we bikelîne û bersiva telefonan bide. Bi rastî jî gelek ji me. Û ne xem e; derfetên me yên perwerdehîyê çiqasî wekî hev bin jî, karên bi vî rengî dê her hebin. Em hemû nikarin herin zanîngehê. Yan jî em dikarin, lê belê dîsa jî hin ji me divê li McDonald'sê bixebite. Heger ne li cem McDonald'sê be jî, di 3 mîlyon karên amadekirina xwarinan de, ku di aborîyê de hene, û her yek jî di salê de dora 16,430 dolaran pere dide. Jê girîngtir, ji bo wan kesan, ku di van 10 mîlyon karên kêm-kalîfîye de kar bikin, perwerdehîya zêde dê neyê wateya mûçeyê zêde. Karên bi heqdestên nizim di bazara kedê ya Amerîkayê de serdest in. Tu nikarî da ku pereyê bêhtir bidî, xelkê hînî karekî bikî. Û pirsgirêk karên nebaş e, ne perwerdehîya nebaş, ku sedema bilindbûna neyeksanîya aborî ye. Derameda yên ku bi maeş dixebitin 1 dersed bilind bû, ji ber ku niha ya 40 dersedê kesên bi maeş êdî berjêr naçe.

Mehmet Latif Saglam: **Rêza batirsokan**, li ser tuwalê boyaxa akrîl, 120 x 150 cm

Dana ber xwe ya çareserîyeke din

Dema ku niha em li ser para 15 dersedî ya serkeftinê, ku dibistanek dikare kontrol bike,dipeyivin, em herweha li ser para wan kesan jî nîqaşê dikin ka dê kî bikaribe karên baş bi dest bixe û kî mecbûrî yên nebaş bibe. Yên ku ji bo perwerdehîyê gotûbêjê dikin û dibêjin dê bibe çareserîya neyeksanîya aborî xwedî awayê xwe ne, bi îhtîmala herî baş çend zarokên ji malbatên xizan dê bikaribin zanîngehê biqedînin û karên baş bibînin. Helbet, di warê peydakirina karên ji bo derçûyên zanîngehê de bazara kedê lîstikeke di asta sifir de be, ku piranî jî weha ye; wê demê çend zarokên ji malbatên çîna naverast jî karekî nebaş bibîne, ku zarokekî xizan dê bidîtaya. (Zarokên malbatên dewlemend di her rewşê de karên baş peyda dikin.) Tu caran nayê bîra me ku em karên nebaş baştir bikin. Heger ku em bala xwe didin ser derfeta yeksan a perwerdehîyê û wekhevîyê, em dê bikaribin nedadîyekê jî rast bikin: Jîyaneke zarokatîya xizan êdî dikare neyê wateya bêkarî û heqdestên nizim, ku niha piranî weha ye. Lê belê em dê mecbûr bimînin ku nedadîyeke mezin a rabihurîyê bi lêv bikin, ku bi dehan mîlyonên kedkar jîyana xwe bi bêkarî û bi heqdestên nizim derbas dikin.

Barack Obama û ên din, ku încîla perwerdehîyê îmze kir, pê kêfxweş in ku bibêjin derfetên perwerdehîyê di roja me ya îro de yek ji meseleyên mafên mirovan e. Ew divê meseleyên mafên mirovan a demên bihurî bînin bîra xwe. Di 1963yê de di dema ***Meşa bo Washingtonê*** de dema ku **Martin Luther King Jr.** axaftina xwe ya bi serenavê ***"Xewneke min heye",*** xwepêşandêr pankart hilkirin ku li ser wan ***"Kar û Azadî"*** hebûn. Meşvan li ser pankartan îllehîm 'Kar' jî nivîsandibûn, ji ber ku wan dizanî ku kar girîng e- çend heb, çiqas pere dida, kê ew kar dikir û ên ku ew kar dikir, dikarîn bibin endamên sendîkayê, hemû girîng bûn. Bi rastî jî, di 1968ê de, **King** meşeke din a ber bi Washingtonê ve bi rê xist, îcar mijar xizanî bû. Di dawîya wê salê de King li *Memphisa Tennesseeyê* hat teror kirin. Ew da ku piştgirî bide grêva karkerên zibilan çûbû wê derê. Roja berî kuştina wî, di axaftina xwe ya li pêşîya wê girseyê, ku ji bo guhdarî kirina axaftina wî kom bûbûn, wî gotibû: "Mesele, meseleya bêdadîyê ye." "Mesele redkirina dad û duristbûna Memphisê ya di reftara wî ya digel karmendên giştî ye, ku karê paqijîyê dikin."

Heta dawîya 'emrê xwe King têgihişt ku yeksanîya (wekhevîya) nijadan bêyî ku garantîya aborî bîne, dê bibûya xwedî wateyeke gelek piçûk. Heqê herkesî ji bo mafên medenî heye, ku wekhevîya perwerdehîyê jî tê de ye. Lê belê mafê wan ê ji bo wekhevîyeke naverast a aborîyê jî heye. Bi ser de jî, ji roja îro cudatir, King dîtibû ku herçend wekhevîya perwerdehîyê bi tena serê xwe gelek girîng be jî, garantîya aborî teqez bi xwe re nayne. Yên ku wekhevîya derfetên perwedehîyê wekî guherendina newekhevîya aborî dibînin, divê vê dîtina King ji bîr nekin. Wekî ku di 1968ê de bû, meseleya îro jî redkirina me ya reftara adil û durist a li hember karkerên me ye.

* Nivîskarê *Class Dismissed.WhyWe CannotTeach Or Learn OurWay Out Of Inequality (Ders xilas bû. Çima em nikarin fêr bikin, yan jî fêr bibin ji newekhevîyê xwe xilas bikin)*, Monthly Review Press, NewYork, 2011.

1 Kî gel li du komên weke hev dabeş bike, yek jê wê gelekî bistîne, ya din wê hindikî

2 Congressional Budget Office, "Trends in the distribution of household income between 1979 and 2007 (Meyilên di Dabeşkirina Hatina Maddî a Malan di Navbera Sala 1979ê û 2011ê de)", çirîya pêşîn 2011, www.cbo.gov

3 Nicholas Kristof, "Occupy the classroom (Dersxanê Dagîr Bikin)", *The NewYork Times*, 19ê çirîya pêşîn a 2011ê

4 Bi dorê: Bernameya perwerdê ya ji bo zarokên piçûk ên li nav derdorên "mexdûr" de; bûrsa ku didin eyaletên destekê didin "fikrên nû" yên der barê perwerdeyê de; û qanûna ku armanca wê "berpirsîyarkirina" eyaletan û dibistanan der barê serketina zarokan li dibistanê ye. Ew li gor encamên destketî û serketinên xwendekaran tên finanse kirin. Li ser vê xala dawîyê bixwîne Diane Ravitch, "Volte-face d'une ministre américaine (Bi Tevahî Çerxkirina Wezîrekî Amerîkî)", *LeMonde diplomatique*, çirîya pêşî 2010

5 Dana Goldstein, "Can teachers alone overcome poverty? Steven Brill thinks so (Gelo mamoste bi tena serê xwe dikarin ji heq xizanîyê derkevin? Steven Brill wisa difikire)", *The Nation*, New York, 10ê tebaxa 2011ê

Wergera ji îngilizî: Celîl Kaya

www.lemondediplo.com

BÛN AN JÎ NEBÛN

Gelo eger Shakespeare ne Shakespeare bûya?

WILLIAM PRENDIVILLE *

Di dawîya sedsala XIXem de, **Orville Owen**, doktorê li Detroitê, dawîya dawî aleta ku bi mehan li ser dixebitî, temam dike: Du lûleyên fireh li ser sêpêyên ji textikan bicihkirî, bi manîvelayekê tên xebitandin. Di navbera her du lûleyan de, tevneke bi sedan metre vegirtî û li ser tevnê, wî hemû berhemên **William Shakespeare** û yên gelek nivîskarên din ên pê re hevdem bi cih kirine. Baş e, projeya wî çi ye? Zîvirandina banda ji peyvan bi lezeke pêwist ji bo ku nasnavê veşarî yê ku wê bihêle ku **Owen** nasnameya rasteqîn ya helbestvanê îngilîzî derxe holê.

Piştî sedsalekê, profesorê matematîka bi ezmûn a Zanîngeha Washingtonê, **Sam C. Saunders** heman lêkolîn berdewam kir. Bi awayekî kêmtir gundîyane, malzemeya wî xwe spartê, bi vê formê xwe dide der:

$$H_{iii}(0,5) = \frac{1+(3/4)^5}{2} = \frac{1267}{2048} = 0,619$$

Hevkêşe îhtîmala girêdayî îdiaya qral Claudisuê di dema xwelihevrakêşîna di beşa V. a pîyesa ***Hamlet*** de dipîve. Qeşmer **Osrîk** bi vî awayî ji mîrê ciwan ê danîmarkî re rewşê rave dike: *"Qral, birêz, îdia kiriye ku di dozdeh hemleyan de wê* ***Laërtes*** *sê derbeyan lê nexe"*. Armanca vê formula matematîkzan ew bû ku zehmetîya hesabê navbihurî nîşan bide û bibêje ku ev operasyoneke di wê serdemê de *"bi awayekî potansîyel li derveyî îmkanan e"*. (1) Ango, li pişt Shakespeare bivênevê kesekî din veşartî bû û zanîna wî kesî ya der barê zanista matematîkê de wê eşkere bibûya.

Ji tembûran heta hevkêşeyan, gelek teorîyên hatine formule kirin ji alîyê romannivîs **Henry James**, **Mark Twain**, gerînendeyên **Chalie Chapin** û **Orson Welles**, psîkanalîst **Sigmund Freud** an jî, berî demeke nêz, hilberîneke mezin a hollywoodî (Roland Emmerich, *Anonymous*, 2011) ve li holê ne. Tevî cudahîyên navbera wan, hemû heman pirsê dikin: *"Çawa dibe ku Shakespeare, kurê lepikvanekî ji derbajêr ê bêperwerdeyeke cidî, wê bikarîbe ev şaheser nivîsandibe?"*. Rojnamevan Anthony O. Scott jî ev pirsa wan wiha formule kiriye*: "Gelo ne ber bi aqiltir e ku mirov bawer bike ku ew şaheser ji alîyê kesekî pêkhatîtir û zanatir ve hatibin afirandin?"*. (2)

Gumankar bi kêfxweşî bi bîr dixin ku der barê zilamê Stratford-upon-Avon de pir kêm tişt tên zanîn. Wî zevîyek ji xwe re kirîbû, pere bi deyn didan û diket pey şopa kesên ku nedixwestin pereyên wî lê vegerînin. Wî wekî din di komeke şanoyê ya londonî de dilîst û dixwest li cihê lê hatiye jîyanê were veşartin. Lê belê wesiyetnameya wî gumanê bi mirov re çêdike: Tasik û kasik, sênîkeke zîvîn, şûrek, cilûberg û referanseke ecêb ji bo *"nivîneke din a baştir"*, ku Shakespeare ji jina xwe re vediqetîne... Ne destnivîsek, ne jî pirtûk: *"Îhmalkarîyeke seyr eger helbestvan bi rastî ew be"*, bi wan gotinan wî dinirxîne perwerdekarê zanîngehê Richard F. Whalen. (3)

Bi qasî dused sal û nîv berê, gelek tesbîtên din ên wisa hene. **Delia Bacon**, keça wezîrekî kevneparêz dikeve nav hewldana îsbatkirina vê yekê ku hejmareke kesên arîstokrat ên xwedî ramanên komarparêz –ku yek ji wan zanyar **Francis Bacon** e– ji bo berbelavkirina felsefeya xwe, pîyesên şanoyê nivîsandibûne. Pir bi ihtiyat, nasnameyên xwe vedişartin, lê bi navgîna hin nasnavan ew yek dikirin. Di 1857ê de, berî ku li nexweşxaneyeke psîkîyatrîyê rojên xwe yên dawî bijî, wê berhema xwe ya bi navê *The Philosophy of the Plays of Shakespeare Unfolded* ("Felsefeya Eşkerekirî ya Pîyesên Shakespeare") weşand.

Li gel vê yekê jî, li gor profesor **Gail Kern Paster**, dema di çarçoveya xwe ya serdema Elîzabeth de ji nû ve tê bi cih kirin, derdikeve holê ku ev ihtiyata dîrokî ya nivîskarê dramê *"rewşeke texmînkirî ye"*: *"Em di der barê cotên Shakespeare de tiştekî zêdetir nizanin"*. (4) Û dûre, eger wesiyetname behsa destnivîsên wî nake, ji ber ku ne di destê wî de bûn. Di wê serdemê de, komên şanoyê dest datanîn ser tiştên taybet. Weke ku edîtorên weşana Norton ya tevahîya berhemên Shakespear îzah dike (1997), pirsgirêka bîyografîya nivîskar, *"ne ku detay kêm in, lê ew detay tengezarker in"*.

Delia Bacon qutîya Pandora jî vekiribû: Komên civakî yên "bakonîgir" ji her alîyê Atlantîkê ve xwe bi serûber kirin bêyî ku ti caran bala xwe bidin ku jîyana Delia Bacon bi xwe –keçeke ciwan a ku xwe bi xwe perwerde dikir û derdora wê ya civakî nedihişt mirov bawer bike ku ew ê bibe bispora berhemên Shakespear– telkîn dikir ku mumkin e jîyana kurê lepikçêkerê Stratford bike ku berhema Shakespeare derkeve holê…

Nêzî sedsalan paşê, hilweşîna stêrka bakonîgir jî vê lêpirsîna der barê "Shakespeareê bira de" bi dawî nayne. Çirûskên stêrkeke nû îca ronahîyê didin ser vê serpêhatîya lêpirsîn û lêkolînan: Yên Edouard de Vere, hivdemîn kontê *Oxford*ê yê ku Fransîs Bacon weke namzedekî favorî ji text tîne xwar. Rêbaza lêpirsînê guherî: Êdî ji hev derxistina peyamên veşarî yên di nav pîyes û helbestan de, ne mijara gotinê ye, ji niha û şûn ve tiştê tê kirin ronîkirina wekhevîyên navbera bîyografîya kont û hin hêmanên vebêjî yên "berhemê" ye.

Deyza delîlan her diçe mezintir dibe. *Oxford* pir baş haydar bû ji Îtalyaya ku lê, qet nebe qismî be jî, zêdetirî sêyekê perçeyên belgeyan peyda dibin. Dema ji alîyê korsanan ve hatibû girtin, wî zilamek dabû ber xenceran, eynî mîna **Hamlet**. Mîna qral **Lear,** kont jî dikete nav têkilîyên dijwar li gel sê keçên wî. Awayê wî yê jîyanê, yê bêserûber, bi awayekî ecêb dişibe yê **Falstaff**, amatorê zewqên cîhanî yên pîyesên *Henri IV* (beşên 1 û 2). Hê jî ecêbtir: Pesindarîyeke ji bo *Oxford* dibe referans ji bo leza wî ya *"bi hejandina riman"*, bi îngilizî *"shakes spears"*. Û dûre, di 2001ê de, lêkolînek derdixe holê ku ji qasî hezar beşên notkirî di nav Încîla îngilîzê esîl de, zêdetirî sêyekê wan di pîyesên bi îmzeya Shakespeare de hatibûn dest nîşan kirin…

Eger mirov bifikire ku berhemên Shakespeare modalîteyên karê helsingandineke bîyografîk in, xwendineke anakronîk a tekstên ku demeke dirêj berî vê kevnoşopîya wêjeyî, hatine nivîsandin, dibe mijara gotinê. Li gel vê yekê jî, senaryoyên nû derdikevin holê. Yek ji wan jî wiha ye: Yarê berê yê qralîçe Elizabeth (ku hin kes herwiha weke diya wê dinirxînin), *Oxford* wê biryara bikaranîna navê **William Shakespearek**î dabûbe, ji bona ku sehneyê ji bo dîtina hesabên xwe yên siyasî bi kar bîne. Û zêde ne girîng e eger dozdeh dane ji pîyesên ku li ser navê Shakespeare tên zanîn, piştî mirina kont, di 1604ê de hatibin nivîsandin. (5)

Lewre çavkanîya gengeşîyan dibe ku ji analîza bûyeran (kêm in) bêhir tiştekî din be: Daxwaza, di her serdemê de, qeydkirina helbestvan li nav gotarên ku dor bi dor, civakên cihêreng hêvî dikin ku li ser wan hatibin hilberandin, bi tarîfa xwe ya "deha". Di dema Restorasyonê de (1660-1689), pîyes careke din hatin nivîsandin da ku Shakespeare, tevî ku weke rêberekî sincî tê tarîf kirin, bersivê zêdetir bide îmaja ku ji bo wî dihat çêkirin. Di pîyesa *Qral Lear* de, Cordelia ya bi fezîlet nema dimire: Ew dizewice û temenekî pir dirêj dijî. Hê di demeke nêzîktir de, **Stephan Greenblatt**, yek ji bisporên amerîkî yên herî navdar, analîza xwe ya di nav *Will in the World* de dide xuya kirin (WW Norton & Company, Londres, 2005) ji bo nîşan bide ku *Bazirganê Venîsê* –ku dişibe formeke antîsemît a hevpar a serdema **Elîsabeth**– di eslê xwe de bersiveke *dij*-antîsemît dide pîyesa **Christopher Marlowe** ya bi navê *Cihûyê Maltayê*...

Zanyarê jîr, arîstokratê romantîk, oldarê dilovan, ronakbîrê xwedî doz bi hewldanên xwe yên parastina binketîyan: Lêpirsîna ji bo "Shakespeareê rasteqîn" bi gelek reng û navlêkirinan tê xemilandin.



BRYCE WOLKOWITZ GALLERY, NEW YORK

AIRAN KANG: **Sone 18**, 2009

Lê belê di her serdemê de xaleke hevpar hemû dij-stratfordîyan li hev digihîne: Formeke kêm zêde îtîrafkirî ya bijartebûnê. **Delia Bacon** zilamên li **Stratford**ê hatî dinê bivênevê bi vegotina *"ehmeq û alfabenenas"* biçûk dixist. (6) Wekî din, dîsa bi heman rengî, nêrîna **John Thomas Oxfordî** jî diguncîya bi vê awira di bin tesîra nostaljîya ji bo serdema feodal û nirxên sinifa esîl. Bi nameyeke ku di 2yê nîsana 1937ê de ji Arenold Zweit re dişîne, Freud jî ji alîyê xwe ve weke bîrbirineke *der-hişî"* dibîne ku mirovekî ji sinifeke bindestan karibe bi xeyalên xwe vê tevna hûr û kûr ya *"rewşên nexweşîya nevrotîk ên Hamlet, hêçîtîyên Lear, ta û coşên Macbeth, hesûdîya Othello, û hwd" afirandibe*. Freud nameyê bi vê hevokê diqedîne: *"Hindik maye dilê min bixele ji ber ku hûn dikarin bîra tiştekî wisa jî bibin"*.

Ev analîz xwe dispêre tiştê ku Paster wiha rave dike: *"Nirxandineke glover a tiştê ku wê bûbe sedemê bêoxurîyeke bi kokên xwe derbajarî û gundîtîyeke pir qeba"* di serdema Elîzabeth de. Ev di heman demê de dibe awirek ku *"serûberîya klasîk ya perwerdeyê biçûk dibîne û beramberê wê yekê jî berbelavbûna zanînên arîstokrasîya li Serdema Tudoran zêde mezin dibîne"*. (7) Serdemeke ku tê de bi qasî Ciceron, Oviden, bi qasî Virgile, Quintilian dihat xwendin, gelek kesan îlham didan berheman.

Ne bi dilê hin heyranên wî be jî, Shakespeare di civakeke ku gelek caran şano weke cihê depravasyonê dinirxand, sehne tercîh kiribû. Wî, dibe ku ji xemên fîlozofîk an jî ji temaşekirina gerînekên gîyana xwe bêhtir, ji bo qezenckirina pereyan û ji bo kêfûsefayê –çînên gelêrî, hezkirên şanoya serdemê jî di nav de. Bi her halî, têra xwe muhteşem, helbestvanê Stratfordê dîsa jî dibe ku di destpêkê de ne zêdetirî dramaturjekî "asayî" ê serdema Elîsabeth bû –eynî weke Christopher Marlowe, kurê koşkal û Ben Jonson, şagirdê hosteyekî dîwaran. Gelo berhemên wî wê kêmtirî wan xîtabî me bikirana?

* Nivîskar, xwedîyê pirtûka bi navê *Paname/Paris*, Mosaic Press, London, 2009.

1 "Could Shakespeare have calculated the odds in Hamlet's wager ?", *The Oxfordian*, volume 7, New York, 2002

2 "Shakespeare, signifying nothing", *International Herald Tribune*, Neuilly-sur-Seine, 2 novembre 2011

3 Richard F. Whalen, " Cursed Be He Yt Moves My Bones ", *Harper's Magazine*, New York, nîsan 1999, hin agahîyên li vir hatine dayîn, ji wê nivîsê hatine wergirtin

4 Gail Kern Paster, "The Sweet Swan", *Harper's Magazine*, *op. cit.*

5 James Shapiro bi awayekî îqnakir telkîn dike ku beşeke mezin a pîyesan ji xebatake hevkarîyê (pêleke wêjeyî ya serdemê) ya têkildarî William Shakespeare derdikeve holê (*Contested Will. Who wrote Shakespeare ?*, Faber and Faber, Londres, 2010)

6 Nivîseke ji James Shapiro wergirtî ya (*op. cit.)*, fitlonekên "hevnegirtî" hûrûkûr rave dike

7 Gail Kern Paster, *op. cit.*

Wergera ji fransî: Baran Nebar

www.kurdi.org

ÇAND Û HUNER

Keştîya Penaberan

Jan Dost



Jîyana li penaberîyê, sirgûnî û jana xurbetê ji mêj de bala gelek nivîskaran kişandiye. Ev bi serê xwe dikare bibe mijara lêkolîneke dûr û dirêj ku ev cih têrê nake. Nivîskarên ku rewşa xerîbîyê bikin mijara nivîsên xwe ne mîna wan ên ku bi xwe di nav wê rewşê de bin. Yek ji wan nivîskaran jî **Arşevê Oskan** e ku bûye çend sal li xerîbîyê ye û jana wê dikişîne, diçêje û dide çêjandin jî.

Arşevê Oskan ku mîna helbestvanekî dihate nas kirin, vê dawîyê derbasî qada romanê jî bû. Sala 2010ê romana wî ***Keştîya Penaberan*** ji weşanxaneya ***Do***yê li Stenbolê derket.

Di vê kurteromana ku ji 111 rûpelan pêk tê de, nivîskar tecrubeya xwe ya bi penaberîyê re tîne zimên û li ber destê xwendevana radixîne. Ji rûpela yekem helbestvanîya nivîskêr xwe li rûyê mirov dide. Navê beşê yekem *Keştîya Werimandî* ji çîrokên koçberan e û bi wî awayî navên beşên mayî jî ku nîşana zimanekî helbestî ne.

Pêşî bêjer (tenê di beşê dawîyê de keştî dibe vebêjer) pesnê gemîya navdar: **Bibby Altona** dide, wê bi avahîyekê dişibihîne ku di nav çemê ***Elbe***yê de ye. Û ji wir dest pê dike rewşa penaberan, çîrok û serpêhatîyên wan vedibêje. Di nav re berê bûyeran dide welêt. Ji xerîbîyê vedigere ser axa welêt li Qamşlo û çîroka serhildana 2004ê jî vedibêje. Di riya Ferhad re ji destpêka serhildanê heta dawîya wê di beşê *"vedenga janên welêt li kolanên bîyanîyê dijenin"* de vedibêje.

Ji bilî Ferhad û çîroka wî, em li çîrokên Îbo û Bedo û Miho û xeyrî wan jî guhdarî dikin û dixwînin. Di vir de ez dixwazim vê dîyardeya ecêb di roman û çîrokên kurdî (kurmancî) de bînim zimên. Wek ku min bala xwe dayê piranîya nivîskarên me navên karekteran wek ku li gundan tên bi lêv kirin, dinivîsin. Ev bi dîtina min qelsîya nivîskaran e ku nikarin berhemê ji asta gund bigihînin asta bajêr. Roman û pexşan bi giştî neynika bajarvanîyê ne û berhemên civakeke pêşketî ne, lê em her di vê neynikê de li gundîtîyê temaşe dikin, bêyî ku ez tu wateyên negatîv bidim peyva gundîtîyê.

Zimanê ku ev berhem pê hatiye nivîsandin, zimanekî rihet û aram e. Lê ez vê yekê jî êdî wek qelsî lê dinêrim. Rihetbûna ziman tê wê wateyê ku nivîskar li ser ferhenga xwe baş naxebite û vekolînan di qatên zimên de pêk nayine, loma jî gewher û abîde û gencîneyên ziman her û her veşartî û bin ax dimînin.

Arşevê Oskan kî ye: Nivîskarekî ji Başûrê Rojava ye. Niha li Hamburgê dimîne. Sala 1967ê li gundê Bîrkinêsa ku dikeve navbera Serê Kanîyê û Dirbêsîyê, ji dayik bûye.

Kitêbên wî: Hêvîyên birîndar. Helbest. 1995, Kê gul çinî? Helbest. 1999, Berbanga qedexe. Helbest. 2001, Ji 2001ê heta 2003yê sernivîserê kovara ***Zevî*** bû.

"Romana kurdî û nasname" ya Haşim Ahmedzade

Amed Kanî

Nivîsên **Haşim Ahmedzade** ên li ser romana kurdî bi navê *"Romana kurdî û nasname"* di nav weşanên ***Avesta***yê de çap bûn. Kitêba ku edîtorîya wê **Remezan Alan** kiriye ji alîyê **Fahrîye Adsay** ve, ji ingilîzî bo kurdî hatiye wergerandin.

Di pêşgotinê de Haşim Ehmedzade wiha dinivîse:
"Ev kitêb wergera kurdî ya hin gotarên min ên bi ingilîzî ne, ku di dawîya salên 1990ê û dehsalên pêşî ên vê sedsalê de di hin kitêb û kovarên akademîk de hatine weşandin. Gotar bi giştî li ser romana kurdî û wechên wê yên cuda yên wêjeyî, civakî û sîyasî disekinin. Argumenta serekî ew e ku roman, di peywendên din de jî wisa ye, manîfestoya wêjeyî ya modernîteyê ye. A din, qedera modernîteyê ya di peywenda ku romana kurdî jê derketiye û bi pêş ve ketiye de, hin taybetîyên spesîfik dide vê cureya wêjeyî. Armanca vê gotarê guftûgo kirina van babetan e…

Xwendin û Nirxandin

Ev pirtûka giranbiha ji deh gotarên hêja yên li ser romana kurdî pêk tê. Ez dê hewl bidim li ser naveroka hin van gotaran rawestim.

Gotara yekemîn bi navê ***"Di romana Kurdî de Guherînên Şêweyî û Babetî"*** tê pêşkêş kirin. Nivîskar, ji destpêka romana kurdî (wek tê zanîn romana **Erebê Şemo** "Şivanê Kurmanca" destpêka nivîsîna romana kurdî ye) ta sala 2010ê, bi berfirehî li ser guherînên di romana kurdî de, li gor pîvanên wêjenasên navneteweyî yên wek **Frederic Jameson, Lucien Goldman** û hwd. radiweste. Bi kurtahî li ser bandora "realîzma sosyalîst" ku di romanên **Ereb Şemo** de vekirî li ber çavan e, agahîyên balkêş dide. Paşê balê dikşîne ser "realîzma efsûnî, surrealîzm, postmodernîzm û 'romana nû' " ya kurdî. Mirov dikare bibêje ku ev gotar ji hêla çavkanîyan de gotara herî dewlemend a vê pirtûkê ye ku pêwîst e her wêjenasê kurd ji van çavkanîyan agahdar be.

Gotara duyemîn bi navê ***"Di Romana Kurdî de Nîşaneyên Bêdewletbûnê"*** tê pêşkêş kirin. Nivîskar di vê gotara xwe de li ser van romanan radiweste: 1. Janî Gel (Îbrahîm Ehmed), 2. Dirîk û Gul, (Îbrahîm Ehmed), 3. Şar (Husên Arîf), 4. Êwarey Perwane (Bextîyar Elî), 5. Mergî Taqaney Dûhem (Bextîyar Elî), 6. Dwahemîn Henarî Dunya (Bextîyar Elî), 7. Gulî Şoran (Eta Nîhayî), 8. Balindekanî Dem Ba (Eta Nihayî), 9. Ronî Mîna Evînê, Tarî Mîna Mirinê (Mehmed Uzun), 10. Karmamiz (Elî Hesenyanî-Hawar), 11. Rêya (Muhemmed Mewlûd-Mem), 12. Komele Şaxe Berz û ... (Kurdan), 13. Rawemasî (Fazil Kerîm Ehmed), 14. Hesar... Segekanî Bawkim (Şêrzad Hesen), 15. Tarmayî Helepçe (Rêbwar Reşîd), 16. Jîyan Bedem Ziryanewe (Teyfûr), 17. Koç (Mahabad Qeredaxî), 18. Bilind û Newî (Nesrîn Caferî), 19. Sobarto (Helîm Yûsif).

Bêdewletbûn, wek babeteke serekî ya romana kurdî ye. Ew romanên ku me navên wan li jor pêşkêş kirin, di vê babetê de hevbeş in.

Nivîskar di gotara xwe ya pêncem de bi tevayî li ser romana kurdî ya li Kurdistana Îranê (Rojhilatê Kurdistanê) radiweste. Wiha dest pê dike: *"**Di warê wêjeya kurdî de yek ji zehmetîyên mezin, parçebûyîna wê ye. Ji ber dabeşbûyîna civakên kurd û tunebûna yekîtîya siyasî û netewî, niha wêjeya kurdî wek 'wêjeyeke netewî' ku jêderka wê netew dewletek kurd be, nikare bê bi nav kirin."(r.111).*** Gotarên nivîskar yên 4-5 jî nîşan didin ku nivîskar di analîzkirina romanên bi zaravayê kurmancîya jêrîn de serkeftîtir e.

Gotarên din yên Ahmed Haşimzade di pirtûkê de bi van serenavan têne pêşkêşkirin: ***"Li Pey Romana Kurdî ya ji Me re Vedibêje ku Kurd Kî ne", "Cîhana Romanên Jinên Kurd", "Ji Çîyayên Kurdistanê ber bi Kolanên Ewropayê", "Raçavkirinek li ser Jîyannûsîya Kurdî", "Di Berhemên Eta Nihayî de Nasnameyên Dijber".***

Bi kurtî em dikarin bêjin ku kesên têkilîya wan bi wêjeyê re hebe, pêwist e vê pirtûka ku ji deh gotarên bi metoda zanistî li ser romana kurdî hatine nivîsîn, pêk tê, bixwînin û li ser wê nîqaşan bikin.

Ji hêla daçekan ve hinek kêmasîyên wergerê hene, ez dixwazim balê bikşînim ser wan:
"Hin nivîskar hene ku ji civakên xwe yî Rojhilatî qet derneketine, lê ji alîyê şekl û şêweyê di afirandina romanên wek yên Rojavayî ve serkeftî bûne."(r.15).
Divê wiha bê nivîsîn:

"Hin nivîskar hene ku ji civakên xwe yî Rojhilatî qet derneketine, lê ji alîyê şekl û şêweyê ve, di afirandina romanên wek yên Rojavayî de serkeftî bûne." (ji ... ve, di ... de wek pêş daçek û paş daçek ên qalibî ne. r.48).

Li ser wergerê bandora perwerdeha bi zimanê tirkî xuya ye. Wek mînak: "Îspat", "tespît", "şehis", "teşhîs" û hwd. Hinek peyv jî şaş hatine bi kar anîn: Wek mînak, "Çespandin" di cîyê "çewsandin"ê de (ji serî heta rûpela 155an), "îdraq" di cîyê "îdrak"ê de û hwd.

Ji bo redaksîyonê jî dixwazim çend kêmanîyan bînim zimên. Bîyografîya (Têbinîya 67. r.77) Eta Nihayî bi şaşî ji bo Bextîyar Elî jî wek bîyografî (Têbinî 83. r.81) hatiye nivîsîn. Di rûpela 157ê de wiha hatiye nivîsîn*:"Ya din Rezanê ye û bi zilamekî ku gelekî ji wê mezintir û du zarokê wî hebûye, zewicîye."* Divê wiha bihata nivîsîn*:"Ya din Rezanê ye û bi zilamekî re ku gelekî ji wê mezintir û du zarokên wî hebûne, zewicîye."*

'Gula Reş', 'M' û 'Maleke Ji Avê'

'M'ya Şêrzad Hesen

Salihê Kevirbirî

Bi berhema xwe ya bi navê '**M**'yê, Şêrzad Hesen bi me dide selmandin ku ew yek ji hosteyên 'lêkirina dîwarê kurdî" ye. Hosteyekî wisa ku bi peyv û hevokan dikeve zikrê. Dema min rahişt kitêba mijara dabaşê, pê hesiyam ku ji sê kurteçîrokan pêk tê; **Gula Reş**, **M** û **Maleke Ji Avê**.

'Hêro tu hebûyî…
Çima dabeş bûyî?!
Hêro tu winda bûyî
Êdî tu nemayî û nînî.'

Kurteçîroka ***Gula Reş*** bi van hevokan dest pê dike ku seranser ji bangawazî û hawara Hemo pêk tê. Li gor bilêvkirina wî bixwe 'Hemokê Tirş û Tehl' ji peyva yekem heta ya dawîyê doza vekirina pencereyê li evîna xwe Hêroyê dike, lê bêfeyde, ew pencere venabe. Gul; gulên reş û gula mor, 'derdekî bêderman' e ji bo Hemo. Herçî derman, Hêro ye. Lê bêçine ye:

'De wê pencereya xwe veke. Gulên mor ên di her du guldankan de av bide.', 'De wê pencereyê veke. Ez mirim. Gulan av bide, çilmisîn û pelên wan weşiyan, wan nekuje…" Lê Hêro, ne pencereya xwe vekir, ne gulên mor av da… 'Gula Reş' kurteçîrokeke monologîyê ye ji devê Hemo.

Bendewarî, şkestin, tirs, bêhêvîtî, geryana li pey evîneke mezin lê bêmiraz, cudahîya di navbera maldar û belengazan de çend dîyardeyên berbiçav ên kurteçîrokê ne.

Kurteçîroka ***Maleke Ji Avê***, kurteberhemek e ku ji berhema ***Pîrê Perwaneyên Êvaran*** hatiye wergirtin. Şayanê gotinê ye ku berhema navbihurî di sala 2004ê de li Silêmanîyê hatiye weşandin.

Dikarim bi hêsanî bibêjim ku kakilê kitêbê kurteçîroka '**M**'yê bixwe ye ku navê xwe daye berhemê. Lehengê kurteçîrokê Emîn e. Emîn çîroknivîs e. Mêrê Gulnazê ye. Birayê Enwer e. Bavê sê keçan e. Lê tiştê hatî serî nehatiye serê 'gurên çîyayan jî!' Nivîskarî, qelem, kaxez, edebiyat li tu deverî -wekî ku hatiye serê Emîn- nebûne nîrê bêyomî û xezebê û neketine stûyê tu kesî.

Emîn naşibe kesên civaka xwe. Ji herkesî cudatir e. Tevî ku her sê jî keç in, qedrê zarokên xwe dizane. Ji jina xwe Gulnazê hez dike. Dem tê ji mêranîyê dikeve, ji ber vê hezkirinê talaqê jinê dide destê wê. Azadîya wan dide destê wan. Telaqê dide wê jina ku mal li ser wê 'tapo' kiriye. Tew tembîyan li keçên xwe dike ku diya wan mêr bike: *'Keça min, ew hê ciwan e û bi hewes e…'* Tapokirina malê li ser jinê, benîştê devê kuçe, kolan û bajêr e. Navê 'qehpetîyê' li pey Gulnazê ketiye, Enwer bi her awayî kuştina kevnejinbira xwe xistiye serê xwe, Emînê belengaz dilrehm e, nerazî ye.

Emîn bi hevalên xwe yên meyxwer dide nas kirin. Bifermin mirovekî edîb, di civakekê de çawa tê tepisandin, nizimandin û rûxandin:

- Ev jî birayê min Emîn e.
- Çi karî dike?
- Fermanberekî teqawid e.
- Fermanber û hew?!
- Na… Dibêje çîroknivîs im.

Bi pêkenîn û laqirdî dibêjin:
-Vêga çîrok ne kesibkarî ye, tu pereyan ji vî karî derdixî?

Dema Enwer ji min dipirse:
- Di çîrokan de pere hene?
- Min bi cesaret digot:
- Naxêr bira…
Mêvanên navteng stûr, li ser vê yekê dikin loqe-loq, mîna hirçên semakaran di zikên wan de ye, bi tasewas dibêjin:
- Vêga tiştê ku pere tê de nebin, çima tu dikî navnîşana xwe?

Pêwîst e dîyar bikim ku ji hêla rêzimanî ve şaşî hene. Di 'Maleke Ji Avê' de çîrok wiha dest pê dike: *'Pir bi lez serokê êlê hemû endamên êla xwe **civand** û ji wan re got:'* Ne ku *'civand'* lê *'civandin'* rast e. Ji ber ku *'kesek gelek kesan'* ango *'wî ew civandine.'* Di heman paragrafê de hevokeke wiha heye: *'Vêga ku ji kevîya deryayê me **we avêt** nav babelîsk û şepêlan.'* Di vir de jî divê peyv ne ***'we avêt'*** bûya lê ***'hûn avêtin'*** bûya: *'Vêga ku ji kevîya deryayê me **hûn avêtin** nav babelîsk û şepêlan.'* Li hêla din şaşîyeke din jî heye kul i gelek deverên kitêbê bi eşkereyî xuya dibe, ezê tenê mînakekê bidim: *'Lê nexweşî û ketina min a nav nivînan, wiha li min kir ku kêfa min ji xwendina romanan re bê, romanan **min** ji nav van her çar dîwaran **derdixist** û min **dibir** cihên xweş.'* Hevoka rast ev e: *'Lê nexweşî û ketina min a nav nivînan, wiha li min kir ku kêfa min ji xwendina romanan re bê, romanan **ez** ji nav van her çar dîwaran **derdixistim** û **ez dibirim** cihên xweş.'*

'Gula Reş' û 'M' ji kitêba bi navê Gula Reş (Bexda, 1988), 'Maleke Ji Avê' jî ji berhema 'Pîre Perwaneyên Êvaran' hatiye wergirtin.

Şêrzad Hesen, Li bajarê Hewlêrê, taxa kevin a bi navê Xaneqa ji dayik bûye. Sala jidayikbûna wî baş ne dîyar e, lê sala 1951 yan jî 1952yê hatiye dinyayê. Xwendina xwe heya berî zanîngehê li Rewandûz û Hewlêrê kiriye. Di sala 1974-75ê de li Zanîngeha Bexdayê Beşê Ziman û Edebîyata Îngilîzî qedandiye. Wî nivîsên xwe yên pêşî di navbera salên 1975-78ê de di kovara ***Roşinbîrî Niwê*** ku li Bexdayê derdiket de, belav kir. Hesen, di navbera salên 1978-82yê de kurteçîrokên xwe di kovarên ***Beyan*** û ***Hawkarî*** de belav kirin. Şêrzad Hesen gelek berhem ji îngilîzî wergerandine kurdî û xwedîyê gelek çîrok û romanan e: 'Tenahî', 'Gula Reş', 'Hesar û Segên Bavê Min', 'Deşta Karmamizên Kuştî', 'Xewna Pîrepindan', 'Pîre Perwaneyên Êvaran.' Ew niha li Silêmanîyê dijî.

M, Şêrzad Hesen, Ji Soranî
Bo Kurmancî: Besam Mistefa,
Weşanxaneya Avestayê, Kurteçîrok,
80 rûpel.

www.kurdiyaakurd.org

Weşanxaneyên Kurdî

Jan Bada

Weşanxane, di pêşketina civakan de xwedî roleke girîng in. Di nav xebatên medyayê de, di kar û barên ragihandina rojane de weşanxaneyên pirtûkan diweşînin, gelek girîng in: Berhem û weşanên wan ên wek pirtûk dikarin hertim ji nû ve bên weşandin û belavkirin; bandora wan li ser civakê hertim heye. Civak bi medyaya rojane dibe xwedîya agahdarîyên rojevê, lê ji pirtûkan gelek tiştan fêr dibe, dikare hertim bixwîne û kengê bixwaze pirtûk amade ne, wek dostên wefadar di nav refan de li benda xwendevanên xwe aram radiwestin.

Weşanxane ne bi tenê pirtûkên fêrkirinê, herwiha pirtûkên dilnewa jî diweşînin; roman, helbest, çîrok, bîranîn, şano, senaryo ûwd. ne tenê tiştan fêrî mirovan dikin; ew dengdarîya dil, bangewazîya gîyan û livbazîya vîyanê jî dikin. Gava mirov pirtûkên wêjeyî dixwîne, ji westandina rojê vedigere aramîya navxweyî, dengê xwe, dengê aramîya hundirê xwe guhdarî dike, bi xwe re aşt dibe. Kêlîyek be jî bi xwe, bi aramîya xwe re bi tenê dimîne. Dikare ji nû ve bifikire; pêş û paşeroja xwe bîne ber çavên xwe, kêm û kurtahî, rastî û şaşîyên xwe ji ber çavan derbas bike. Aramîya dil, gîyan û hişmendîyê nebe, mirov nikare çavdêrîya xwe bike, tenê bi tiştên dervayê xwe mijûl dibe.

Weşanxane xwedî roleke girîng in. Gelên cîhanê gelek zêde sûd ji berhemên wan werdigirin lê kurd… Kurd ji vê yekê jî bêpar in: Heta demeke berîya niha li gelek deverên Kurdistanê bi zimanê kurdî weşan qedexe bû. Encamên van qedexeyan hîn jî nahêle ku weşanxane di karên xwe de serkevtî bin, ji ber ku nikarin pirtûkên çap dikin, belav bikin, xwendevanên wan gelek kêm in. Mînak piranîya kurdên bakur nikarin bi zimanê xwe bixwînin, zimanê wan nebûye zimanê dibistan û perwerdeyê. Weşanxane bi bername û mijarên herî xurt jî derkevin, nikarin berhemên xwe zêde belav bikin û bi firotina van berheman hebûna xwe berdewam bikin (em li vê derê behsa nivîskaran nakin, ka ew di çi rewşên dijwar de berheman çap dikin). Di van salên dawîyê de hin derfet derketine holê, lê ev derfet hîn baş belav nabin, bi temamî nagihîjin cîyên pêwîst. Hin weşanxaneyên kurdî dikarin weşana xwe berdewam bikin, derfet bi vî awayî çêbûye lê…

Ji alîyê din ve gelek weşanxaneyên kurdî hene, temenê wan têrî çend berheman dike, paşê wek kulîyên berfê ji asîmanan dadiwerin jêr û dihelin. Weşanxaneyên pîşeyî hîn çênebûne, mînak: Hîn weşanxaneyên pîşeyî yên zanist, perwerde, dibistan, civak, tib, matematîk, huner, wêne, katalogên şêwekarî, teknîk, felsefe, derûnî, erdnîgarî ûwd. yên li ser beşên xwe bispor nehatine meydanê, xwe bi karên pîşeyî kûr nekirine; weşanxaneyên kurdî di her beşan de pirtûkan diweşînin. Bi piranî helbest, çîrok tên weşandin. Pêşketin hene; roman, bîyografî, pirtûkên zanistî jî tên weşandin, lê ew bi piranî ne berhemên nû ne. Bi projeyên bernamekirî berhem nayên afirandin û weşandin, pirtûkên herî nû û nûjen yên cîhanê nayên wergerandin, piranî vegereke ber bi yên kevnare heye. Ev yek jî pêwîst e, divê ew jî bên wergerandin, an ji nû ve weşandin; lê di vî warî de weşanxaneyên pîşeyî û bisporî gerek in. Weşanxane dikarin hêdî hêdî bi projeyên piçûk be jî, dest bavêjin afirandinên nû; akademîsyen û nivîskarên kurd û nivîskarên zimanê kurdî wezîfedar bikin, projeyan, pêşbirkan pêşkêş bikin û ji nav serlêderan kesên maqul bineqînin û di gelek beşên cûda de berheman derxînin holê. Ji bo vê yekê derfetan peyda bikin, nivîskarên kurd, werger û akademîsyenên kurd fînanse bikin daku berhemên nûwaze derkevin meydanê. Hejmareke zêde rewşenbîr û nivîskarên kurd û zimanê kurdî, wergêr û akademîsyen peyda bûne, divê vala nemînin; êdî kurd hatine rewşeke wisa ku dikarin hin projeyên dûredirêj û berhemdar li ser bingeheke rêkûpêk jînbar bikin.

Em navên çend weşanxaneyên kurdî li jêrê rêz dikin, lê ev wek lîsteyeke netemam li ber çav bê girtin baş dibe, dibe ku hîn hinek hene me navên wan û berhemên wan bi dest nexistibin. Hin weşanxaneyên ku navên wan di lîsteyê de ne, êdî hew weşanê dikin lê dîsa, ji bo neyên jibîrkirin, hatine dest nîşan kirin. Weşanên e-pirtûk ne tê de ne. Li gor rêza alfabeyê hatine rêz kirin:

Apec, Aram, **Aras**(Başûr), Ava, **Avesta**, Bajar, **Belkî**, Berçem, **Berfîn**, Beybûn, **Bîrnebûn**, Çima, **Çîya**, Deng, **Dengê Komal**, Dengê Kurdistan, **Diljen**, Dilop, **Do**, Doz, **Evra**, Firat, **Han**, Havîbûn, **Hawar**, Hêlîn, **Hîvda**, Jîn, **Komal**, Komkar, **Kurdistan**, Laliş, **Lîs**, Med, **Melsa**, Mem, **Mezopotamya**, Mukrîyanî, **Nûdem**, Nûbihar, **Özge**, Pelda, **Pelê Sor**, Pencînar, **Perî**, Peyv, **Piya**, Rewşen, **Riya Azadî**, Roja Nû, **Ronahî**, Sara, **Serdem**, Sî/Mîr, **Spîrêz**, Tîrêj, **Vate**, Weşanên Enstîtûyên Kurdî (gelek in), **Weşanên Komela Jinan**, Weşanên Yekîtîya Nivîskarên Kurd (Duhok ûwd.), **Xanî&Bateyî**, Zend.

Jîyan bi kurdî xweş e!

Weşanên Sî
Weşanên Berfîn
Weşanên Doz
Weşanên Diljen
Weşanên Belkî
Weşanên Aras
Weşanên Rewşen
Weşanên Han
Weşanên Bajar
Weşanên Nûdem
Weşanên Do
Weşanên Apec

Naverok

ÇILE 2012

Di siyaseta kurdî de BDP
Vahap Coşkun ▶ R. 1

Ji şoreşê ber bi restorekirinê ve?
Hamit Bozarslan ▶ R. 1

Werdekên bêserî
Serge Halimi ▶ R. 2

JI ÇAPEMENÎYÊ ▶ R. 2

Dema ku euroyê kela canê redaksîyonên çapemenîyê radikir
Antoine Schwartz ▶ R. 5

Ji bo rizgarkirina pereyê yekbûyî xwe virde û wêde kirin
Bernard Cassen ▶ R. 6

Kunên reş ên mafên mirovî yên navneteweyî
Anne-Cécile Robert ▶ R. 7

Li Bakurê Îrlandayê şidet, xiyanet û sosyalîzm
Michel Savaric ▶ R. 7

Krîza sala 2008ê berîya çil salan dest pê kiribû
Wolfgang Streeck ▶ R. 8

Siyaseta rastgir a amerîkî çawa berê hêrsa gel guherand
Thomas Frank ▶ R. 10

Komarxwaz û demokrat li ser xwedîtîya 'country music' pev diçin
Sylvie Laurent ▶ R. 11

Li Kurdistanê ji bo artêşa tirk "rêya vekirî"
Michel Verrier ▶ R. 12

Oran, 5ê Tirmehê 1962
Pierre Daum û Aurel ▶ R. 14

Înternasyonala Sosyalîst an jî tu tişt nekirina li Amerîkaya Latîn
Maurice Lemoine ▶ R. 16

Fabrîkeya guftûgoyên gîştî
Pierre Bourdieu ▶ R. 18

Her du rûyên dewletê
Pierre Bourdieu ▶ R. 19

Kontrola "hûr û kûr" li ser Înternetê
Antoine Champagne ▶ R. 20

Gelo perwerde wê têrê bike?
John Marsh ▶ R. 21

Gelo eger Shakespeare ne Shakespeare bûya?
William Prendiville ▶ R. 22

ÇAND Û HUNER ▶ R. 23

Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê:
Postcode

Bajar:
City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)
Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB

www.lemondekurde.info